



K.T.

**ZANÎNGEHA MARDÎN ARTÛKLÛYÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

Teza Lîsansa Bilind

**CIHÊ KOVARA HAWARÊ
DI DÎROKA PERWERDEYA KURDÎ DA**

Murat Bedirhan SADAK

Şêwirmend

Prof. Dr. Tahirhan AYDIN

Mardîn- 2022

T.C.
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi

KÜRT EĞİTİM TARİHİNDE
HAWAR DERGİSİ’NİN YERİ

Murat Bedirhan SADAK

Tez Danışman
Prof. Dr. Tarhirhan AYDIN

Mardin- 2022

T.C.
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

TEZ ONAYI

Enstitümüz Kürt Dili ve Kültürü anabilim Dalı 19711008 numaralı Yüksek Lisans öğrencisi **Murat Bedirhan SADAK**’ın hazırladığı “**CIHÊ KOVARA HAWARÊ DI DÎROKA PERWERDEYA KURDÎ DA**” başlıklı YÜKSEK LİSANS teziyle ilgili TEZ SAVUNMA SINAVI, lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmenliği uyarınca 22/11/2022 Salı günü saat 10:30’da yapılmış, tezin onayına OY BİRLİĞİ/ÇOKLUĞUYLA karar verilmiştir.

Başkan.....

Prof. Dr. Hayrettin KIZIL

Üye.....

Prof. Dr. Tahirhan AYDIN(Danışman)

Üye.....

Doç. Dr. Ahmet KIRKAN

ONAY

Bu tezin kabulü, Enstitü yönetim kurulunun __/__/202_ tarih vesayılı kararıyla onaylanmıştır.

Ahmet KIRKAN
Enstitü Müdürü

ETİK BEYAN

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmada;

- Tez içindeki bütün bilgileri etik davranış ve akademik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tez çalışmasının hazırlık, bilgi, belge, veri toplama, analiz ve bilgilerin sunumu olmak üzere tüm aşamalarda bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun davrandığımı,
- Tez çalışmada kullanılan tüm eserlere eksiksiz atıf yaptığımı ve kullanılan tüm eserlere kaynaklar/kaynakçada yer verdiğimi,
- Tez çalışmasının özgün olduğunu,
- Tez çalışmasının Mardin Artuklu Üniversitesi tarafından kullanılan “bilimsel intihal tespit programı” ile tarandığını ve hiçbir şekilde “intihal içermediğini” beyan eder, aksinin ortaya çıkması durumunda her türlü yasal sonucukabullendiğimi bildiririm.

Murat Bedirhan SADAK

25/01/2023

KURTE

Teza Lisansa Bilind

Cihê Kovara Hawarê Di Dîroka Perwerdeya Kurdî da

Murat Bedirhan SADAK

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtûya Zimanên Zindî Li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

2022: 113 Rûpel

Perwerde, yek ji karîgerîyên herî giring ya civakê ye. Li gor çavkanîyên berdest perwerde, bi hebûna mirovatîyê ve her hebûye. Wisa têtê çaverê kirin jî ewê di dahatûyêdajî her hebe. Di serdama klasîkdapêdivîyên civakê û desthilatan perwerde beralî kirîye û li gorî van pêdivîyan çîna serdest(jorîn)hatîye perwerde kirin. Di serdema moderndaêdî ev şêwaza perwerdeya desthilatî û civakî bi qismekî kêmbê jî hatîye guhertin û li gor fikr û meraqên kesayetan perwerde hatîye kirin. Bêgûman perwerdeya kurdî jî di nava van pêvajoyên dîrokîraderbas bûye. Di serdema klasîk ya medreseyên kurdandaperwerde, li gor pêdivîyên desthilata mîrektîyan û bi endîşeya civaka dînî û hwd dihate dayîn. Lê belê bi dawîya sedsala 19anraêdî perwerdeya kurdî jî ji bo pêdivîyên kesayetî an jî pêdivîyên vê serdema modern hatîye dayîn. Di vê serdemêdarewşenbîrên kurdan jî wekî rewşenbîrên wan milletên din ketine nava liv û tevgerê ku civaka kurd li gor pêdivîyên serdemê bête perwerdekirin û bibe xwedî hişmendî. Herwisa ji bo xurtkirina hişmendîyê û hevgirtina yekîtîyê komele ava kirine, rojname û kovar derxistine. Di van rojname û kovarandadi çarçoveya perwerdeya civakîda xebatên zimên û hînkirina zimên hatine weşandin. Herwisa di van rojname û kovaranda berhemên klasîk yê ku di medresyên kurdandahatî afirandin bi civakê hatine danasîn, li ser dîroka kurdan ya serdemên berê û serdemên nêzîk nivîs hatine weşandin û gelek çîrokên edebî û folklorî hatine weşandin. Nemaze piştî Şerê Cîhanê yê 1em demaku dewletên nû yê netewî li ser axa kurdan ava bûn êdî ziman û çanda kurdî kete ber xetereya jinavbirina vandewletên desthilatdar. Celadet Alî Bedirxan û çend hevalên wî ev xetereya li ser ziman û çanda kurdî li ser xwe wekî berpirsariyê hîs kirine dest bi derxistina kovara Hawarê kirine. Bi pêşengîya Celadet Alî Bedirxan kovara Hawarê, ji xeynî sîyasetê dest avêtîye her curê mijara ku kurdîtî pêra'eleqedar e. Di Hawarê da digel gelek xebatên din, xebatên rasterast perwerdekirina zimanê kurdî jîhatine kirin û giringîyeke mezin bi van xebatan hatîye dayîn. Bi vî rengî di kovarêda wekî cara yekem alfabe ya latînî ji bo kurdî hatîye çîbicîkirin, bîngeha sîstematîzekirina rêzimana kurdî hatîye avêtin, çîrok û xebatên pedagojîk hatine weşandin. Bi vî awayî dikare bête gotin ku nivîskarên Hawarê wekî dîsîplîna dibistanekî, di warê perwerdeyêda bi awayeke pîralî û mifadar xebitîne.

Peyvên Sereke: Perwerde, Dîroka Perwerdeyê, Perwerdeya Kurdî, Hawar, Celadet Alî Bedirxan, Kovara Kurdî

ÖZET

Yüksek Lisans Tezi

Kürt Eğitim Tarihinde Hawar Dergisinin Yeri

Murat Bedirhan SADAK

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

2022: 113 sayfa

Eğitim, toplumun en önemli meşguliyetlerinden biridir. Eldeki kaynaklara göre, insanlık tarihi boyunca eğitim hep vardı. Öyle öngürülüyor ki gelecekte de hep var olacaktır. Klasik dönemde toplum ve iktidargerekliklerine göre eğitim şekillenip bu ihtiyaçlara göre eğitim veriliyordu. Modern çağda ise kısmen da olsa eğitimdeki bu durum değişiyor ve artık bireylerin zihinsel meraklarına göre eğitim verilmiştir. Kürt eğitimi deşüpheşiz bu tarihi süreçlerden geçmiştir. Klasik dönemde Kürt medreselerinde verilen eğitim mîrliklerin çıkarları veya toplumun dini endişelerine göre veriliyordu. Fakat 19. yy sonuna gelindiğinde bu klasik anlayış değişiyor ve artık eğitim kişisel veya çağın gerekliklerine göre verilmiştir. Bu dönemde Kürt entellektüelleri da diğer milletlerin aydınları gibi harekete geçmişler ve toplumunu biliçlendirip aydınlanma konusunda eğitmeye çalışmışlar. Aynı zamanda Kürt aydınları, toplumsal birlik ve bilinçlenme için dernekler kurmuşlar, gazete ve dergiler çıkarmışlar. Bu gazete ve dergiler da toplumsal eğitim çerçevesinde; kürtçenin öğretilmesine yönelik çalışmalar yapılmış. Aynı zamanda bu gazete ve dergilerde kürt medreselerinde verilmiş klasik eserler tanıtılmış, kürt tarihinin eski ve yakın çağlarına yönelik çalışmalar yayınlanmış, edebi ve folklorik hikayeler yayınlanmış. Özellikle 1. Dünya Savaşından sonra Kürtlerin topraklarında yeni ulusal devletler kurulmasıyla artık Kürt dili ve kültürü yok olma tehlikesiyle karşı karşıya kalmıştır. Celadet Ali Bedirhan ve birkaç arkadaşı Kürt dili ve kültürüne yönelik bu tehlikeyi kendi üzerlerinde bir sorumluluk olarak görmüşler ve buna direnme çabalarına girmişler. Bu amaçla Hawar dergisini çıkarmaya başlamışlar. Hawar dergisi, Celadet Ali Bedirhan önderliğinde siyasi konular hariç Kürtlükle alaklı her konuyla ilgileneceğini beyannamesinde belirtmiştir. Hawar dergisinde çok geniş konu yelpazesiyle beraber Kürt/Kürtçe eğitimine yönelik çalışmalara da ağırlık verilmiştir. Hawar’da buna yönelik ilk defa Kürtçe latin alfabesi uygulanmış, Kürtçe dilbilgisi sistematığı konusunda temeller atılmış, çocuk hikayeleri ve pedagojik çalışmalara yayınlanmış. Dergide yayınlanmış bu çalışmalardan da anlaşılıyor ki Hawar’ın yazarları, okul disiplinine benzer şekilde Kürtçe eğitime yönelik çok yönlü ve yararlı çalışmalara içerisinde olmuşlardır.

Anahtar Kalimeler: Eğitim, eğitim tarihi, Kürtçe eğitim, Hawar, Celadet Ali Bedirhan, Kürtçe Dergi.

ABSTRACT

Master's Thesis

The place of hawar magazine in the history of Kurdish education

Murat Bedirhan SADAK

Mardin Artuklu University

Institute of Living Languages in Turkey

Department of Kurdish Language and Culture

2022: 113 pages

Education is one of the most important occupations of society. According to available sources, education has always existed throughout human history. It is predicted that it will always exist in the future. In the classical period, education was shaped according to the needs of society and power and education was given according to these needs. In the modern age, this situation in education is changing, albeit partially, and education is given according to the intellectual curiosity of the individuals. Kurdish education has undoubtedly gone through these historical processes. In the classical period, the education given in Kurdish madrasas was given according to the interests of the Mirliks or the religious concerns of the society. However, by the end of the 19th century, this classical understanding changes and education is given according to the requirements of the individual or the age. In this period, Kurdish intellectuals, like the intellectuals of other nations, took action and tried to sharpen their society and educate them on enlightenment. At the same time, Kurdish intellectuals established associations for social unity and awareness, and published newspapers and magazines. These newspapers and magazines are also within the framework of social education; Studies have been carried out to teach Kurdish. At the same time, classical works given in Kurdish madrasas were introduced in these newspapers and magazines, studies on the old and recent ages of Kurdish history were published, and literary and folkloric stories were published. Especially after the First World War, with the establishment of new national states in the lands of the Kurds, the Kurdish language and culture are now in danger of extinction. Celadet Ali Bedirhan and a few of his friends saw this danger to the Kurdish language and culture as a responsibility on themselves and they tried to resist it. For this purpose, they started to publish the Hawar magazine. Hawar magazine stated in its declaration that under the leadership of Celadet Ali Bedirhan, it would deal with all issues related to Kurdishness, except political issues. In Hawar magazine, a wide range of topics and studies on Kurdish education were emphasized. For this purpose, the Kurdish Latin alphabet was applied for the first time in Hawar, the foundations of Kurdish grammar systematics were laid, and children's stories and pedagogical studies were published. It is understood from these studies published in the journal that Hawar's authors have been involved in versatile and beneficial studies on Kurdish education, similar to school discipline.

Key Words: Education, history of education, education in Kurdish, Hawar, Celadet Ali Bedirhan, Kurdish Magazine.

PÊŞGOTIN

Çaxê ku min li Antalyayê di fakulteya perwerdeyê da beşa mamostetîyê dixwend, di vê fakulteyê da roj bi roj me qada perwerdeyê nas dikir û em hînî hunera mamostetîyê dibûn. Bi vê naskirin û hînbûna min ya perwerdeyê ra xema min a perwerdekarîya kurdî jî zêde dibû. Ez difikirîm ka gelo çima tradîsyoneke perwerdeya kurdî tune ye yan jî rê û rêça vî karî çima nehatîye amadekirin. Piştî 1-2 salan dema min ziman û dîroka kurdan hinekî nas kir, ez li xwe mikur hatim ku ez di vê fikra xwe ya neyînî ya derheqê tradîsyona perwerdeya kurdî da xelet im. Ji ber ku tradîsyonek an jî rêçeke perwerdeya kurdî hebû, tenê xebera me jê tûne bû. Îcar ez gihame wê qenaetê ku divê em li ser mijarên kurdî pêşî berê xwe bidin xebatên berî xwe û wan lêbikolin ka gelo berî me çi hatîye kirin an jî rêçeke çawa hatîye vekirin. Bêguman, ev xebata me jî di derbarê xebat û hewldanên perwerdeya kurdî berî niha da ye. Ji qewla ku gotina pêşîyan jî dîyar dike “We rêya xwe li ku winda kir, vegezin destpêka wê rêyê”. Bi vê mebestê me jî berê xwe da destpêka perwerdeya kurdî û medreseyan kurdan yê di serdema mîrektîyan de. Bi vê mebestê, di nava çarçoveya dîyarkirî da em dê qada perwerdeya kurdî nas bikin û cihê kovara Hawarê di vê qadê da destnîşan bikin.

Di serî da min bi mamoste Kadri Yıldırım ra dest bi vê xebatê kir. Dema min ev mijara xwe ya xebatê ji wî ra eşkere kir kêfa wî gelek pê hatibû. Lewra ew jî di wê bawerîyê da bû ku ev mijareke giring e û divê bihata xebitandin. Lewma wî li ser vê xebatê her tim motîvasyona min xurt û qewîn dikir. Lê mixabin xebata min û ya mamoste Kadrî ya li ser vê mijarê nîvço ma û ew di 26 Adara 2021an da çû ser dîlovanîya xwe. Bi vê munasebetê ez li vir mamoste Kadri Yıldırım bibîrtînim û hêvîya min ji Yezdanê dîlovan cihê wî bihûşt be. Ked û xebatên wî yê di qada Kurdolojîyê da ji me ra bûne rêçeke giring. Ji ber van ked û xebatan em spasdarên mamoste Kadri Yıldırım in.

Piştî mamoste Kadri Yıldırım êdî mamoste Prof. Dr. Tahirhan Aydın destê vê xebata min girt. Ji bo ku ev derfet dayî min ez spasîyên xwe pêşkêşî mamoste Tahirhan AYDIN dikim. Di pêvajoya amadekirina vê xebatê de mamoste Tahirhan ji şewirmendekî zêdetir weke hevlekî her piştgirî dida min û motîvasyona mi ya

lêkolînê xurttir dikir. Di warê metodolojî û şêwrê de min hinekî bêhtir pêdivîys min bi bi mamoste Tahîrhan hebû. Lê dîsa jî ev xebat bi piştgirî û nêzîkedayîna wî ya qedirbilind giha encama xwe. Bi vê boneyê ez ji dil û cam spasîyên xwe pêşkêşî şêwirmendê xwe Prof. Dr. Tahirhan AYDIN dikim.

Di vê pêvajoya amadekirina tezê de em 3 xwendekar bi hev re di bin şêwirmendîya mamoste Tahirhan AYDIN de bi hevsengî dixebitîn. Bihev re me gelek serêşîyên vê prsesê çareser kirin. Ew her du hevalên din yê ku alîkarî û şêwra xwe teksîr nekirine brêz Behcet Toprak û brêz Abdurahman Dalar ez spasîya we dikim, hûn her hebin.

Herwisa ji bo xebata xwe min fikir û şêwira gelek heval û hogiran wergirt ku ewê li vir derfeta bilêvkirina navê hemûyan tune be. Ez spasîya wan hevalan hemûyan dikim ku min diderbarê xebata xwe demin digel fikr û nirxandinên erênî û têrmotive, fikrên neyînî jî ji wan guhdarî kirin. Ez nemaze spasîyên xwe pêşkêşî brêz Huseynê Mala Temoyî û brêz Mehmet Emin Cırık dikim ku wan gelek sererastkirin hêja pêkanî û bi fikrên xwe piştgirîya xwe teksîr nekirin. Mala wan ava be.

Murat Bedirhan SADAK

Mardin

2022

NAVEROK

KURTE	iv
ÖZET	v
ABSTRACT	vi
PÊŞGOTIN	viii
NAVEROK	ix
LÎSTEYA RESIMAN(WÊNEYAN)	xii
KURTEBÊJE	xiii
DESTPÊK	1
<i>Mijara Xebatê</i>	1
<i>Armancên Xebatê</i>	2
<i>Giringîya Xebatê</i>	2
<i>Sinor û Çarçoveya Xebatê</i>	3
<i>Rêbaza Xebatê</i>	4
1. PERWERDE	6
1.1. Bi Kurtî Perwerde û Danasîna Wê.....	6
1.1.1. Wateyên cûda yên perwerdeyê.....	6
1.2. Armanc û Erkên(fonksyonên) Perwerdeyê.....	8
1.3. Diderbareyê Dîroka Perwerdeyê da.....	9
1.3.1. Di heyama kevin da perwerde.....	10
1.3.2. Di heyama navîn da perwerde.....	13
1.3.3. Vejîna perwerdeya modern û geşedana wê.....	16

2. KURTEYEK JI DÎROKA PERWERDAYA KURDÎ	19
2.1. Serdama Klasîk Ango Serdama Medraseyên Kurdan.....	19
2.1.1. Di serdama mîraktîyan da perwerdaya kurdî.....	19
2.1.2. Piştî serdama mîraktîyan û heta dawîya salên dawî yên Dewleta Osmanî perwerdaya kurdî.....	22
2.2. Serdama Modern Ango Serdama Ronakbîrîyê.....	23
2.2.1. Di navbera salên 1897-1908an da perwerdaya bi kurdî.....	23
2.2.1.1. Darketina rojnameya Kurdistanê û rola wê ya perwerdayî.....	24
2.2.2. Di navbera salên 1908-1923an da perwerdaya bi kurdî.....	26
2.2.2.1. Avakirina Cemîyeta Kurd Teawin ve Teraqî (Cemîyeta Alîkarî û Bipêşketina Kurdan) û perwerdeya kurdî.....	27
2.2.2.1.2. Dibistana Kurd Meşrutiyet Mektebi (Kurd Nimûne Îbtidaîsi-Meşrutiyet) û perwerdeya kurdî.....	27
2.2.2.2. Avakirina Komeleya Xwendekarên Kurd Hêvî (Kurd Talebe Hêvî Cemiyeti) û rola wê ya perwerdeyî.....	28
2.2.2.2.1. Kovara Rojî Kurd û perwerdeya kurdî.....	29
2.2.2.2.2. Kovara Yekbûn û perwerdeya kurdî.....	31
2.2.3. Piştî şerê cîhanê yê yekem.....	32
2.2.3.1. Kovara Hetawî Kurd û perwerdeya kurdî.....	32
2.2.3.2. Hînger û perwerdeya kurdî.....	33
2.2.3.3. Elîfbaya Xelîl Xeyalî û perwerdeya kurdî.....	33
2.2.4. Di navbera salên 1923-1927an da perwerdaya bi kurdî.....	36
2.2.4.1. Avakirina Komara Tirkîyeyê û bandora wê li ser zimanê û perwerdeya kurdî.....	36
2.2.4.2. Bedûzzeman Seîd Nursî û perwerdeya kurdî.....	38
2.2.4.3. Avakirina Komeleya Xoybûnê û bandora wê li ser ziman û perwerdeya kurdî.....	40
2.2.5. Bandora weşan û xebatên çapemenîyê li ser geşedana ziman û perwerdeya kurdî.....	41
3. KOVARA HAWARÊ Û CIHÊ WÊ DI PERWERDEYA KURDÎ DA	43
3.1. Atmosfera Sîyasî û Civatî ya Wê Serdemê.....	43
3.2. Diderbareyê Kovara Hawarê da.....	42
3.2.1. Çend Sedemên Derketina Kovara Hawarê.....	43
3.2.2. Bi awayekî giştî Hawar û berpirsyarên wê.....	44
3.2.2.1. Celadet Alî Bedirxan (berpirsyarê Hawarê).....	44
3.2.2.2. Kamiran Alî Bedirxan.....	45
3.2.2.3. Hawar û destpêkirina wê.....	47

3.2.3. Armanç giringîya Hawarê.....	48
3.2.4. Weşangerî û nivîskarên Hawarê.....	49
3.2.5. Tradîsyona kovara Hawarê.....	51
3.3. Di Hawarê da nasnameya netewî.....	52
3.4. Di Hawarê da ziman û hînkirina zimên.....	53
3.4.1. Paşxaneya dîrokî: Danasîna pirtûkên hînkirina zimanê kurdî.....	54
3.4.2. Di Hawarê da teşwîqkirina hînbûna zimanê kurdî.....	61
3.4.3. Hawar û alfabeya kurdî.....	63
3.4.3.1. Paşxaneya dîrokî: Dîrokçeya sifabeyên kurdî.....	62
3.4.3.2. Hawar û alfabeya kurdî.....	64
3.4.4. Di Hawarê da rêzimana kurdî.....	66
3.4.5. Di Hawarê da standkirina zimanê kurdî.....	67
3.4.6. Di Hawarê da ferheng.....	668
3.5. Di Hawarê da perwerde û giringîpêdayîna perwerdeyê.....	68
3.5.1. Di Hawarê da teşwîqkirina xwendin û nivîsînê.....	68
3.5.2. Perwerdekirina zarokan.....	69
3.5.3. Perwerdekirina civakê bi giştî.....	71
3.6. Rola kovara Hawarê di perwerdeya kurdî de.....	72
ENCAM.....	76
ÇAVKANÎ.....	77
9	
PÊVEK.....	86
1. HINEK NIVÎSÊN PERWERDEYÎ DI KOVARA HAWARÊ DA.....	86
1.1. Elfabêya Kurdî.....	86
1.2. Dibistan.....	89
1.3. Şagirtên Sinifekê Wek Zaroyê Malakê ne.....	89
1.4. Dibistan.....	90
1.5. Bingehên Rêzimana Kurmancî.....	91
1.6. Dersxane.....	94
1.7. Şêr û Piling û Rovî.....	97

LÎSTEYA RESIMAN(WÊNEYAN)

- Resim 1.1: Berga *Serfa Kurmancî* ya bi Navê Tesrîfa Teremaxî.....60
- Resim 1.2: Rûpelên yekem yên destnivîsek *Nûbihara Biçûkan* li British Library, Or. 5932, folio 9 recto.....62
- Resim 1.3: Berga *Grammatica e Vocabolario Della Lingua Kurda*.....64
- Resim 1.4: Berga *Elîfbaya Kurdî* ya Xelîl Xeyalî (Çapa Weş. Hîvda).....65
- Resim 1.5: Berga Orjînal a *Hînkerê* (Çapa Bgst'yê).....67



KURTEBÊJE

- yd.** : Yên din
h.b. : Heman Berhem
r. : Rûpel
bnr. : Binêre
hwd : Herwekîdin
B.Z. : Berî Zayînê
P.Z. : Piştî Zayînê
hej. : Hejmar
wer. : Werger
Weş. : Weşanxane
KTTC : Kürt Teavvün ve Terakki Cemiyeti
DKM : Dibistana Kurd Meşrutîyetê
KTHC : Kurd Talebe Hevî Cemîyetî

DESTPÊK

Di vê beşê da em dê cih bidin *mijara xebatê, armancên xebatê, giringîya xebatê, sînor û çarçoveya xebatê yateorîk, rêbazaxebatê*. Herweha di vê beşê da hinek têgehên ji bo xebatê muhîmdê werin ravekirin.

Mijara Xebatê

Girêdayî rewşa kurdan a civakî û sîyasî, perwerdeya kurdî bi şewazên cûrbicûr hatîye bicihkirin û di gelek pêvajoyên cuda ra derbas bûye. Ji serdema mîrektîyên kurdan heta roja me, mirov dikare bibêje ku hinek demanhatîye hemandin û li gorî wê berhemên xwe yê giranbûha dane, hinek deman jî perwerdeya kurdî bêserûşûn maye û li ser navê perwerdeya kurdî tiştek berbiçav nehatîye kirin.

Di dawîya sedsala 19an bi avakirina çar dewletên netewî ên li ser axa kurdan avabûyîraêdî ziman û çanda kurdî; bi van ve girêdayî perwerdeya kurdî ketîye nava xetereyê. Bi vê atmosfera xetere ra êdî rewşenbîrên mîna birayên Bedîrxanîyan û gelek hevalên wan, xwestin şewazên tekoşîna xwe biguherînin û êdî dest bi karûbarên çapemenî û kovargerîyê bikin. Di van xebatên çapemenîyê yê mîna Kovara Hawarê, Ronahîyê û hwd. da li ser gelek hêmanên civakî û rojane sekinîne. Yek ji van hêmanên giring jî perwerde ye. Perwerdeya kurdî êdî di van kovar û rojnameyanda hem hatîye niqaşkirin hem jî bi endîşeya perwerdeyê xebat û nivîs hatine dayîn. Nemaze jî kovara Hawarê bûye qonexeke muhîm ji bo perwerdeya kurdî. Nivîskarên vê kovarê bi gelek awayên cûrbicûr perwerdeya kurdî girtine dest û vekolandine. Bi vî awayî di kovarê da xebatên alfabeyê, xebatên rêzimanê û gelek xebatên perwerdeya civaka giştî cih girtine.

Îcar bi vê lêkolîna xwe, em dê piştî tasfwîreke dîrokçeya perwerdeya kurdî, li ser perwerde û perwerdekarîya kovara Hawarê bisekinin.

Armancên Xebatê

Armanca vê xebatê ya sereke vekolîn û venêrîkirina hewldanên perwerdeyî yê di kovara Hawarê da ne. Ji bilî vê armanca sereke, armanc û lêgerînên din ên vê xebatê ev in:

- 1- Tecrûbeyên kurdan yênerwerdeyê çi ne?
- 2- Ji serdema mîrektîyan û heta dawîlêhatina kovara Hawarê, merheleyên sereke yênerwerdeya kurdî kîjan in?
- 3- Di van merheleyên sereke da kîjan xebat û hewldanên perwerdeyî hatine kirin?
- 4- Armancên Hawarê yênerwerdeya kurdî da çi ne?
- 5- Ji hêla naveroka xwe ve Hawarê cih daye kîjan xebatên perwerdeyî?
- 6- Ji alîyê çapxaneyê hawarê ve kîjan xebatên perwerdeyî hatine weşandin?
- 7- Rola alfabeya Celadet Alî Bedîrxan di pêşketina ziman û edebîyata kurdî da çi ye?

Giringîya Xebatê

Ji serdemên berê heta niha zimanê kurdî nebûye xwedî statûyeke bihêz. Girêdayî nebûna statûya zimên, perwerdeya bi kurdî jî derfeta pergaleke biberdewamî bi dest nexistîye. Digel van hêmanên neyînî dîsa jî em dibînin ku perwerdeya kurdî, li gorî derfetên qels bi awayekî xwe gihandîye roja me.

Perwerdeya kurdî ji lêkolîneke berfireh jî bêpar maye ku heta niha jî lêkolîneke bihûrgulî ser vê qadê nehatîye kirin. Loma jî baş naye zanîn ka gelo dîroka perwerdeya kurdî di kîjan pêvajoyan ra derbas bûye û di çi astê da ye. Îcar bi vê xebatê em dê li gorî çavkanîyên berdest, di nava çarçoveya tarîxî ya dîyarkirî da hewla zelalkirin û danasîna xebatên perwerdeya kurdî bidin. Di vê derbarê da mijara bingehîn ya ku li ser bête sekinîn kovara Hawarê ye. Di çarçoveya dîroka perwerdeya kurdî dahemû hêman û materyalên perwerdehî ên di Hawarê da dê bên destnîşan kirin û analîz kirin. Em di wê bawerîyê da ne ku zelalkirina van agahîyên dîrokî, dê bi her awayî bandoreke erênî li perwerdeya kurdî ya roja me û ya dahatûyê bike. Bi vî awayî xebata me ji bo dîroka perwerdeya kurdî û perwerdekarîyê xwedî cihekî giring e.

Motîvasyona me ya li ser vê mijarê jî ew e ku em dibînin pêdivîya perwerdeya kurdî bi analîza materyalên perwerdehî û bi plansazîyeke bingehîn heye. Plansazîya bingehîn û sêwirandina materyalan jî encax dikare bi alîkarîya tecrîbeyên dîrokî bête amadekirin. Loma divê xebat û materyalên kurdî yênerwerdeyê da hebûn bi

awayekî bihurgulî werin zanîn. Loma me xwest em li ser vê mijarê bixebitin û di çarçoveya çavkanîyên berdest da balê bikişînin ser van pêzanînen perwerdeya kurdîya kurmancî.

Sinor û Çarçoveya Xebatê

Girêdayî rewşa sosyo-polîtîk û şert û mercên dîrokî, perwerdeya kurdî ne di nav sînorekî dîyarkirî de; di nav sînoren dewlet û herêmên cîyawaz da tête kirin. An jî li gor şert û mercên lawaz hewl tê dayîn ku perwerdeya bi kurdî bête kirin. Herwisa zimanê kurdî jî xwedî gelek zarave û devokên cihêreng e. Girêdayî van zaravayan civaka kurd, di nava xwe da bûye xwedî hinek sînoren razber. Ji serdemên berê û heta niha civata her zaravayekî kurdî jiber şert û mercên sîyasî dinava derfetên lawaz da xebatên perwerde, ziman û edebîyatê kirine. Ji ber van hemû sedeman, perwerdeyê kurdî ya hevgirtî çênebûye. Herwisa baş ne zelale ku perwerdeya kurdî bi awayekî birêkûpêk di kîjan demê da destpêkirîye jî hebûye. Ji aliyê zaraveyî ve bi kurmancî re, ji aliyê demê ve jî ji bi serdema derketina kovara Hawarê (1932-1946) ra sînordar kirîye. Di vê çarçoveyê da dê teswîreke perwerdeya cîhanî bête kirin. Piştî jî em dê behsa dîroka perwerdeya kurdî ya di serdema mîrektîyan da dest pê kirî bikin. Digel van agahîyên dîrokî dê perwerdekarîya kovara Hawarê ji xebata merabibe bingeh.

Di nava çarçoveya xwe dîyarkirî da xebata me ji xeynî beşên kurte, destpêk û encamê dê ji sê beşan sereke pêk bê. Di beşa yekem da em dê bigiştî li ser perwerdeyê û dîroka perwerdeya cîhanî bisekinin. Di beşa duyem da jî em dê li ser perwerdeya kurdî ya di sedsala 17em da li medreseyên mîrektîyan da hatibû dayîn, bisekinin. Herweha ew materyalên (pirtûkên) perwerdeyî yê wê serdema mîrektîyan em dê analîz bikin û derbarê wan da agahî giştî destnîşan bikin. Em dê behsa çendek hewlên mektebên modern yê weke Kurd Meşrûtiyet Mektebî, Xebatan û Hewlên Xelîl Xeyalî yê Perwerdeyî û Projeya Seîdê Kurdî Medrestuzehrayê bikin. Di beşa sêyem da jî em di çarçoveya perwerdeyê da li ser kovara Hawarê hûr bibin. Hewl û armancên wê yê perwerdekirina zimanê kurdî destnîşan bikin. Herweha em dê ji naveroka Hawarê mînakên xebatên perwerdehîyê tespît bikin û binirxînin.

Rêbaza Xebatê

Xebata me li ser mijara dîyardeyên civakî ye, bi giştî jî xebat di derbarê ronîkirin û berhevkirina agahîyên dîrokî da ye. Berhevkirin û ronîkirina van daneyên herî baş û bi ewle ji hêla ‘*Rêbaza Çawanîyê*’ ve dikare bête kirin. Lewma em dê di vê xebatê da li ser bingehên ‘*Rêbaza Çawanîyê*’ vekolînê bikin. Derbarê vê rêbazê da pênaseyêke hevgirtî tune. Lewra ev rêbaz bi gelek ew rêbaz bi gelek dîsîplînên cuda ve di nava hevsengîyê da ye. Rêbaza çawanîyê xwe dispêre nêzîkedayîna şîrovevî. Li gorî vê rêbazê bûyer di cihên wan yên xwezayî da tene şîrove kirin û nirxandin. Bi vê rêbazê daneyên tene berhevkirin ne bi hejmarî, bi rewşî an jî çawanîyî ne. Di rêbaza çawanîyê da digel encaman, pêvajoya lekolînê jî giringî pê tete dayîn. Lekolînên rêbaza çawanîyê bi giştî hewla tégihîştina û hilberîna cîhana civakî ye. di vê rêbazê da ya herî girîng bûyer û dîyardeyê civakî di nava rewş û qada wan a resen da tene nirxandin û fehmkirin. *Rêbaza Çawanîyê* bi gelek binbeşên xwe daneyên lêkolînî ji alîyê çawanîyê ve bi awayekî ewle dîyar dîke.

Ji binbeşên *Rêbaza Çawanîyê*, ji bo xebata me ya herî karîger teknîka *Sehîkirina Dokumanan* e. Hemû agahîyên dîroka perwerdeyê di pirtûk belgeyên berê da anj jî pirtûk dîrokê yên berdest da cih digrin. Di vê teknîka *Sehîkirina Dokumanan* jîli gorî rê û rêbazên çawanîyê, dokûman an jî arşîvên nivîskî tene sehîkirin. Bi awayê sehîkirina arşîvan danayên ku tene xwestin tene berhevkirin û ji bo armanca lekolînê tene bikaranîn. Ev teknîk ji ber nebûna derfetê çavderî û hevdîtîne, dahurandina dokumanên heyî ye. Teknîka *Sehîkirina Dokumanan* dema ku bi teknîkên dinra hate bikaranîn hingê rastî û derbasdarîya lêkolînê zêdetir dibe (Yıldırım ve Şimşek, 2005, 188-189). Di vê teknîkê da dahurandinên herî zêde tene bikaranîn; dahurandina naverokî û dahurandina rexneyî ne. Di lekolînê da berhevkirina daneyan bi rêya vê teknîka *Sehîkirina Dokumanan*, em dê xwebigihînin encam û nirxandinên derbasdar.

Ji alîyê planî ve jî xebata me ji sê beşên sereke pêk tê. Di beşa yekem da em dê bi giştî li ser perwerdeyê bisekinin û bi berfirehî nasandina perwerdeyê û dîroka perewedeyê digel dabeşkirina serdaman, rave bikin. Di beşa duyem da em dê dîrokçeyê perwerdeya kurdî taswîr bikin. Ev dîrokçe dê ji serdema mîrektîyên kurdan ya sedsala 17an û heta serdema kovara Hawarê (1932-1943) di nava xwe da

bihewîne. Di beşa sêyem da jî em dê bi giştî li ser kovara Hawarê bisekinin û taybetmendiyên wê yên sereke bidin nasandin. Herwisa di vê beşê da em dê li ser perwerdekarîya Hawarê hûr bibin ka gelo heta çi astê giringî bi perwerdeya kurdî hatîye dayîn û xebat û hewldanên bi mebesta perwerdeya kurdî hatine kirin kîjan in? Em dê wan tespît bikin û kurte dahûrandineke wan bikin.



1. PERWERDE

1.1. Bi Kurtî Perwerde û Danasîna Wê

Perwerde, yek ji fe'elîyetên kevintirîn ya mirovahîyê ye. Ev fe'liyet bi hebûna mirovahîyê ve hebûye û di dahatûyê da jî dê her hebe. Loma em dikarin bibêjin perwerde ji bo kesayeta mirovan û hebûna civatê hêmaneke giring e. Lê belê lihevhatinek û çarçoveyeke dîyar di derbarê tarîfkirina perwerdeyê da çênebûye. Lewra perwerde, konteksteke hîndekirinê û xwendekarîyê ye. Li ser vê kontekstê jî çarçoveyeke dîyar an jî tarîfkirina zelal nikare bête kirin. Her rewşenbîrek an jî perwerdekarekî li gorî xwe tarîfa perwerdeyê kirîye. Bi kurtî tarîfên hinek ji van perwerdenasan wiha ne; Platon gotîye perwerde, radestkirina gihastîneke baş ya mirovan e (Kılıç, 2019:68). I. Kant gotîye perwerde, derxistina hemû kêrhatinên veşartî yên di xwezaya mirovan da ne (Çilingir, 2004:82). J. J. Rousseau jî gotîye perwerde, gihastîna zarokan û hûnera çêkirina mirovan e (Alkayış, 2021:62). Wekî jî tarîfên van kesayetan jî dîyar dibe lihevhatîneke hevpar li ser perwerdeyê çênebûye. Yek ji sedemên nebûna vê hevparbûnê jî ewe ku her kesayetek an jî perwerdenas li gorî perspektîfa li perwerdeyê meyze dike û bi wî awayî perwerdeyê pênase dike (Arslan, 2009: 11).

1.1.1. Wateyên cuda yên perwerdeyê

Bi awayekî giştî em dikarin bibêjin ku perwerde, wergirtina her cure agahîyên derbarê xwe, derdora xwe û hemû hebûna cîhanî da ye. Her wisa ev agahî tene veguhestin ji bo nivşên nû. An jî yek pênaseyeke din ya perwerdeyê heye ku dibêje perwerde;bi rêya ber bi alîyê tete xwestin ve veguhestina hemû tevger û reftaran e(Ertürk, 1975: 12). Digel van pênaseyên berfireh yê perwerdeyê gelek caran em şahîd dibin ku perwerde bi hinek wateyên taybet jî tete bikaranîn.

Di derbarê wate û bikaranînên cuda yên perwerdeyê da Nurettin Beltetekîn jî tespîtên wiha dike: “Tenê cureyekî perwerdeyê tune ye, gelek perwerde hene. Yanî perwerde xwedîyê wateya pirhejmar e. Li vê derê ya perwerdeyê zêde dike çi ye? Yek, însan perwerdeyê zêde dike. Çunkî însan cuda cuda ne, îhtîyacên her însanî cuda ne, kulturên wan cuda ne. Ew jî faalîyetên perwerdeyê cuda dikin. Mînak,

xwarin îhtîyaca hemû însanan e. Lê mitbaxa însanan cuda cuda ye. Xwarinên wan cuda cuda ne. Hinek millet hene xwarinên wan tûj in, li nav xwarinên hinekan tûjî tune ye. Hinek millet hene di mitbaxê wan da goşt tune, yan jî pir kê m e, goştê masîyan heye, goştê mirişkan heye. Îhtîyaç yek e, lê ew tedarîk û şiklê dîtina îhtîyacan cuda cuda ne” (Beltekîn, 2020: 18-19). Herwisa sazî û têgigiştina li gorî serdeman jî bandorê li watê û bikaranîna perwerdeyê dike. “Sazgehên perwerdeyê jî perwerdeyê zede dikin. Mînak medreseyên kurdan tecrubeyeke taybet e. Di nav milletên din da bi vî şiklî tune ye. Hûcre, berê di gelek gundan da hucre hebûn û di van hucreyan da ders dihatin dîtîn. Dîsa di camîyan da ders tîn dîtîn. Hemû tecrûbeyên cuda ne. Ev tercûbe li her cihî nayên dîtîn. Dîsa navê perwerdeyê cuda ye. Nav, di prosesa geşedanan civakê da diguherîn. Mînak, di kurdîya îro da perwerde tî gotin, di kurdîya berê da xwendin (Issi, 2011) dihat gotin. Xwendin û perwerde yek tişt nîne. Tirkan berê digotin maarif, niha dibêjin egitim. Bi xwe egitim, kesekî ku tirkî zimanê dayika wî ye, esla egitim jî bo însanan naşuxilîne, çunkî heywan egitim dibin. Di tirkîya berê da însan egitim nabin, heywan egitim dibin, yanî egitim didin heywanan” (Beltekin, 2020: 19).

Herweha li gorî senifandinê jî hinek wateyê perwerdeyê yên rûniştî wiha ne;

a) Terbîye: Ev peyveke erebîye ku bi wateya kamilbûna kesayetî tîte bikaranîn (Ayhan, 1986: 15). Di medreseyên destpêkê yên serdema dewletên îslamî avabûyî da perwerde piranî bi vî wateya terbîyeyê dihate dayîn. Piştî van medreseyên destpêkê medreseyên kurdan jî li gorî van medreseyên îslamî ava bûn. Bi vî awayî di medreseyên kurdan de jî da perwerdeya bi wateya terbîyekirina kesan dihate dayîn.

b) Beralîkirin: Di vî wateya perwerdeyê de, armanc û bernemayeke jî berê da hatî amadekirin heye û hemû endamê perwerdeyê jî ber bi vî armanca dîyarkirî ve tîne arastekirin. Ev armanc carinan dikare dînî be carinan dikare civakî be carinan jî dikare zanistî be.

c) Gihaştin: Di vî wateya perwerdeyê da jî gihaştin û pêşketin heye. hînkirina sin’et an jî hûnerekî heye. Di vî wateyê da her endamê perwerdeyê dibe pisporê qadekî û di wê qadê da pêşdikevin.

d) Pedagojî: Pedagojî peyveke latînî ye ku tî wateya “zanista perwerdekirina zarokan”. Ev wateya perwerdeyê di nava perwerdeya giştî da bi

taybetî bi zarokan ve eleqedar dibe (Leif-Rustin, 1974: 2). Di serdema modern da ev wate gelek caran jiboperwerdeyî bi xwe jî têtê bikaranîn. Herwisa pisporên di qada perwerdeyê da xwe pêşdixin ji wan ra pedagog têtê gotin.

1.2. Armanc û Erkên (Fonksyonên) Perwerdeyê

Digel gelek armancên perwerdeyê yên heyî, armancên perwerdeyê yên sereke û berçav wiha ne; hînbûna şîyanwerîyên bingehîn, xwegihaştina agahîyan, fikirîna pîralî û hwd.

Perwerde di bingeha xwe da pêvajoyeke dualî ya di navbera xwendekar û perwerdekar da ye. Perwerdekar, divê her tim ji xwendekaran ra model be û rênas be. Herwisa divê armanceke perwerdeyê ya dîyarkirî hebe, da ku perwerdekar beralîkirina vê armancê da ji xwendekaran ra bibe rênas. Ev armanca dîyarkirî li gorî her civatê diguhere. Hinek dewlet li gorî fikra xwe ya netewî vê armancê dirûst dikan, hinek dewletên din li gorî nirxên xwe yên çandî vê armancê çêdikan, hinekên din jî li gorî pêdivîyên serdemê li gorî zanîn û zanistê vê armancê dirûst dikan. Digel van armancên perwerdeyê yên civatî, armancên perwerdeyê yên kesayetî jî hene ku Pedagog Hooker dibêje armanca perwerdeyê, di hemû jîyanê da hînbûna xweperwerdekirinê ye.

Perwerde proseseke civakî ye. Di nava vê prosesa civaki da pêşketina kêrhatinên kesayetî yek ji erkên bingehîn e (Sağ, 2003). Lewra perwerde xwedî bandor e, hem li ser kesayetana hem li ser civak hem jî li ser dewlet û rêvebirîyan. Bi vî awayî perwerde bi pêkhatên din yên civakê ra di nava têkilîyê da ye. Bi vê têkilîyê ve perwerde veguheztina çandê pêk tîne. Hevgirtin û hevtêgihîştina nivşan mayînde dike.

Di derbarê perwerdeyê da hemû endamê civatê xwedî fikr in. Ji ber ku her kes kêr zêde be jî bi perwerdeyê ra rûbirû maye an jî di nava pêvajoya perwerdeyê da cih girtîye. Van encaman jî, rê li ber hizrîna li ser perwerdeyê vekirîye. Bi vî awayî her kes li pey perwerdeyê baş gerîyaye. Di vê derbarê da wisa têtê qebûlîkirin ku li gorî pêdivîyên serdemê di çarçoveya çanda civakê da heke feydeyek çêkiribe ewwekî perwerdeyek baş têtê qebûlîkirin. Digel vê qebûlê jî; kesayet her çiqas baş werin perwerdekirin, başî û silametîya civakê ewqas saxlem dibe. Loma perwerdeya

kesayetan bi awayekî din tê wateya perwerdeya civaka giştî jî. Bi vî awayî perwerdeya kesayetî jî dikare wekî perwerdeyekê baş bê destnîşan kirin.

Di vê serdema teknolojîyê û globalîzasyonê da erkên perwerdeyê yên sereke ew e ku xwendekar hem ji bo pola jorîn hem jî ji jîyanê bête amadekirin. Lewra êdî divê kesayet xwedî taybetmedîyên piralî be û bikaribe bi awayekî sîstematîk û analîtîk bifikire. Ev kêrhatin û şîyanwerîyên kesayetî encax bi saya perwerdeyê dikarin bîn amadekirin an jî pêşxistin. Kesayetên xwedî van şîyanwerîyandikare bi awayekî aktîf di çareserkirina pirsgirêkên civatî û cîhanî da bi awayekî aktîf rola xwe bilîzin.

1.3. Diderbareyê Dîroka Perwerdeyê da

Perwerde, bi beramberê dîroka mirovahîyê xwedî rabirdûyê ye. Mirov di xwezaya xwe da bikomî dijîn. Di nava endamên van komê mirovan da hertim wergirtin û danûstandina agahîyan çêbûye. Ev danûstandin jî piranî bi saya perwerdeyê pêk hatîye. Îcar sazîyên ku danûstandina van agahîyan birêkûpêk dikin an jî mayînde dikin, sazîyên perwerdeyê ne (Arslan, 2009: 28). Ev sazîyên perwerdeyê jî li gorî pêdivîyên serdemê an jî li gorî nêrît û binyada civakê hatine veguhestin. Bi vî awayî her serdemek an jî civatek bûye xwedî dîrokeke perwerdeyê. Îcar dîroka perwerdeyê jî bi giştî li ser vê dîrokê disekine û dixwaze vê dîroka perwerdeyê rave bike. Herwisa dîroka perwerdeyê jî hemû tecrûbe û pêzanînên rabirdûyê vedikole û ji bo dahatûyê hişmendîyekê ava dike. Li gorî perwerdenasê tirk Yahya Akyüz dîroka perwerdeyê, hevparîya dîrokê û zanista perwerdeyê ye (Akyüz, 2015: 15).

Herçiqas perwerde bi hebûna mirovahîyê ya destpêkê ve hebe jî; perwerdeya xwedî pergal û birêkûpêk bi dahênana nivîsê ve destpêkirîye. Wekî têtê zanîn di dîrokê da cara yekem nivîs ji aliyê Sumerîya ve hatîye dahênan û bikaranîn. Bikaranîna nivîsê jî rasteraste hebûna perwerdeyê û sazîyên perwerdeyê nîşanî me dide. Bi vî awayî em dikarin bibêjin ku perwerdeya xwedî pergal û birêkûpêk di serdema Sumerîyan da destpêkirîye.

1.3.1. Di heyama kevin da perwerde

Di sedsala 19em da Pêşketin û geşedana mirovahîyê, ji alîyê dîrokas û civaknasên Ewropî ve hatîye pênasekirin û dabeş kirin. Li gorî vê dabeşkirinê; ji destpêka bikaranîna nivîsê û heta perçekirina Împaratorîya Romayê (PZ. 395) wekî *Heyama Kevin* (*heyama yekem*) hatîye pênasekirin. Di vê serdema Kevin da di nava tevahî şaristanîyan da perwerde ne ji bo hemû civatê bû, tenê ji bo qismek civat bû ku ew ji çîna jorîn (serdest) bû (Şişman, 2011: 4).

Li gorî zanyarîyên arkeolojîyê dîroka mirovahîyê ya nivîskî heta B.Z.8000an diçe. Lê belê derbarê mirovahîyê da zanyarîyên teqez ji dahênan nivîsê dest pê dîke (Kramer, 1998;17). Dahênana nivîsê B.Z. di salên 3000-3500an da ji alîyê Sumerîyan ve hatîye kirin. Bi vê hêmana dahênan nivîsê ve girêdayî, ji alîyê zanyaranve tê qebûlkirin ku yekem rêxistinên mîna dibistanan ji alîyê Sumerîyan ve hatine avakirin. Di tabletên aîdê vê şaristanîya Sumerîyan da agahîyên derbarê bizavên dibistanan da tînin ku ev agahî hebûna dibistana piştrast dikin. Di şaristanîya Sumerîyan da dibistan bi mebesta sin'etkarî û dînî hatine avakirin. Her wisa ev dibistan ji bo çîna jorîn(serdest) bûn ku mafê hemû civatê tune bû ku li van dibistanan perwerde bibin. Di van dibistanên Sumerîyan da bi navê “Ûmîa” rêvebir hebû. Ji xwendekarên van dibistan ra jî “lawê dibistanê” dihate gotin. Li van dibistanan dersên wekî dîrok, astronomî, geometrî, dînî û hekîmîyê dihatin dayîn. Ev pircûreyîya dersan piştrast dîke ku ev dibistan pîralî bûn û xwedî gelek celebên fonksîyonan bûn. Perwerdeya Sumerîyan ji alîyê pergala, rêbaz, mekan û reftarê ve pêşnûmeya perwerdeya îroyîn (modern) çêkikirîye (Atuf, 1929;40).

Di *Heyama Kevin* da gelek şaristanîyên din jî mîna Sumerîyan, xwedî perwerde û sazîyên perwerdeyê bûn. Hinek ji van şaristanîyan jî Asûrî û Akadî bûn. Asûrî û Akadî jî du şaristanîyên giring yê Mezopotamyayê ne. Ev şaristanî jî xwedî perwerde û bizavên perwerdeyê bûn. Nexasim jî di nava şaristanîya Akadîyan da jin xwedî cihekî giring bû û jin di hemû astên jîyanê da xwedî rol bûn.

Yek ji şaristanîyeke din ya Heyama Kevin, Misra Kevin e. Misra Kevin jî di warê zanîn û perwerdeyê da xwedî cihekî giring e. Vê şaristanîyê nivîseke binavê Hîyeroglîf dahênane ku ev nivîseke wêneyî ye. Herweha vê şaristanîyê bi saya çemê

Nîlê reftarê rojê hesap kirine û di warê astronomîyê da gelekî pêş ketine. Şaristanîya Misra Kevin li gor van agahîyên astronomîyê teqwîm dahênane. Perwerdeya vê şaristanîyê jî wekî wan şaristanîyên din tenê ji bo zarokên çîna serdest e. Herweha digel dibistanên seretayî, dibistanê perwerdeya navîn û yên perwerdeya bilind jî vê şaristanîyê da hene. Perwerdeya Misrê ji gelek alîyan ve pêşketîye û vê perwerdeyê giringî daye perwerdeya dê û bavan jî (Şişman, 2011;25).

Şaristanîyeke din ya Heyama Kevin, Îrana Kevin e. Di nava perwerdeya vê şaristanîyê da ziman û edebîyat xwedî cihekî giring e. Di qesrên şahê îranê da herkes xwendin û nivîsê hîn dibû. Her weha di nava perwerdeya Îrana Kevin da perwerdeya hiqûq û dîrokê jî xwedî cihekî giring e.

Yek ji şaristanîya din ya Heyama Kevin jî Şaristanîya Fenîkeyîya ye. Fenîkeyî, li peravê Deryaya Spî niştecih bûn. Ji ber vê hêmana wan ya deryayê, nexasim di warê deryavanîyê da gelek pêşketine. Fenîkeyîyan alfabeyeke aîdê xwe jî dahênane. Ev alfabeya wan bingeha alfabeya îroyîn ya latini ye (Şişman, 2011;8). Şaristanîya Fenîkeyîyan, ji Misrîyan nivîsa hîyeroglîfê hîn bûne. Herwisa Ev nivîs di nava gelek şaristanîyên din da jî belav kirine.

Şaristanîyeke din ya heyama kevin li herêma Anatolyayê, şaristanîya Hîtîtî ye. Ev şaristanî li herêma Anatolyayê xwedî cihekî giring e. Di qada zanîn û zanistê da gelek dahênanên aîdê vê şaristanîyê hebin jî, nexasim di qada perwerde û nivîsê da di bin bandora Sumerî û Misrîyan da mane. Herwisa Hîtîtî di qada rêvebirîya dewletê da jî di bin bandora Sumerî û Misrîyan da mane. Hîtîtîyan şewazeke aîdê xwe, nivîsa mîxî dahênane. Lê belê li ser vê nivîsê bandora Sumerîyan berbiçav e. Cureyeke nivîsa Hîtîtîyan ya bi navê hîyeroglîf jî heye ku li ser vê nivîsê jî bandora misrîyan heye. Sazîyên Hîtîtîyan yên mîna dibistanan hebûn, ev sazî jî ji bo zarokên çîna serdest bûn.

Yek ji şaristanîya din a Heyama Kevin Urartû ye. Urartû li herêma rojhilata Anatolyayê niştecih in. Urartû di gelek bizavên xwe yê nivîsî û çandî da di bin bandora şaristanîyên Mezopotamyayê da mane. Li gorî daneyên di derbarê vê şaristanîyê da nîşanî me dide ku ev di nava vê şaristanîyê da ji bo çîna serdest perwerde xwedî cihekî giring e.

Yek ji şaristanîya din ya bakurê rojhilatê Mezopotamyayê Frîgî ne. Şaristanîya Frîgîyan bi bandora şaristanîyên Mezopotamyayê alfabeya aîdê xwe dahênaye. Frîgî di çarçoveya dîroka perwerdeyê da xwedî taybetmendîyên giring in. Yek ji van taybetmendîyan jî ewe ku xwedî çandeke pêşketî ya pêlîstokên zarokan e (Mutluay, 2004;46). Li gorî daneyên derbarê vê şaristanîyê da ev pêlîstok di warê perwerdeye zarokan da hatine bikaranîn.

Di nava şaristanîyên cîhanê da yek ji şaristanîya herî kevin û pêşketî jî şaristanîya Çînî ye. Şaristanîya çînî ji heyamên kevin ve xwedî pêşketinên xwecihî û taybet e. Ev şaristanî di warê perwerdeyê da jî xwedî cihekî giring e. Di nava vê şaristanîyê da sazîyên perwerdeyê pir in. Di van sazîyan da hem çîna serdest hem jî di nava civatê da çînen din jî perwerde dîtine (Qijia, 2009;62). Ev sazî bi navê dibistanên cema'atan, dibistanên kantonan, dibistanên herêmî û dibistanê bajaran bûn.

Şaristanîyeke din ya heyama Kevin Hînd e. Di nava vê şaristanîyê da bingeha perwerdeyê di nava malbatê da tê avêtin. Şahê hîndî yê navdar Rama di derbarê perwerdeya zarokan da pirtûkek nivîsîye. Ev pirtûk li ser astên cuda yê derûnîya zarokan disekine. Bi vî awayî ev pirtûk wekî yekem pirtûka derûnîyê tête qebûlkin (Bayur, 1947: 30).

Di heyama kevin ya yewnanî da jî perwerde di asteke berz û bilinde bû. Girêdayê vê perwerdeya pêşketî jenerasyoneke xurt ya çandî jî mewcûd bû. B.Z. 1000 pêve perwerdeya zanistên mîna felsefe, hûner, astronomî û mîtolojîyê pêşketîye. Bi vê pêşketinê ve yewnanîyan bandoreke erênî ya berbiçav li şaristanîyên cîhanî kirine (Davitson, 2008;19). Lewra di nava vê şaristanîya yewnanî da gelek feylezof, hunermend û rewşenbîr gihîştine.. Armanca sereke ya perwerdeya vê şaristanîye sazkarî (saxlemî)ya ruhî û laşî ye. Li gorî vê hişmendîyê van rewşenbîr û feylezofên yewnanî perwerde dane û berhemên nû afirandine.

Piştî lawazbûna şaristanîya Yewnanî, êdî şaristanîya Helenîstîk destpê kirîye. Vê şaristanîya Helenîstîk, navendên giring yê zanistê avakirine. Hinek ji van navendên sereke Atîna, Îskenderîye, Roma, Bergama, Rodos û hwd in. Di vê serdemê da du şaxê felsefî yê bingehîn avabûne. Ev şax Stoayî û Epîkûrî ne.

Di dawîya Heyama Kevin da êdî dînê xirîstyanîyê wekî dînê fermî hatîye pejirandin. Bi vê pejirandina dînê xirîstyanîyê ve perwerde jî bûye xwedî binyadeke dînî. Armanca sereke ya vê perwerdeyî gîhandina hemwelatîyên kamil ên Romayê ye (Aytaç, 2009:71). Rewşenbîrên navdar Çîçero û Seneca di vê serdemê da gihastine û bandoreke berbiçav li zanist û şaristanîya cîhanî kirine.

Di Heyama Kevin da derbarê perwerdeya bi kurdî da heta niha agahîyeke berdest tune ye. Bi vî rengî gumanku di vê derbarê da hîn dane nehatine bidestxistin. Lewra wekî gelek qad û zanistên din(dîrok, ziman, edebîyat) derbarê perwerdeya kurdi da jî hîn xebatên kur û berfireh nehatine kirin. Ji tunebûna van xebatan guman ewe ku derbarê perwerdeya bi kurdî da agahî û daneyên ku hêj nehatine kifşkirin dê hebin.

1.3.2. Di heyama navîn da perwerde

Di destpêka Heyama Navîn da li Ewrûpa dibistanên pagan û sazîyên perwerdeyê yên xirîstyanîyê bi hev ra hebûna xwe berdewam dikirin. Lê belê heta sedsala 7an hêdî hêdî dibistanên pagan ji holê rabûn û hemû kontrola perwerdeyê kete bin kontrola sazîyên perwerdeyê yên xirîstyanîyê da. Di vê biwarê da di sala 529an da bi fermana împaratorî Akademîaya Platon ya li Atînayê hate hilweşandin. Ji dêvla vê akademîayê sazîya Monte Cassîno (529) hatîye avakirin. Her weha ji bo vekirina dibistanên seretayî di bin banê Dêrê da bîr vekirin pêngavên fermî hatin avêtin. Piştî demekê Dêra Romayê berpirsariya perwerdeya çîna xebatkar li ser xwe girt. Bi vê mebestê dibistanên Dêrê vebûn. Ev dibistan jî bi navê Dibistanên Katedral, Dibistanên Îlmîhal û Dibistanên Felsefeyê bûn. Bi vî awayê ji sedsalên 5 û 6an pêve êdî bi tevahî di bin kontrola dêrê da bû, nexasim jî perwerdeya gel.

Xirîstyanî, doktrînen felsefeyî yên Heyama Antîk bi tevahî red dike. Lê belê axlebê pergala perwerdeya grek û ya Yewnana Antîk werdigire. Dibistanên dêrê li ser bingehê vê perwerdeya heyama kevin hem zimanê latînî dida hînkirin hem jî heft zanistên bingehîn yên bi navê rêziman, dîyalektîk, arîtmîk, geometrî, astronomî û hwd didane hînkirin.

Bi destpêka sedsala 11an ra navendên perwerdeyê êdî veguhestin dibistanên bajaran. Piştî gelek bizav û reformên perwerdehî, zanîngehên modern ava bûn. Ev

zanîngeh bi wergirtina mamoste û xwendekaran bi navê loncayan hatin avakirin. Di van zanîngehan da fakûlteyên bi navê fakûlteya zanistên bîngehîn, fakûlteya tibê, fakûlteya hiqûqa romayê û fakûlteya teolojîyê hebûn. Di van zanîngehan da li gorî bîngeha fikra skolastîk perwerde dihate dayîn. Ev zanîngeh bi her awayê xwe li ser hevkarîyê ava bûne û li ser hemû rêvebirin û stratejîyan biryara hevpar dihate stendin.

Di Heyama Navîn da li Hîndistanê perwerdeyê hevgirtî ya ji bo hemû civatê tune bû. Lewra di vê serdemê da pergala civakî ya bi navê *kastê* hebû. Li gorî vê pergale hemû civat li gorî pîvanê serdestîyê hatîye dabeş kirin. Pergala *kastê* di nava vê şaristanîyê da xwedî rabirdûyê 3 hezar û 500 salîye. Loma bandora wê li ser civakê xurt bû û wekhevîya hemû civatê zehmet bû.

Di Serdema Navînda di nava şaristanîyên Mezo-Amerîka da şaristanîya Mayayê xwedî taybetmendîyên balkêş e. Herwisa ev şaristanî, şaristanîya herî temendirêj ya vê serdemê ye. Mayayîyan tevgerên gerestêrkan ji nêzîkve şopandine û hesap kirine. Bi vî awayî di warê astronomîyê û matematîkê da pêşketine. Herwisa şaristanîya Maya pergaleke aîdê xwe ya reqeman jî dahênaye û bikaranîne. Di nava şaristanîya Mayayîyan da ev hêmanên zanistî nîşaneyên perwerdeyê xwedî pergal û pêşketî ne.

Yek ji şaristanîya Mezo-Amerîkayê ya Serdema Navîn jî şaristanîya Aztekan e. Di nava vê şaristanîyê da çendek celebên dibistanan hebûn. Hinek ji van dibistanan jî Calmecac ve Telpoçcalî bûn. Dibistanên Calmecac ji bo malbatênêlît ango rêvebirîn dewletê bûn. Dibistanên Telpoçkalî jî ji bo gel bûn ku hemû endamên civatê xwedî mafê perwdeyê bû di van dibistanan de.

Di serdema navîn da di nava misilmanan da jî perwerde bûye xwedî pergal û gihaye asteke pêşketî. Di nava misilmanan da navenda perwerdeyê ya yekem Mescîda Muhemmed pexember e. Piştî vê mescîda yekem êdî ji bo perwerdeya tevahî civatê jî mizgeft û mescît hatine avakirin. Digel van mizgeft û mescîdan ji bo zarokan dibistanên bi navê Kûttab, ji bo mezinan jî medrese hatine avakirin. Ji serdema xelîfeyan ve êdî ji bo hemû dibistanan peyva mekteb hate bikaranîn. Ev

navê mektebê heta roja me jî di nava civakên misilmanan da bi awayekî çalak tête bikaranîn.

Di nava misilmanan da navendên perwedeyê yên bingehîn û pêşketî medrese ne. Li ser avabûna yekem medreseyê her çîqas nîqaş hebin jî, li gorî çavkanîyên berdest medreseya yekem ya hatî avakirin Darûssûnne ye. Ev medrese ji aliyê Ebûbekir Sibgî ve li Nîşabûrê hatîye avakirin. Di nava dîroka medreseyan da Medreseyên Nîzamîye bêgûman xwedî cihekî giring in. Ev medrese ji aliyê wezîr Nîzmûlmûlk ve hatine avakirin. Nîzamûlmûlk, wezîrê siltanê Selçûqî Alparslan û lawê wî Siltan Melîkşah e ku di warê zanîn û revebirina dewletê da jî xwedî gelek serkeftina ye. Lewra Medreseyên Nîzamîyeyê jî navê xwe ji vî wezîrî girtinê. Medreseyê nîzamîye xwedî pergala û bernameyên pêşketîye. Ev medreseyan demeke dirêj çalak bûne û di dîroka perwedeyê da jî xwedî cihekî giring in. Ev medrese ji ber gelek taybetmendîyê xwe yên mîna pergala ders derbaskirinê, burs dayînê û hwd. wekî mînaka yekem ya dibistanên modern jî têne hesibandin. Di medresyên vê serdemê da digel dersên dînî, dersên zanistî yên mîna matematîk, astronomî û tîbbê jî dihatin dayîn. Di nava misilmanan da ji xeynî medreseyan navendên perwerdeyê yên bi navê tekke, dergah, zavîye û hwdjî hebûn. Di nava van navendên perwerdehî yên misilmanan da kesayetên mîna Îbnê Sîna, Farabî, Bîrûnî (el-Ustad) hwd gihîştine û van kesayetên bandoreke erênî li zanist û şaristanîya mirovahîyê kirine.

Di serdama navîn da bi bandora şaristanîya dînê misilmantîyê, kurdan jî medreseyên xwe ava kirine. Di van medreseyên kurdan da perwerde piranî bi zimanê erebî bû. Ji ber ku zimanê Qur'ana pîroz bi erebî bû loma xwendin û şîrovekirina navendên perwerdeyê jî piranî dibû erebî. Di medreseyên kurdan da digel zimanê erebî, zimanê kurdî jî xwedî cihekî berbiçav e. Lewra gelek pirtûkên xwendinê bixwe jî bi kurdî bûn û şîrove û analîzên zanistî jî bi kurdî dihate kirin.

Di van medresyê kurdan yên vê serdemê da kesayetên mîna Îsmâîl Ebul-îz, Melayê Cizîrî û hwd gihîştine. Îsmâîl Ebûl-îz ku eslê xwe ji Cizîra Botan e di serdema xwe da dahênanên robotîk-otomatîk kirinê ku niha jî di lîteratûra cîhanî da wekî yekem dahênerê robot û otomasyonê tête zanîn. Melayê Cizîrî jî hem bi kêrhatina xwe ya nivîsîna arûz û helbestê hem jî di felsefeya tesavufê ya şaristanîya misilmanî da xwedî asteke bilind e.

1.3.3. Vejîna perwerdeya modern û geşedana wê

Ji perwerdeya modern qest ewe ku perwerdeya ji pêşdibistan, dibistana seretayî, dibistana navîn û perwerdeya bilind pêk tê û xwedî pergaleke sîstematîk e. Ev pergala perwerdeya modern halêhazir li hemû dewletên medenî heye û rojbiroj li gorî şert û mercên serdemê di nava geşedanê da ye.

Di warê perwerdeya modern da di sedsala 19em cara pêşîn dewletên wekî Fransa û Prûsya ji dewletên din yê cîhanî ra bûne model. Tevahî dewletên din bernameyên perwerdehî yê van herdû dewletan analîz kirine û di vê çarçoveyê da ji xwe ra pergala perwerdeya modern ava kirine. Di van salên dawî da jî di warê perwerdeyêda dewletên Fîlandî û Amerîkî bûne model û ji aliyê dewletên din ve geşedanên van dewletan yê perwerdehî ji nêzîk ve têne şopandin.

Li Ewrûpayê veguheztina perwerdeyê ji pergala klasîk ber bi ya modern ve pêşî di qada dibistanên serateyî da pêk hatîye. Veguhestinên piralî yê civakî rê li ber modernbûna hemû astên perwerdeyê vekirîye û piştî demekî hemû perwerde ji bin destê dêrê derketîye û êdî ketîye bin destên rêvebirîyê dewletê an jî rêveberîyên herêmî(şaredarîyan) de. Wezaretê perwerdeyê ya girêdayî dewletê cara yekem di sala 1878an da li Prûsyayê ava bûye. Piştî avakirina vê wezaretê êdî dewletên mîna Fransa jî ev pergal bicîh kirine. Bi vî awayî li seranserê Fransayê piranî sazîyên perwerdeyê ketine bin kontrola dewletê de. Ev kontrola dewletê ya perwerdeyê li piranî dewletên din yê Ewrûpa jî hatîye bicîhkirin. Piştî demekî dêrê ev kontrolkirina dewletê ya li ser perwerdeyê qebûl nekiriye û ev yek di navbera dewletê û dêrê da bûye sedema xireciran. Ev xirecir carinan veguhestine pêşbirkê jî. Li gorî vê pêşbirkê hem dêr hem jî dewletê di warê perwerdeyê da reform çêkirine û xwestine perwerdeya xwe bigihînin asteke bilind. Yanî vê xirecira dewletê û dêrê di warê perwerdeyê da bi xwe ra encamên erênî anîne ku bi sînordar be jî pêşketin di warê perwerdeyê da çêbûye. Piştî demekê dêr mecbûr maye dest ji perwerdeyê bikişîne û tenê bikarûbarên dîn ve dakeve. Di dawîya van encaman da êdî piranî sazîyên perwerdeyê ji bin destê dêrê derketin û ketine bin destê dewletên modern, zanistê, aborîyê û teknolojîyê de. Piştî van geşedanên êdî tevahîya perwerdeyê ji nû ve hate sazîkirin. Li gorî pisporên perwerdeyê astên perwerdeyê li gorî temen û pêdivîyên zaroktayîyê hatin dîyarîkirin. Li ser kontrolkirina piranî sazîyên

perwerdeyê ji alîyê dewletê ve, gelek rexne jî hatine kirin. Li gorî van rexneyan amaje tête kirin ku dê ev sîstema dewletî fikrên wekhev û ji rêzê biafirîne (Topping, 2003: 176).

Di vê serdemê da gelek perwerdekarên mîna Gazali, Erasmus, Comenius, Locke, J. J. Rousseau, Pestalozzi, Herbart, Fröbel, Dewey, Piaget, Vygotsky û hwd. gihîştine. Ji van perwerdekarên fikra her yekê ji hev cûda ye û perwerdeya serdama modern bi fikrên cûda yê van kesayetan şewaz girtîye. Di nava van kesayetan da yek ji kesê herî bidandor J. J. Rousseau ye. Ji gelek alîyan ve bandoreke berbiçav li civakê kirîye. J. J. Rousseau, li ser mijarên mîna perwerdeyî, sîyasî, dîrokî û hûnerî berhemên giring dane. Li ser perwerdeyê berhemawî ya bi navê *Emile* xwedî cihekî giring e. Rousseau di vê berhemê da li ser gihîştin û perwerdekirina lawikekî baş yê di xeyalê xwe da sekinîye (Korkmaz û Öktem, 2014). Ev berhem bigiştî li ser perwerdekarîya zarokekî ya ji biçûktayî heta temenê navsere sekinîye. Di vê berhemêda serdemên geşedanê yê zarokan hatine dabeşkirin û li gorî van serdeman pêdivîyên perwerdeyî û kesayetî hatine dîyar kirin. Bi vî awayî vê berhema J. J. Rousseau ya bi navê *Emile* bi gelek awayên xwe ve bandor li dîroka perwerdehî ya cîhanê jî kirîye. Herwisa vê berhemê rê li ber şewazên nû yê cîbicîkirina perwerdeyê vekirine.

Di vê serdemê da bi pêşketina teknolojiyê û medyayê ra êdî perwerde bûye xwedî binyadeke global û sîvîl. Herwisa di demên dawî da teknolojiyê ji bo perwerdeyê têgeha mekan û demê ji holê rakirîye û li hemû cih û her demê da herkes dikare perwerde bibe ango perwerde bibîne. Bi vî awayî ji alîyê pisporan ve tê çaverêkirin ku pol û dibistanên dahatûyê ewê sanal bin û di vanmekanên sanal da dê perwerde bê cîbicîkirin.

Di nava van geşedanên perwerdeya modern da li gorî mîletên din her çiqas dereng be jî kurdan jî pêngavên sazîyê perwerdeyê avêtine. Lê belê li gorî aloziya rewşên sîyasî civakî ev pêngav sînodar mane an ji pêk nehatine. Ji van pêngavan ya yekem, Kurd Teawin Teraqî Cemîyetî(Cemîyeta Pêşketin û Bilindkirina Kurd)li Stenbolê dibistaneke modern ava kirîye lê piştî demeke kin ji alîyê rêvebirên dewletê ve hatîye girtin. Piştî pêngava yekem Seîdê Kurdî xwestîye Zanîngeha Medrestûzêhira veke ku yek ji zimanê sereke yê perwerdeyê dê kurdî bûya lê ev yek

pêknehatîye (Yıldırımçakar, 2016:96). Her wisa di wê serdemê da Salih Bedirxan bi alîkarîya Simkoyê Şikak li bajarê Xoyê dibistaneke bi navê *Gihandinî* ya kurdî avakirîye lê ev jî di demek kin da hatîye girtin (Celîl, 2013:72). Bi vî awayî kurdan di warê perwerdeya modern da xwestine xwe bigihînin milletên din lê mixabin van xwestekan cihê xwe negirtîye û kurdî ji sazîyê perwerdeyê yên modern heta demekî bê par maye. Derbarê van pêngavê perwerdeyî yên kurdan da em dê di beşên jêrîn da bi hurgulî agahîyan bidin. Her wisa sedem û encamên wan analîz bikin.



2. KURTEYEK JI DÎROKA PERWERDAYA KURDÎ

2.1. Serdama Klasîk Ango Serdama Medraseyên Kurdan

Medrese, ji peyva erebî “derase”yê çêbûye û tê wateya cihê xwendinê an jî xwendigeh/avahîya xwendekaran (Hızlı, 1987:274).

Sazî û navendên perwerdeyê di serdema dewletên Îslamî de avabûne û kar û barên perwerdeyê bicih anîne. Di serdema dewleta Abbasî de li Bexdayê di dema Xelîfe Me'mun (198-218/813-833), 217/832de navendên perwerdeyê yên bi navê “*Beytûl hîkme*”, “*Darul ulum*”û “*Beytûl îlîm*” vebûne (Baltacı, 1976:5). Ev navendên perwerdeyê bûne bingeh ji bo avakirina medreseyan. Di derbarê medreseya yekem û avakarên medreseyan de gelek niqaş hene. Lê qenaeta giştî ew e ku medreseya yekem ji alîyê wezîr Nîzamûlmulk ve hatiye avakirin (Çelebi, 1987:367). Van medreseyan navê xwe ji avakarê xwe Nizamûlmulk girtine û weke “Medreseyên Nîzamîye” hatine binavkirin. Medreseyên Nîzamîye pêşî li Bexdayê hatine avakirin. Piştî jî li bajarên mîna Îsfahan, Rey, Nişabûr û hwd. ava bûne. Êdî medrese bûne navendên giring yên hînkirina misilmantîyê û gîhandina ‘alimên misilmantîyê. Piştî belavbûna van medreseyên destpêkê kesayetên mîna Selahadînê Eyûbî jî giringî daye avakirina medreseyan û li bajarên wekî Qahîre, Îskenderîye û Quds û hwd. medrese avakirine. Bi vî awayî avakirina medereseyê û çanda wan ya perwerdeyê li nava hemû civakên misilman belav dibe.

Di wê serdemê de weke hemû civakên misilman hikumet û Mîrektîyên kurdan jî li bajarên xwe medreseyan ava dikin. Ev mederse dibin navendên giring yê zanist û edebîyatê jî ku gelek kesayetên kurd yên mîna Melayê Cizîrî, Îsmail Ebûlîz, Ehmedê Xanê û hwd. di van medreseyan de digihêjin.

2.1.1. Di serdama mîraktîyan da perwerdaya kurdî

Ji serdama mîraktîyên kurdan qest ewe ku li herêm an jî navendên kurdnişîn, mîr û begên kurdan desthilatdar bûn. Ev serdem, bi gelemperî navbera sedsalên XIII-XIXem di nava xwe da dihewîne.

Ev dasthilatên mîrên kurdan heta sedsala XVIan wekî dawletên serbixwe bûn. Lê di sala 1514an da siltanê osmanî Yavuz Selîm, bi navbeynkarîya Îdrîsî

Bedlîsî bi mîrên kurdan ra tifaq çêkir. Bi vî awayî mîrên kurdan wekî rêveberîyên otonom girêdayî dawleta Osmanî bûn (Doğan, 2010: 3; Bruinessan, 1995: 1007; Bozkurt, yd. 2011: 26). Ji sala 1514an heta nîveka sedsala 19an ev rêveberîyên mîraktîyên kurdan yên nîv-serbîxwe ango otonom dewam kirin. Martîn Van Bruinessen (1992) vê rewşa mîraktîyên kurdan wekî proto-dawlet (merheleya berî dawletbûnê) binav dike. Heta Serdema Tanzîmatê (1839) vê sîstemê dewam kir ku civaka kurd di nava rêveberîya mîrên kurdan, di bin sîwana siltanê Osmanî da dihate rêvebirin.

Bi serdema Tanzîmatê (1839) ya dawleta Osmanî ra êdî bi bandora modernîzmê gelek guherîn pêk hatin û fikrên nasyonalîzmê jî di nava milletên dewleta Osmanî da xurt dibûn. Dewleta Osmanî jî ev fikrên nasyonalîzmê yên ku bi modernîzasyona bi Tanzîmatê ra hatî ji xwe ra xetera didîtin. Bi vê mebestê rêveberîya siltanê Osmanî dixwaze yekpareyîya xwe bihêztir bike û navendîbûna xwe ya dewletî xurt bike. Loma zext û fişar li ser civatê, nemaze jî li ser rêveberîyên otonom yên wekî mîrektîyên kurdan zêda dikirin. Li hemberî van zext û fişaran mîraktîyên kurdan li ber xwe didan û serîhildan çêdibûn. Di sala 1840an serîhildana mîrê Cizîrê Bedîrxan Beg û di sala 1878an berxwedana Şex Ubeydullahê Nehrî hinek ji van serîhildanên kurdan yê wê serdamê ne (Cefîl, 2014:80). Dewleta Osmanî jî ev serîhildan û bihêzbûna mîrên kurdan ji xwe ra wekî xetera didît û xwestîye van mîrektî û rêveberîyên kurdan bi temamî jinav bibe. Bi vê mebestê dawleta Osmanî êriş bire ser herêmên kurdan. Kurdan jî li hemberî van êrişan serîhildan û li ber xwe dan.

Piştî vê taswîra giştî ya sîyasî û civakî di wê serdamê da ji bo xebata me ya giring rawşa perwerdaya kurdî ye. Bi awayekî giştî dikara bê gotin ku berî tifaqa dawleta Osmanî û ya Mîraktîyan, em dikarin bibêjin ku di sedsalên dastpêkê da mîraktîyên kurdan hê sîstema xwe ya sîyasî û ya perwerdeyî rûneniştandibûn. Sedemavê yekê jî nebihêzbûna van mîraktîyan û nebûna îstîqrarê bû. Lewra di vê serdamê da mîrektîyên kurdan pêşî rastî êrişên hêzên tirkmenên wekî akkoyunîyan û piştî wan jî rastî êrişên safevîyan dihatin. Di bin vê bêîstîqrarîyê da jî derfet ji bo perwerde û edebîyata kurdî çênedibû (Adak, 2015;191). Îcar piştî tifaqa Mîrektî û Dewleta Osmanî êrişên tirkmen û safevîyan kêmbûn. Bi kêmbûna van êrişên darve,

êdî li nava rêveberîyên mîrektîyan da jî alozîyên sîyasî û civatî jî kêr dibin. Bi vî awayî rewş axlebe aram dibe û rê li ber darfetên perwerde û hwdvedibe. Medreseyên di bin rêveberîyên mîrektîyan da heyî êdî bi awayekî bihêztir têne piştgirîkirin. Bi vî rengî perwerdeya medreseyên kurdan pêşdikeve û xwe digihîne asta cîhanî ya wê serdemê.

Wekî hemû civatên misilman yê wê serdamê, kurdan jî di serdama mîrektîyan da perwerdeya xwe li ser esasê dîna îslamê û bi alafebeya aramî cîbicî kirîye. Her wisa ji ber ku Erebi zimanê Qur'an a Pîroz bû di nava perwerdeya medreseyên kurdan da zimanê erebî xwedî cihekî giring bû. Di van medreseyan de digel zimanê erebî, zimanê kurdî jî heta dereceyekî dihate bikaranîn. Nemaze jî di warê dersdayîn û şîrovekirina meseleyên zanistî û dînî da zimanê kurdî karîger bû. Jixwe gelek materyal û pirtûkên dersdayînê yê wê wêkî pirtûkên dersê dihatin xwendin kurdî bûn. Pirtûka rêzimanê *Serfa Kurmancî*, pirtûka pedagojîyê *Nûbihara biçûkan* û hwd. hinek ji wan pirtûkên kurdî ne ku wêkî pirtûkên dersê di medreseyên kurdan dadihatî xwendin.

Girêdayî vê, perwerde û xebatên kurdî di van medreseyan da edabîyat û zimanê kurdî geşedaneke berbiçav nîşan dida. Di nava vê geşedana ziman û edebîyatê da gelek kesayetên mîna Melayê Cîzîrî, Elîyê Teremaxî, Ehmedê Xanî û hwd. berhemên xwe yê giranbiha didin. Di medreseyên kurdan da digel dersên dînî û edebî dersên 'ilmî jî xwedî cihekî giring in. Di ware 'ilmêda jî gelek kesayet gihîştine û xebatên bêhempa dahênane. Îsmâîl Ebûl-îzê ji Cizîra Botanê yek ji alimên van medreseyên kurdan e û di asta cîhanî da wêkî dahênerê robot-otomasyonê tê nasîn. Xebata Îsmâîl Ebûl-îz, ya otomatîk ji xebat û geşedanên aniha di qada robotan da pêk tê re, wêkî bingeh tê zanîn. Herweha darbarê 'ilmzanîyê da gotineke yek ji mamosteyên van medreseyan Elîyê Teremaxî ku di berhema wî ya *Serfa Kurmancî* da derbas dibe wiha ye; "ilm tu bizan ey kesê muxetteb, lewra binyada hemû tiştî 'ilm e (Teremaxî, 2015: 13). Ev gotin jî ji bo nîşandanyîna ast û motîvasyonê 'ilmê di medreseyên kurdan da xwedî cihekî giring e.

2.1.2. Piştî serdama mîrektîyan û heta dawîya salên dawî yên Dewleta Osmanî perwerdeya kurdî

Di salên 1800î da piştî pevçûnên dûrûdirêj yên di navbera mîraktîyên kurdan û Dewleta Osmanî da, mîrektîyên kurdan têk diçin. Bi vê têkçûna mîrektîyên kurdan ra êdî desthilatîya van herêmên mîrektîyan bi temamî dikeve destê Dewleta Osmanî da. Destguhertina desthilatê û guherîna rewşa sîyasî, ji gelek alîyan ve bandor li ser civata kurdan kirîye. Vê destguhertina desthilatî ya li erdîgarîya kurdan, valahîya otorîteyê bi xweraanî. Dewleta Osmanî nekarî bi temamî herêmê kontrol bike û bi rêve bibe. Bi lawazbûna desthilatê ra, di nava civakê da alozî û kiryarê neyînî rû dan. Herweha di nava civakê da kiryarên ‘eşîrtî, axatî û hwd. derketin meydanê.

Dewleta Osmanî xwestîye desthilata xwe li ser herêmê bisepîne û bi awayekî yekpareyî girêdana herêmê bi navenda xwe ra xurt bike. Bi vê mebestê ji bo rêvebirina herêmê eyaleteke taybet ya bi navê “Eyaleta Kurdistanê” tê avakirin. Eyaleta Kurdistanê li gorî zagona giştî ‘Qanûnî Esasî’ bi fermî hatîye avakirin. Avakirina wê di 14 çirîya paşîn sala 1847an di rojnameya fermî ya wê serdamê da hatîya daxuyandin. Di vê derbarê da daxuyanîya di rojnameyê da hatî weşandin wiha ye: “Guncav û munasip hatîye dîtin ku bi yekparayîya parêzgeha Dîyarbakir û bajarokên Wan, Muş, Colemerg û bajarokên Cizîr, Bohtan û Mêrdînê eyaletek bê avakirin û navê eyaletê jî wekî Eyaleta Kurdistanê hatîya dîyarkirin” (lütfi, 2007: 115).

Bi vî awayî bi fermana siltanê Osmanî Abdûlhamîdê IIyem Eyaleta Kurdistanê bi awayekî fermî hatîye avakirin. Navenda eyaletê jî ji ber derfetên leşkerî pêşî bajarokê Xelatê hatîye dîyarkirin. Piştî ji ber kêmbûna derfetên lojîstîk û hwd ên li bajarokê Xelatê, navenda Eyaleta Kurdistanê veguheztine Dîyarbakirê. Navend li Dîyarbakirê, bi rêya walîyên giştî ev eyalet hatîye birêvebirin.

Bi avakirina Eyaleta Kurdistanê ra jî Dewleta Osmanî negihaye armanca xwe ya desthilatî û rêveberîya herêmê birêkûpêk nebûye. Walîyên Osmanî nekarîne wekî mîrên kurdan herêmê kontrol bikin û bi rêve bibin. Digel nebûna rêvebirin û nebûna xizmetgûzarîyê jî walîyan li ser civakê bac û xerac zêdekirin. Vê yeke jî nerazîbûna civakê bi xweradianî. Di encamê da valahîya otorîteyê berdewam kirîye û alozîyên di nava civakê dazêdetir bûne.

Di nava vê atmosferê da êdî terîqet organîze dibin û rojbiroj ji bo pêdivîyên civatê yên perwerdayî û manevî dibin bersiv. Nemaze jî terîqeta Xalidî û Qadirî li herêmê gelek belav dibin, di nava civakêda dibin xwedî cihekî giring. Civak li dora van terîqetan kom dibe û pêdivîyên xwe yê civakî (perwerdehî, dînî û hwd) di wan medrese û tekyayênwan da pêk tîne. Ev terîqet axlebe li gund û bajarokan organîze dibin û medrese û tekyayên xwe ava dikin. Lewra li van gund û bajarokan dasthilata fermî ya dawleta Osmanî pir lawaze an jî qet tune ye. Nemaze jî terîqeta Xalidî ku pêşengê wê Mewlana Xalidê Şarezorî ye, bi rêya xelîfeyên xwe gelek medrese û tekyayan ava dikin. Hinek ji van medreseyên giring û xwedî bandor Medreseya Nehrê, Medreseya Basretê, Medresya Xeyda, Medreseya Aqtepe û hwd in.

Ev medreseyên Terîqetan jî wekî sîstema medreseyên mîraktîyan dihatin meşandin. Di van medreseyan da jî zimanê kurdî xwedî cihekî giring e û ziman û edabîyata kurdî gihaye asteke bilind. Pirtûk û metaryalên dersê yên bi zimanê kurdî zêde bûne. Şargirtên ji miletên cîran (erab, tirk û hwd) dihatin, di van medreseyan da zimanê kurdî hîn dibû. Tradîsyana van medreseyan heta niha di roja me da jî berdawam dike.

Bi awayekî giştî di serdema klasîk ango serdama medreseyan da perwerdaya kurdî di asteke pêşketî ya wê serdamêda bû. Di vê darbarê da Prof. Dr. Abdurrahman Adak jî perwerdeya kurdî ya vê serdemê di gotareke xwe ya devkî da wiha rave dike;

Di serdama klasîk da, di asta miletên din ên misilman; faris û tirkî da, di nav kurdan da jî perwerdahî hebû û ji wan zêdatir nebe jî ne kêmtir wan bû. Tu ferq di navbera medreseyên kurdan û yên miletên cîran yên wê serdamê da tune bûn. Qet nebe ji aliyê sazûmaniyê ve, ji aliyê mîmariyê ve.¹

2.2. Serdama Modern Ango Serdama Ronakbîrîyê

2.2.1. Di navbera salên 1897-1908an da perwerdaya bi kurdî

Rewşenbîr û begzadayên kurdan yên ku hêvî ji reformên Abdûlhamîdê Iiyem birî, hêj di sala 1897an da cemîyetek avakirin. Xwesteka vê cemîyetê ya sereke bidestxistina 'rêveberîyeke otonom' e. Bi rêya vê otonomîyê dixwazin kurdan ji nav zilm û kiryarên Dewleta Osmanî rizgar bikin (Malmîsanij, 2002: 13). Mîqdad Mîdhat

¹<https://diyarname.com/news.php?Idx=52661> (Dîroka wergirtinê, 01.08.2022)

Bedîrxan jî wekî organa vê cemîyetê di sala 1898an da li Qahîrayê Rojnameya Kurdistanê ava kir.²

Rewşenbîrên kurdan yên wê demê gelek xema perwerdeya kurdî jî xwarine. Di vê derbarê da wekî ku di Rojnameya Kurdistanê³ da jî hatiye weşandin piştî îlana meşrûtiyetê rewşenbîrên kurdan ji hikûmeta wê demê daxwaz kirine ku bi rêya bac û dahatên weqfan yên wir, li herêmê sazîyên perwerdayê ava bikin. Di bersiva hikûmetê da jî hatiye gotin ku “Em pêşîyê giringî didin sazîyên perwerdaya paytext û derdora wê lê belê dê dora Kurdistanê jî werê”. Bi vê bersiva hikûmetê xûya dibe ku pêngav û xwestekên rewşenbîrên kurdan yên perwerdeyî di wê demê hatine taloq kirin ango nehatine bicihkirin.

2.2.1.1. Derketina rojnameya Kurdistanê û rola wê ya perwerdeyî

Li gorî wan milletên din yên di nava dawleta Osmanî da kurdan, hinekî dereng dest bi karê çapemenîyê kirîye. Wekî mînak rojnameya tirkî di 1828an da, rojnameya Erebi di sala 1828an da, rojnameya ermenkî di sala 1831an da derketîye lê belê yekem rojnameya kurdî li gorî wan milletên navborî, piştî 30 salan derketîye. Çend sedemên vê derengmayîne, mîna lawazbûna çanda kurdan ya bajarvanîyê⁴ û lawazbûna tradîsyoneke xurt ya rewşenbîrîyê û hwd hene. Piştî vê derengmayîne yekem rojnameya kurdî jî di 22 Nîsana sala 1898an da bi navê Rojnameya Kurdistanê li Qahîreyê⁵ derketîye. Weşangerê rojnameyê Mîqdat Mîdhat Bedîrxan e. Mîqdat Mîdhat Bedîrxan kurê Emîr Bedîrxan e ku piştî serhildana wî ya di sala 18an da ji alîyê siltanê Osmanî ve mişextî girava Girîtê hatibû kirin. Herwisa li vê derê Emîr Bedîrxan ji bo karê dadwerîyê jî hatibû wezîfedarkirin. Mîqdat M. Bedîrxan jî li vê girava Girîtê hatiye dinê û piştî perwerdeyeke baş êdî vegeşîyaya Stenbolê û dest bi karên xwe yên rewşenbîrîyê kirîye.

²Kürdistan heyeti Tahririyesi, “*Karilerimiz*”, Kurdistan, Qahîra, hej. 1, r. 2.

³Mîktad M. Bedîrxan, “*İctimai Yaralarımızdan Maarifsizlik*”, Kurdistan, Qahîra, hej. 5, r. 3.

⁴Li gorî milletên cîran yên mîna Ermenîyan kurd pîranî li darveyî bajaran li gund û bajarokan karê çandinîyê û yê ajaldarîyê dikirin lê belê Ermenî li navenda bajaran bi kar û sin’etê hûnerî ve mijûl bûn. Bi vî awayî dikara bê gotin ku çanda kurdan ya bajarvanîyê lawaz bû.

⁵Darbarê darketina cihê rojnameyê da hinek niqaş hene ku dîrokasên kurd Elaadin Seccadi û Mehmet Emin Zeki Beg îddîa dikin ku rojnameya Kurdistanê cara yekem li Stenbolê darketîye û weşangerê wê Mîktad Mîdhat Bedîrxan paşê ew bar kirîye Qahîrayê. Bnr. Diroka Edaba Kurdi, r. 501; Diroka Kurd û Kurdistan, 1936, r. 37.

Piştî demekê Mîqdat M. Bedîrxan ji alîyê dawleta Osmanî ve hatîye vederkirin û wekî penaberekî xwe bi Misrê girtîye. Piştî çûyîna Misrê, êdî li bajarê Qahîrayê rojnameya Kurdistanê derxistîye. Bi derketina vê rojnameyê ve di dîroka kurdan da rojname vejîya. Derketina vê rojnameyê ji bo civak, sîyaset û rewşenbîrîya kurdî xaleke giring e (Celil, 2013;25). Mîqdat Mîdhat Bedîrxan armanca Rojnameya Kurdistanê wiha anîye ziman:

Di nav tevahiya welatan de gel bi zimanê xwe dixwîne û dinivîsine. Ji ber vê yekê jî ew gel bi pêş dikevin. Û digihîjin heqê xwe. Em kurd ewqas jêhatî ne, lê mixabin îmkan û mecal tune û xelk cahil û nexwendî dimîne û ji bûyerên derdora xwe û cîhanê serwest nabe. Bi îzna Xwedê ji niha û pêde, ji her 15 rojan carekê, ez dê rojnameyê binivîsînim û min navê wê kiriye Rojnameya 'Kurdistan'. Di vê rojnameyê de ezê qala qenciya zanyarî û têgihîştinê bikim. Li ku derê mirov fêr dibe û li ku derê xwendegê dibistanên qenc hebin, ezê nîşanî Kurdan bikim. Li ku derê çî şer dibe û dewletên mezin çî çê dikin, çawa şer dikin û tîcaret çawa dibe, ezê qala hemûyan bikim. Heta niha kesekî rojnameyê wuha nenivîsiye, ev rojnameya min ya pêşîn e, lewma dê gelek kêmanî hebin. Ez hêvî dikim hunê kêmaniyên rojnamê ji min re binivîsînin.

Ji vê beyanata Mîqdat Mîdhat Bedîrxan jî dîyar dibe ku Rojnameya *Kurdistanê* gelek armancên giringyên mîna wêje, folklor, sîyasî, neteweyî, civakî û dîrokî hilgirtine ser milên xwe.

Digel erk û armancên jorîn yek ji erkên giring ya ku Rojnameya *Kurdistanê* daye pêşîya xwe perwerde ye. Di rojnameyê da gelek caran amaje bi vê mijarê hatîye kirin. Piranî jî gazind ji bêperwerdebûna civata kurdî kirin û giringîya perwerdeyê dide nîşan. Di vê derbarê da di beyanata armancên rojnameyê da Mîqdat Mîdhat Bedîrxan nexşerêya perwerdeyê wiha destnîşan dike:

Em kurd ewqas jêhatî ne, lê mixabin îmkan û mecal tune û xelk cahil û nexwendî dimîne... Bi îzna Xwedê ji niha û pêde, ji her 15 rojan carekê, ezê rojnameyê binivîsînim... Di vê rojnameyê de ezê qala qenciya zanyarî û têgihîştinê bikim. Li ku derê mirov fêr dibe û li ku derê xwendegê dibistanên qenc hebin, ezê nîşanî Kurdan bikim.

Ji van hevokan jî dîyar dibe ku Mîqdat Mîdhat Bedîrxan dixwaze bi Rojnameya Kurdistanê ve hişmendîya kurdan ya perwerdeyî çêbike. Herwisa ji gelek alîyan ve wan perwerde bike. Mîqdat Mîdhat Bedîrxan di wê hişmendîyê da ye ku ji bo miletekî perwerde çendî giring e û perwerde çawa bîr û fikren civatan fireh dike.

2.2.2. Di navbera salên 1908-1923an da perwerdeya bi kurdî

Di van salan da Împeratorîya Osmanî bi gelek kêşeyan ra rûbi rû mayê. Ev kêşe hem ji hundir(navxwe) hem jî ji derve ne ku Şerê Trablusgarbê û Şerê Balkanan jî di van salan da ne. Piştî van her du şeran Dewleta Osmanî li parzemîna Efrîqa û Ewrûpayê axa xwe ji dest daye. Pirsgirêkên heyî yê Dewleta Osmanî bi bandora van şer û alozîyan zêdetir bûn. Rewşa civatê ya aborî xerab dibe, li ser milê xelkê bac û xerac zêde dibe. Bi vî awayî bertek û nerazîbûnên civakê jî derdikevin holê. Ev hemû encam dibin sedema lawazbûna desthilata Siltan Abdulhamîdê IIyem. Bi vî lawazbûna siltanê Osmanî ra jî êdî Cemîyeta Îttîhad û Terakkî bihêz dibe. Ev cemîyet jî wekî bizaveke sîyasî ya bi opozîsyona siltanê Osmanî, ji aliyê Jön Türk(Tirkên Nû)an hatîye avakirin. Di avakirina Cemîyeta Îttîhad û Terakkî da gelek rewşenbîrên kurdên navdar yê mîna Dr. Abdullah Cevdat, Seyîd Evdilqadir, Şerîf Paşa, Mevlanzade Rifat, Lûtfî Fîkrî, Fanîzade Alî Îlmî jî cih digirin (Malmîsanîj, 2002: 17). Li hemberî vî bihêzbûna Cemîyeta Îttîhad Terakkîyê, siltan Abdulhamîdê IIyem neçar dimîne Meşrûtiyeta IIyem îlan dibe ku ev yek jî karbidestiyên Siltan sînordar dibe.

Di nava atmosfera Meşrûtiyetî da ji bo kurdî û perwerdaya kurdî geşedana herî giring bi fermî dibistanek bi navê “Kurd Meşrutiyet Mektebi” li Stenbolê hatîye avakirin. Ev dibistan bi fermî li gorî rêzîknameyên dewletê hatîye avakirin û gerîndeyê giştî yê mektebê jî Evdirehman Bedîrxan e. Dibistana “Kurd Meşrutiyet Mektebi” di dîroka Dewleta Osmanî û Tirkîyeyê da yekem û tekane dibistana kurdî ya fermî ye.

Piştî gelek geşedanên sîyasî di nava Dewleta Osmanî da Cemîyeta Îttîhad û Terakkî bi rêya kodatayê desthilata dewletê bidest dixe. Ev desthilata nû êdî xwe dispêrê fikreke rijd ya tirkîyê. Li gorî vî fikra rijd ya tirkîyê êdî zimanê kurdî tune tê hesibandin û hemû pêngavên kurdî yê perwerdeyî û çandî ji aliyê desthilata Îttîhad û Terakkî ve tene astengkirin. Di çarçoveya van astengîyandibistana kurdî jî ji aliyê hikûmeta ittihat terakkîyê ve tê girtin.

2.2.2.1. Avakirina Cemîyeta Kurd Teawin ve Teraqî(Cemîyeta Alîkarî û Bipêşketina Kurdan) û perwerdeya kurdî

Bi îlana Meşrûtîyetê ra êdî atmosfereke serbestî û azadîyê çêbûye. Di nava vê atmosferê da bi pêşengîya malbatên Bedîrxanî, Babanî û Nehrî ji alîyê Seyîd Evdiqadir û Emîn Bedîrxan ve Cemîyeta Teawin û Teraqî (CKTT) di payîza sala 1908an da ava bûye (Jwaidah, 2014: 211-212).

CKTT, yekem komeleya kurd ya fermî ye ku ji alîyê dewletê ve hatîye pesendkirin. Armanca sereke ya vê cemîyetê hevsengî û yekîtiya xebat û tekoşîna kurdan ya di wê serdemê da ye. Lewra ev cemîyet ji alîyê her sê malbatên sereke; Bedîrxanî, Babanî û Nehrî yên di wê serdamê ve ava bûye û ev yek jî ji bo yekîtiya kurdan derfeteke giring bû. Vê cemîyetê bi mebesta perwerdekirina zarokên kurdan şaxeke xwe ya perwerdeyê û dibistaneke bi zimanê kurdî ya fermî vekirine.

2.2.2.1.1. Cemîyeta Kurd Neşrî Maarîf (Kürt Neşri Maarif Cemiyeti) û bandora wê li ser perwerdeyê

Ev cemîyet ji alîyê KTTC (Kürt Teavvün ve Terakki Cemiyeti) ve bi mebesta belavkirina xwendin û nivîsîna di nav kurdan da ava bûye. Li gor çavkanîyên berdest dîroka avakirina wê ne dîyar e. Di derbarê navnîşana cemîyetê da Bahattin Demir(2010) ji arşîvên Osmanî wiha neqil dike; navenda cemîyetê ya rêvebirî li taxa Hoca Rustem, kuçeya Hukuk Mektebî, Xaneya Nafiz Paşa ye⁶.

Vê cemîyetê xwestîye, nemaze li Stenbol û derên din yên kurd lê dijîn xwendîgehên kurdî vekin û xwendin û nivîsîna kurdî pêş bixin. Di nava avakarên cemîyetê da rewşenbîrên mîna Dr. Abdullah Cevdet, Abdurrahman Bedirxan, Bediuzzaman Saîdê Nursî, Xelîl Xeyalîyê Motkî, Kurdîzade Ahmed Ramîz hebûn (Göldaş, 1991: 248).

⁶Başbakanlık Osmanlı Arşivi (BOA), *Dahiliye Nezareti Muhaberât-ı Umumiye İdaresi* (DH.MUİ.), Dosya No: 60, Gömlek No: 2, 1328. M.19.

2.2.2.1.2. Dibistana Kurd Meşrutiyet Mektebi(Kurd Nimûne İbtidaîsi-Meşrutiyet) û perwerdeya kurdî

Ev dibistan ji alîye Cemîyeta Kurd Neşrî Maarîf ve li Stenbolê bi destûrnameya fermî ya hikûmeta wê serdemê hatîye avakirin. Di avakirina vê dibistanê de Xelîl Xeyalî roleke giring lîstîye. Di vê dibistanê de li ser alfabe ya Xelîl Xeyalî amadekirî⁷ perwerdeya bi zimanê kurdî hatîye dayîn.

Di derbarê destûrnameya fermî ya wezaretê navxwe ya wê serdemê da Bahattin Demir ji arşîvên Osmanî wiha neql dike: Li taxa Divanyolu Hoca Paşa yê li ser rêya Şerefiyeyê li hejmara sed û heftê û pêncê, li xaneya ku Haşim Efendî xwedîyê wê ye hatîye vekirin. Ji wezaretê Perwerde û ya Darayîyê hemû destûr hatine wergirtin û derbarê hemû mamoste û gerîndeyê dibistanê da rewşeke xetere nehatîye tespîtkirin⁸. Bi awayî armancên perwerdeya kurdî ya endamên komeleya KTTTCyê bi vekirina vê dibistanê ketine merîyetê.

Vekirina Dibistana Kurd Meşrutîyetê(DKM) di rojê medyaya wê serdemê da nemaze jî rojnameyên ermenî da cih girtîye. Di rojnameya Tanîn ya wê serdemê da derbarê vekirina Dibistana Kurd Meşrutîyetê da daxûyanîyeke wiha hatîye weşandin;

Ev dibistana ku li hemberî gora Siltan Mahmud hatî vekirin, bi xwendina mewlûda kurdî dest bi vekirina xwe kir û piştê ji serkirdeyên dibistanê di axaftinên xwe de behsa feydeyên meşrutîyetê kirin û herweha behsa giringîya perwerdeyê ji bo kurdan kirin.⁹

2.2.2.2. Avakirina Komeleya Xwendekarên Kurd-Hêvî(Kürd Talebe Hêvî Cemiyeti) û rola wê ya perwerdeyê

Wê serdemê xwendekarên kurd yê li Stenbolê bi hestên netewî pêdivî bi hevkarî û yekîtiya xwendekarên kurd dibînin û dixwazin komeleyekê ava bikin. Rewşenbîr û siyasetmedarên mîna Xelîl Xeyalî, Ekrem Cemîlpaşa, Memduh Selîm û hwd. piştgirîya vê hewldana xwendekarên kurd dikin. Di encama van hewldananda⁹ê tebaxa 1913andayekem komeleya legal (Malmîsanîj, 2002: 50) ya xwendekarên kurd bi navê *Kurd Talebe Hêvî Cemîyetî*(KTHC) tê ava kirin. Di çavkanîyên berdestdali

⁷Kadri Yıldırım "Sêidê Nûrsî û Ramanên Wî yê Derbarê Ziman û Perwerdehiya Kurdî de", Zend, Payîz, 2006, r. 25.

⁸BOA., Dahiliye Nezareti Muhaberâti Umumiye İdaresi (DH. MUI.), Dosya No: 60, Gömlek No: 2, 1328. M. 19.

⁹Rojnameya Tanin. 28 Adar 1910, hej: 563, r. 3.

ser navê komeleyê gelek nîqaş hene ku navê komeleye bi gelek awayên mîna Talebe-î Hêvî Cemîyetî, Kürt Hêvî Cemîyetî, Hivi Kürt Talebe Cemîyetî an jî Hêvî û hwd. derbas dibe. Di vê xebata xwedaem dê navê Talebe-î Hêvî tercîh bikin. Her wisa Komeleya Hêvî bi zimanê Tirkî wekî “Kürt Talebe Hevi Cemiyeti” jî tete nas kirin.

Cemîyeta Talebe-î Hêvî li ser bingehê saxlem û têgihîştî ava bûye. Dikare bê gotin ku Talebe-î Hêvî li ser mîrata berî xwe ava bûye û xebatên zimanî, rewşenbîrî û kovarî kirine. Berî avakirina vê komeleyê zemîneke rewşenbîrîya kurdî hebû û endamê komeleyê jî li ser vê zemînê ava bûne. Vê hêmana mîrata heyî, tespîtên malmîsanij jî dipeyîtin. Di vê derbarêda Malmîsanij (2002) van tespîtên xwe wiha destnîşan dike:

Di navbera avakarên Talebe-î Hêvî û rewşenbîrên berî wandatêkilîfêke mamoste-xwendekar ango hosta-şagirt heye. Wekî mînak Hemzeyî Miksî, Şefîk Arwasî û Mehmet Mîhrî li ber destê Seîdê Kurdî; Kurdîzade Ahmet Ramîz jî li ber destê Mehmet Mîhrî tehsîl û perwerde dîtine. Her wisa piştgirîya Xelîl Xeyalî û Abdullah Cevdet jî ya Talebe-î Hêvî Cemîyetî tete zanîn (Malmîsanij, 2002: 35).

Bi van tespîtên Malmîsanij jî dîyar dibe ku pêşengên Cemîyeta Talebe-î Hêvî li ber destê rewşenbîrên berî xwe mezin bûne û bi handan û piştgirîya wan ev sazî ava kirine.

Cemîyeta Talebe-î Hêvî giringî daye yekî û hevgirtîyê. Bi vê mebestê komeleyê di beyannameya xwedawîha dîyar kirîye: “Ji hevcûdabûnê sûd nayê wergirtin. Rêya herî baş û bifeyde hevkarî û hevgirtin e. Miletên nû şîyar bûyî bi komeleyan dest bi kare miletperwerîyê kirine.”

Ji vê beyannameyê jî dîyar e ku komele digel fikra hişmendîbûna welatîyan da ye û giringî dide yekî û hevgirtinê.

Komeleya Talebe-î Hêvî ji ber fikr û giringîpêdayîna perwerdekirina welatîyan projeyên mîna çapkirina pirtûkên perwerdeyê û avakirina dibistanan hwd. dane pêşîya xwe. Bi vê fikrê, pirtûkeke hînkirina zimanê kurdî bi navê *Hînkir* derxistine. Niha jî çapên vê pirtûkê li ber dest hene. Ev pirtûk ji bo belavkirina xwendin û hinkirina zimanê kurdî xwedî cihekî giring e. Her wisa fonksîyoneke din a pirtûkê jî heye ku xwestîye nêzîkedayîna zaravayên kurdî jî nîşan bide. Di naveroka pirtûkêdadigel

hînkirina kurdî, hevparî û nêzîkayîya zaravayên kurmançî û soranî hatîye nîşandan. Di beşa jêrîndaem dê bihûrgulî li ser pirtûka *Hînkere* rawestin.

2.2.2.2.1. Kovara Rojî Kurd û perwerdeya kurdî

Kovara Rojî Kurd wekî weşana Komeleya Talebe-î Hêvî ji alîyê xwendakarên kurd yê li Stenbolê hatîye darxistin. Bi tevahî 4 hejmarê kovarê derketine, piştê ji alîyê hikûmeta wê serdemê ve ji ber sedemên sîyasî û polîtîk destûra wê ya weşandinê nehatîye dayîn. Darbarê dîroka darxistina wê kovarê da Malmîsanij (1986) ji Dr. Kemal Mezher Ehmed wiha neqil dîke: “Xwendakarên Kurd yê li Stenbolê komeleya Hêvî avakirin û di 6 Hezîrana 1913an da jî kovara Rojî Kurd weşandin.”

Kovara Rojî Kurd yekem kovara Kurdî ye ku di naveroka kovarê da gelek mijarên muhîm yê mîna ziman, perwerde, çanda kurd û netew hatine nîqaşkirin. Di derbarê giringî û bandora Rojî Kurd da rewşenbîrê kurd Celîlê Celîl wiha destnîşan dîke; “Derketina kovara Rojî Kurd bandorake berbiçav li rewşa kurdan ya sîyasî, polîtîk û rewşenbîrî bûye” (Celîl, 2001: 11).

Herwisa Celîlê Celî ji Zinar Silopî (Qedrî Cemîlpaşa) wiha neqil dîke; “armanc û hewldana sereke ya kovara Rojî Kurd, pêşxistina çanda kurdan û belavkirina xwendin û nivîsandinê di nava kurdan da ye” (Malmîsanij, 2002: 140). Dikare bête gotin ku endam û nivîskarên kovarê ji pîrsgirêkên civakê haydar bûne û dixwazin van pîrsgirêkan çareser bikin. Yanê fokusa kovarê bêhtir li ser belavkirina perwerdeyê, pêşxistina çanda kurdan û pîrsgirêkên aborî ên di nava civaka kurddaheyî bû. Endam û nivîskarên kovarê bi nivîs û çalakîyên xwe hewl danê van pîrsgirêkan çareser bikin û bi vî rengî hevgirtin û yekîtiya civaka kurd zêde bikin (Celîl, 2001: 90).

Di vê serdemê de di nava rewşenbîr û çalakvanên kurd de mijara perwerde û alavên perwerdeyî yê mîna alfabe, dibistan û hwd. gelek hatine nîqaş kirin. yek ji van nîqaşan ya berbelav têkûzkirina alfabeyeke latînî li gor dengên kurdî. Li ser vê mijarê, di hejmara duyem ya kovara *Rojî Kurd* de Salih Bedirxan li ser giringîya alfabe ûpeşketina xwendinê nivîsekî dinivîse. Di vê derbarê de fikrên xwe wiha destnîşan dîke: “Piştî ku belavkirina xwendin û nivîsinê pêk hat, wekî

ku brêz Abdullah Cevdet jî destnîşan kirî peywîra sereke maijara Dîroka Kurdan e.”¹⁰

Li ser mijara alfabeyê nû Abdulrezaq Bedirxan jî fikrên xwe dîyar dike. Abdulrezaq Bedirxan pêşnîyar dike ku divê ji tîpên kirîlî alfabeyê nû ya kurdî bête dirust kirin(Lazarev, 1999:226). Lewra di vê serdemê de Abdulrezaq Bedirxan li rojhilatê welêt bûye û di nava kurdan de gelek kar û xebatên wî yê perwerdeyî jî çêbûne.

2.2.2.2. Kovara Yekbûn û perwerdeya kurdî

Wekî ku di beşa jorîndajî hatibû destnîşan kirin, felsefeya bingehîn ya Komeleya Hevîyê yekîti û hevgirtina kurdan bû. Îcar bi texmîna me, vê kovarê jî navê xwe ji vê felsefeyê girtîyê û navê wê wekî *Yekbûn* danîne. Wekîte zanîn di zimanê kurdî da wateya “Yekbûn”ê tê wateyayekîti û hevgirtinê.

Di derbarê dîrok û derxistina Kovara *Yekbûnê* da K. Mezher Ehmed wiha desnîşan dike (Malmîsanij, 2002: 58):

Xwendekarên kurd yê li Stenbolê komeleya Hêvî ava kirin. Di sala 1913andakovara Rojî Kurd derxistin. Di wan çaxan de kovareke bi navê *Yekbûn* jî derxistin. Hevjîna CeladetAlî Bedîrxan, Rewşen Bedîrxan gelek nivîsên ku aîdê bavê wê Salih Bedîrxan in û di *Yekbûnê* de hatine weşandin dane min...

Bi vî awayî ev daxûyandina K. Mezher Ehmed hebûna kovarê dipeyitîne lê belê dîroka derketina kovarê li gorî çavkanîyên berdest ne zelal e.

Di derbarê armanca Kovara *Yekbûnê*dajî K. Mezher Ehmed ji nivîsa Salih Bedîrxan ya di kovarêdahatîye weşandin wiha destnîşan dike:

Li gorî mîletê derdorê misqalek kemasîya me tune. Nexwe çima heta niha me rola xwe neleyîstiyê û me hêza xwe ya desthilatî nîşan nedaye. Ji ber ku xwendin û nivîsandina me tune û me nexwendîye. Lewma divê ev kovar bi dil û can bixebitê ku rêjeya xwendin û nivîsandinê di nava kurdan de qet nebe bigihîje ji %40î an ji %50î. Ji bo ku ev yek pêk werê divê em dev ji jîyana rehet û taralîyê berdin (Malmîsanij, 2002: 58).

Bi vê nivîsa Salih Bedîrxan ya di kovarêdahatîye weşandin armanca û hewldana kovarê bi awayekî zelal dîyar dibe. Ew armanca û hewldana kovarê, perwerdeya kurdî û pêşvebirina wê bixwe ye. Herwisa li gorî tespîtên

¹⁰Salih Bedîrxan, Rojî Kurd, istanbul, hej. 2, r. 12-13.

Malmîsanij, kovara Yekbûnê rasterast li ser gihandina ciwanên kurd disekine û behsa çêkirina alfabeye nû û giringîya xebatên zimanê kurdî dike. Sernivîseke di kovarêdahatîye weşandinê ve mijarê wiha destnîşan dike: “Divê alfabeyeke hesan û bikêr bête amadekirin. Divê ciwan di nav sîyaseta rojaneda neteqînîninji bo xizmeta netewî bixwînin û xwe pêş bixin” (Malmîsanij, 2002: 148).

2.2.3. Piştî Şerê Cîhanê yê yekem

Di salê 1920an da sê împeratorîyên mezin ên cîhanê hilweşîyan û di şûna wan da bi dehan netewe-dewlet ava bûn neteweya kurd jî di nav çar dewletan da dabeş bû bêtir ku çî statûyeke wê hebe (Pertev, 2018: 268). Li hemberî ve tunehesibandina navnetewî, rewşenbîr û çalakvanên kurd li gorî derfetên xwe li ber xwe dan. Di çarçoveya van berxwedanan da sazî û komele ava kirin û serhildan û çalakîyên civatê birêxistin. Di ve çarçoveyê de, di sala 1920an da endmên ciwan KTC (Kürt Teali Cemiyetî)yê li Dêrsim û Sêwasê di nav kurdên elewî da serhildan (serhildana Koçgirîyê-1920)dan destpêkirin. Lê piştî demekê serhildan şikestinê dixwe û nahiye armanca xwe.

2.2.3.1. Kovara Hetawî Kurd û perwerdeya kurdî

Berî Şerê Cîhanê yê yekem, kovara Rojî kurd ji aliyê hikumeta wê demê ve tê girtin. Piştî ku şer bi dawî dibe Komeleya Talebe-î Hêvî dixwazê kovara Rojî Kurddîsa derxîne û bigihîne welatîyan. Lê dîsa endîşeyê antengkirinê hikumeta wê serdemê hebû. Loma navê Rojî Kurd bikarneanîn û navê wê yê di zaraveyê soranîdabi kar anîne. Yanê navê kovara Rojî Kurd bi wateya wê ya zaravayê soranî *Hetawî Kurd* bikar tînin. Li gorî ku Zinar Silopî (Qedrî Cemîlpaşa) destnîşan dike, kovara Hetawî Kurd di bin berpirsariya Hemzeyê Miksî da da ye. Lê li gorî ku Malmîsanij dîyar dike: Xweyê îmtîyaz û mudirê berpirsyar Ebdilezîz Baban e (Malmîsanij û Lewendî, 1989:61).

Kovara Hetawî Kurd jî giringîyeke mezin dide ziman û perwerdeya kurdî. Di ve derbarê da di di beyannameya kovarê ya hejmara yekem da wiha tê destnîşan kirin:

Her neteweyekê zimanê xwe heye, ew netewe hem bi zimanê xwe diaxivin hem jî bi wî zimanî dixwînin û dinivîsin. Berê kurdan jî zimanê xwe yê mikemel hebû ku pê dixwend û dinivîsand û wan bi wî zimanê xwe gelek pirtûk hebûn, lê belê piştê ew ziman hêdî hêdî hat jibîrkirin û tenê li herêmên derveyî bajaran hat bikaranîn. Lê belê neteweyek nikare bi nîv-zimên hebûna xwe biparêze. Neteweyeke wisa ne dibe xwedî şiyanewerî ne jî pêşveçûnê; lewre wezîfeya ewil a komeleyê ew e ku zimanê kurdî derbixin asta zimanekî wisa ku bi kêrî xwendin û nivîsînê bê; pirtûkên bi zimanê kurdî çap bikin û wan li seranserê Kurdistanê berbelav bikin da ku kurd hînî zanist û şiyanweriyan bibin (Malmîsanij, 2002: 257-261).

Wate bi vê beyannameya Hetawî kurd, giringîya ziman ji bo hebûna neteweyekî hatîye destnîşan kirin. Herwisa bi parastine zimên ra têkildar giringîya perwerdeyê ji bo pêşvebirina civakê hatîye nîşandan.

2.2.3.2. *Hînker* û perwerdeya kurdî

Ev pirtûka hînkirina zimanê kurdî di sala 1921ê da li Stenbolê ji aliyê endamên Komeleyî Hêvî ve hatîye amadekirin. Yek ji armancên sereke yê Komeleyî Hêvî hînkirina kurdî û belav kirina perwerdeyê bû. Bi vê armancê, materyala sereke ya hînkirina kurdî pirtûka *Hînkerê* çap kirine. *Hînker* bi zimanê Kurdî-Tirkî û bi alfabeya aramî hatîye nivîsîn.

Hînker ji gelek aliyê xwe ve xwedî taybetmendiyên giring e. Yek ji van taybetmendîyan jî ewe ku xwestîye her du zaraveyên kurdî (Kurmançî û Soranî) bide hînkirin û nêzîkayîya her du zaraveyan nîşan bide. Ev yek jî tê wê wateyê ku amadekar an jî nivîskarên *Hînkerê* hevgiirtin û hevparîya zaraveyên kurdî diparêzin. Pirtûka *Hînkerê* ji bo hînkirina ziman bi rê û rêbazên modern rabûye. Endîşeya wê ya sereke ne hînkirina rêzimanê ye. Bêhtir giranî daye peyv dîyalogên karîger û rojane. Her wisa *Hînkerê*, ji bo hînkirina zimên hevokên bingehîn dîyar kirine û perçeyên xwendinê dane. Ev hemû hûrgilî û taybetmendiyên *Hînkerê* rol û giringîya wê ya perwerdeya kurdî nîşanî me dide.

2.2.3.3. Elîfbaya Xelîl Xeyalî û perwerdeya kurdî

Xelîl Xeyalî, ji navçeya Motkan ya parêzgeha Bedlîsê ye. Yek ji çalakvan û rewşenbîrên kurd yê sedsala 20an e. Bi zimanê erebî, tirkî û frensî dizane. Xelîl Xeyalî li ser ziman û alfabeya kurdî xebat kirine. Di sala 1900î da ferhengeke kurdî amade kirîye.

Xelîl Xeyalî digel gelek karên çand û zimannasîyê, di nav çalakîyên sîyasî da cih girtîye û damezrînerîya gelek komele û cemîyetên kurdan yê li Stenbol kirîye. Damzerînerêkî giring yê Cemîyeta Kurd Tealîyê ye û endamdîya Komeleya Talebe-î Hêvî, Cemîyeta Kurd Neşrîatê kirîye.

Nivîsên Xelîl Xeyalî di kovarên mîna Rojî Kurd, Jîn, Hetawî Kurd û Yekbûnê da hatine weşandin. Herweha Xelîl Xeyalî di derbarê zimên da jî du berhemên bi navê *Ferhengê Kurdî* û *Elîfbeya Kurmancî* dane.

Xelîl Xeyalî li ser giringîya perwerdekirin û pêşxistina zimanê kurdî pêdivîyên civaka kurd jî sekinîye. Di nivîsa wî ya bi navê *Ziman da* ya ku di kovara Rojî Kurd da hatî weşandin da fikrên xwe yê di vê derbarê da bi rêzê wiha destnîşan dike (Pertev, 2018: 146):

1. Ji bo Kurdan xundin û nûsandinê herfek,
2. Li ser terzek nû alfabeyek
3. Ji bo zanîna temamê zimanê kurdî “qamûsek”
4. Îlmîhalek
5. Tarîxa bav û kalên kurdan û ‘en’ena wan
6. Welatê kurdan û adet û teb’ê wan û mîqdar û navên eşîrêd wan,
7. Kitêba hesêbê
8. Ji bo zimanê kurdan serf û nehwek
9. Edebîyata kurdan û navê şairên wan¹¹

Ev xalên rêzkerî amaje bi gelek hêmanên giring yê civaka kurd dikin ku di nava wan da perwerdekirin, parastin, pêşxistina; ziman, dîrok û çanda kurdan heye. bi vî awayî heşkere dibe ku Xelîl Xeyalî dest avêtîye meseleyên bingehîn û ji bo van meseleyan li rêyên çareserîyê gerîyaye.

Xelîl Xeyalî serê xwe bi êş û pirsgerêkên kurdan yê civakî ra jî êşandîye. Li ser van êş û pirsgerêkan Malmisaniy, ji gotara wî ya bi sernavê *Ziman û Nezanîya Kurdan* de wiha neql kirîye: “Ma qey ew mirov in em ne mirovin? Belê, em mirov in feqet di derheqê derdê xwe da bêxîret û bêhîmet in” (Malmîsaniy, 1991: 79). Ji vê nivîsa Xelîl Xeyalî dîyar dibe ku ew li hember rewşa civaka xwe xwedî hişmendîye û dixwaze civaka xwe hişyar bike.

¹¹Modanî Xelîl (Xelîl Xeyalî), “*Ziman*”, Rojî Kurd, h. 3, r. 4.

Di derbarê Xelîl Xeyalî da Seîdê Kurdî di berhema xwe ya bi navê *Dîwana Herba Orfî da hûrgilîyên giring* dide. Di vê derbarê da Adil Yıldırımçakar (2018: 96) ji vê berhema Seîdê Kurdî wiha Neqil dike:

Va ye ez mîna keke xîret û hemiyeta netewî pêşkêşî we dikim ku ew jî Xelîl Xeyalî Efendiyê Motkiyî ye ku çawa her şaxê xîret û hemiyetanetewî de li pêş e, di warê şaxa ziman de jî, “pêşengî” bi dest xistiye. Wî alfabe û serf, nehwa ku bingeha zimanê me ne, çêkiriye. Heta ez dikarim bibêjim ku sed sala, hemiyetî/netewîyê û xîretê, fedakarî û hîmaya jar û belengazan, îmtîzac kirine, gihîştine hev, termên wê yê manewî çêkirine. Bi rastî jî, ji ber ku em di kana Kurdistanê de rastî cewherê xîretê yê wiha hatine, hêvîdar im ku dê gelek cewherên wekî wî, pêşeroja/ayendeya me ronî bikin. Vaye ev camêr, nimûneyekî xîret û welatparêziyê ye, hejayî pêgirtin û lipeyçûnê ye, ji bo zimanê me yê millî/netewî yê ku hewceyê kemilîn û pêşxistinê ye, xîm û bingehê daniye. Ez li ehlê hemiyetê û xîretê tembe û salix dikim ku li dû rêça wî biçin û li ser bingeha wî ava bikin.¹²

Ji vê anektoda Seîdê Kurdî ya di derbarê Xelîl Xeyalî da em gelek hûrgilîyên giring yên mîna çalakkûn, dilxwazbûna wî hîn dibin. Herwisa dîyar dibe ku Seîdê Kurdî destxweşî li kar û bizavên Xelîl Xeyalî dike û wî wekî mînak ji kurdan ra pêşkêş dike.

Kadri Yıldırım jî di derbarê Xelîl Xeyalî û perwerdekarîya wî da agahîyên giring destnîşan dike:

Xelîl Xeyalî yê Motkî cem Seîdê Nûrsî ders girtiye û gelek di bin bandora wî de maye. Di dawiya sedsala 19an de li Stenbolê di sala 1909an de yekemîn alfabe ya kurdî ya bi tîpên erebî bi navê Elîfbêyê Kurmancî derxistiye. Gava di sala 1910an de li taxa Çemberlîtaşê yekemîndibistana kurdî ya bi navê Kurd Nimûne Îptîdaisî (Meşrûtiyet) hat avakirin, di vê dibistanê de bi vê elfbayê perwerde hate kirin (Yıldırım, 2006: 80).

Dîsa Xelîl Xeyalî di nivîseke xwe ya di kovara *Hetawî Kurd* da hatî weşandin da derbarê giringîya ziman da wiha destnîşan kirîye:

Dewr zeman we ji me qetand, hûn çûne bajaran, em mane li gundan. Çav we li bajaran vebûn, hûn xwedî mal bûn em feqîr û belengaz man. Gava ku hûn zimanê xelqê bajêr hîn bûn ji gundîtî û ji kurdîtî vegezan xo ji cinsek hesab kir.¹³

Bi vî rengî Xelîl Xeyalî rê û sedemên bişaftina civakê dîyar kirine û giringîya ziman destnîşan kirîye.

¹² Nursî(Kurdî), *Dersên Civakî, Dîwana Herba Urffî*, , r. 178-179.

¹³ Xelîl Xeyalî, *Hetawî Kurd*, h. 2, r. 5.

2.2.4. Di navbera salên 1923-1927an da perwerdaya bi kurdî

Di sala 1923an da bi îradeya kesên netewperwerên tirk parlamento li Enqereyê ava dibe û bi vî awayî êdî Komara Tirkîyê jî avakirina xwe radigihînê. Ev avakirina Komara Tirkîyê êdî rê li ber çalakî û xebatên hemû milletên din digire. Naxasim jî xebat û çalakîyên kurdan. Êdî rewşenbîrên kurd jî xebatên xwe ji dizî ve dikin an jî neçar dimînin koçî dewletên din dikin.

Di sala 1923yan da di nava sînorên Tirkîyê da bi navê “Civata Azadîya Kurd” (Azadî) rêxistineke veşartî hat damezrandin (Bruinessen, 2015:413). Azadî ji aliyê komeke serbaz û rewşenbîrên kurd ên serdema Osmanî ve hatibû damezrandin, lêbelê piştî pêwendî bi gelek kesayetên ayînî rêxistinên kurd ên din ra jî danîbûn (Perteve, 2018: 272). Çalakîya herî bi bandor ya vê rêxistinê serîhildana 1925an bû ku wekû Serîhildana Şex Seîd jî tê nasîn. Karîgerîya vê serîhildanê li ser civaka kurd û rêveberîya Dewleta Tirkîyê gelekî zêde bû. Li gor Olson û Bruinessen her çend aliyekî ayînî yê vê serîhildanê hebe jî, aliyekî wê yê netewî jî hebû (Perteve, 2018: 272). Vê serîhildana Şex Seîd jî şikestin xwar û negiha armanca xwe.

Hem di pêvajoya serîhildanê da hem jî piştî serîhildanê gelek kes mirin û gelek kes jî hatin sirgûn kirin. Dikarê bête gotin ku bi vê serîhildanê ra tevahîya civaka kurd rastî şikestinekî hat. Rewşenbîrên ku ji bidarvekirinê xelas bibûn revîyan welatên din û dest bi kar û xebatên xurttir ên netewperwerîya kurdî kirin. Di vê derbarê da Gorgas(2006)tespîten xwe wiha dest nîşan dike: “Heta hilweşîna Împeratoriya Osmanî jî, di nav rewşenbîrên kurdan da ji bo avakirina nasnameyeke kurdî zêde xebat tune ne. Piştî şikestina serîhildan Şex Seîd bi awayekî xwînî, ev hewldan zêdetir bûne” (Gorgas, 2006:773).

2.2.4.1. Avakirina Komara Tirkîyeyê û bandora wê li ser zimanê û perwerdeya kurdî

Dema fikrên netewî yên rijd di nava Dewleta Osmanî da belav nebibûn çemka Kurdistan û zimanê kurdan bêyî qedexe bi awayekî xweragir dihate hilanîn di bilêvkirina fermî da (Yeğen, 1999: 114). Bi Avakirina Komara Tirkîyeyê (1923) ra êdî kurd wekî gefekê hatin dîtin li ber yekîtiya neteweyî ji bo komara nû (Öpengin, 2011: 98).

Di rewşa Tirkîyeyê da gava mirov lê dinêre, ew li ser bingehên netewe-dewletê ava bûye û ji avabûna xwe pê ve plansazîyeke zimanî ya yek-parêz (monist) daye ber xwe. Di wê çarçoveyê da her hewl daye ku zimanê tirkî li her qadê berbelav bike û di serî da kurdî, hemî zimanên din ên pêkhateyên dewletê paşguh kirine, qedexe kirine û di halê herî xerab da rê li ber mirina wan vekirîye. Lê belê li hember van helwest û kiryarên dewletê kurdan jî bi pêşengîya çêneke xwende plansazîyeke navxweyî pêk anîye bo standartkirin, bikaranîn, berbelavkirin û hînkirina kurdî. Bo wê armancê xebatên weşangerî û rojnamegerîyê pêkanîne, xebatên berhevkirin û tomarkirina berhemên folklorê kirine, xebatên li ser rêziman û hînkirina kurdî bi rêve birine û bo wan çalakîyan jî sazîyên wekî komele û enstîtûyan ava kirine (Kurt, 2020: 9). Wate, di van salên destpêkê yên avakirina Komara Tirkîyeyê da nemaze jî zimanê kurdî û gelek zimanên din ketine ber xetereya jinavçûnê.

Herwisa lêkolîner Ergîn Öpengin jî di vê derbarê da fikrên xwe wiha destnîşan dike: “Dezgehên dewletî ji sala 1924an pê da, armanca dirustkirina neteweyê tirk a yekgirtî dabûn pêşîya xwe” (Öpengin, 2011; Bozarlan, 1991).

Bi vî awayî gelek dezgehên heyî yên mîna medrese, tekya û hwd bi zagonên fermî hatin girtin û qedexekirin. Li ser vê esasê yasaya “Tevhidî Tedrisat (Yekîtiya Perwerdeyê)” derxistin da ku hemûdezgehên perwerdeyê ênheyî bikeve bin banê wezarata perwerdeyê da. Bi vî rengî ji cerga hilweşandina sîstema medreseyan, ku ji sedan salan ve ye kurdî jî yek ji zimanê perwerdayê yedi medraseyan da, kurdî ji her çî dazgeheke perwerdeyê hatîye vederkirin (Öpengin, 2011: 102). Herwisa di vê derbarê da di malika 42yem ya Makezagona Komara Tirkîyeyê da tê dîyarkirin ku di sazîyênperwerdeyê da jî xeynî tirkî nabe tu zimanekî din di perwerdeya hemwelatîyên tirk da wekî zimanê dayîkê were bikaranîn¹⁴. Bi vê rêzika zagonê, bi awayekî fermî rê li pêşîya kurdî tê girtin û kurdî ji hemû îmkanên peşketin û perwerdayê tê dûrxistin.

Ji van hemû nîşaneyan jî dîyar dibe ku nemaze bi avakirina Tirkîyeyê ra bi gelek awayan rê li ber pêşverin û perwerdekirina zimanê kurdî hatîye girtin. Bi vî

¹⁴Akin (2003) ji bo nirxandineke raformên zimanî li Tirkîyeyê ku bi yasayên 2002an hatine pejirandin.

awayî qedera zimanê kurdî ketîye nav rewşeke jinavbirinê. Herwisa kurdologên mîna Hassanpour (1992), Akin (2003) û hwd vê rewş û nêzîkedayîna Dewleta Tirkîyeyê li hemberî zimanê kurdî, wekî *linguicidaango* zarkujî (zimankûjî) tarif dikin.

2.2.4.2. Bedûzeman Seîd Nursî û perwerdeya kurdî

Bedûzeman Seîdê Nursî di sala 1877ê mîladî da li bajarê Bedlîsê, navçeya Hîzanê û gundê Norsê/Nûrsê ji dayik bûye. Bedûzeman wekî “Seîdê Kurdî” jî tête nas kirin û çend nivîsên xwe yên di hinek kovaran da weşandî bi vî nasnavî nivîsandine. Bedûzeman ev nasnavê “Kurdî” bi awayekî hişmendî li xwe kirîye û bi navê xwe jî her şanaz bûye di vê derbarê da lêkolîner Rohat Alakom ji Şevket Sureya Aydemir neqil dike ku Bedûzeman wiha dibêje: “Ez girêdayî heft cemîyetan im. Pêşiyê ez kurd im û girêdayî vî navê pîroz im” (Alakom, 1991: 80).

Bi vî awayî Bedûzeman Seîd Nursî ji nava gelek rastîyên xwe ango cemîyetên xwe kurdîbûna xwe sereke dibîne û wê derdixe pêş.

Bedûzeman Seîd Nursî giringîyê dide zimanê zikmakî û di wê bawerîyê da ye ku ku her millet/netewe bi zimanê xwe yê zikmakî perwerde bibe. Bedûzeman di vê derbarê da fikrên xwe wiha destnîşan dike: “Ji bo berdewamiya pêşeroja/ayendeya her netewî kevneşopiyên milî û zimanê netewî hewce ye”¹⁵.

Bedûzeman Seîd Nursî bi hişmendîya zimanê zikmakî, giringî dide perwerdeyê jî. Li gorî vê fikra xwe ketîye nava hewl û xebatên bingehîn. Ji van hewlê bingehîn ya sereke projeya “Medresetuzehra” ye. Bedûzeman Seîd Nursî xwestîye navend li ber Gola Wanê û li li bajarên wê derdorê jî çend şaxên din bi navê Medresetuzehrayê zanîngehekê ava bike.

Li gora fikra Bedûzeman, ev zanîngeh dê li ser esasê yekîtîya medres û dibistanan ango pevgirêdana modela modern û klasîk be. Bedûzeman Medresetuzehrayê wiha tarîf dike: “Ev Medrese li cem aqîlan dibistaneke herî bilind, li cem dilan medreseyeke ekmel, di hizra bi wijdanan de jî zawîyeyeke herî pîroz e.”¹⁶

¹⁵Seîd Nursî, “*Dîwana Herba Orfî*”, Dersên Civakî, r. 179.

¹⁶Seîd Nursî, “*Munazarat*”, Dersên Civakî, r. 143.

Bi vê beyanatê Bedûzemanjî zelal dibe ku Medresetuzzezhayê pirhêlî ye û xîtabî hemû civakê dike.

Medresetuzzezhra di warê perwerdeya zimanê zikmakî da jî rêyeke giring daye pêşîya xwe. Bedûzeman Seîd Nursî, zimanê Medrestuzzezhayê wekî pirzimanî difikre ku vê hemanê wiha bilêv dike: “Zimanê erebî wacîp, kurdî caîz, tirkî lazim e.”¹⁷

Bedûzeman, Digel rastîyên civakî û sîyasî ev her sê ziman dane pêşîya xwe ku dê di Medrestuzzezhayê da ev her sê ziman wekî zimanê perwerdeya bingehîn bene bikaranîn.

Adil Yıldırımçakar jî di teza xwe ya masterê de di derbarê Medrestuzzezhayê da tespîtên wiha dike:

Medresetuzzezhra çî ji aliyê perwerdeya xwendevanan çî ji aliyê perwerdeya civakê ve be; projeyeke zanistî, modern û xwedî îddia e. Ev proje dixwaze ji paşvemayînê, nezaniyê û nexweşiyên din ên civakê re bibe çare û milletê kurd û alema îslamê bi riya perwerdehiyê ji kêşeyên wan rizgar bike. Li aliyekî din, Medresetuzzezhra; ji aliyê pirzimanîya xwe, mufredata xwe, rêbaza gihandina mamosteyên xwe û finanskirina xwe ve projeyeke cuda ye. Digel van xusûsiyetên xwe û têkoşîna Seîdê Kurdî jî ew hêj neketiye faliyetê û ji aliyê rêvebirên ve dewletê awayekî zelal nehatiye fêmkirin (Yıldırımçakar, 2016: 6).

Bedûzeman Seîd Nursî ji bo bicihkirina projeya Medrestuzzezhayê gelek hewl dane. Ji bo vê fikre hem ji rêvebirên herêmî hem jî çûye Stenbolê bi Siltanê Osmanî ra jî hevdiyarî kirîye û daxwaza piştgiriyê kirîye. Lê mixabin karbidestê dewleta osmanî ew wekî dîn binavkirine û ew avêtine girtîgehê. Van karbidestên dewletê Herweha teklîfa bertîla kesayetî li wî kirine. Lê Bedûzeman Seîd Nursî ev teklif red kirine û piştî demekî vegehiya bajarê Wanê. Piştî gelek hewl û xebatan Bedûzeman dîtîye ku ev projeya wî ya Medreseyê pêk nayê êdî meyla xwe daye kar û xebatên kesayetî.

Herwisa Bedûzeman Seîd Nursî gelek gotar û nivîs nivîsîne û di rojameyan da weşandine. Ji van gotaran ya bi navê “*Kurd Muhtacî Çi ne*” dedi derbarê perwerdeyê û pêdivîya kurdan biperwerdeyê da di gotara xwe da hûrgilîyên giring tespît dike. Di vê gotarê da li ser çareserkirina nexweşî û pêdiviyên kurdan disekine. Lewra Bedûzeman Seîdê Kurdî di nava gelê Kurd da îxtilaf, nezanî û bêperwerdehiyê

¹⁷Nursî(Kurdî), *Munazarat*, Dersên Civakî, r. 141.

dibîne, dixwaze bi perwerdehiyeke dînî û nûjen ve, vê nezaniyê ji nava Kurdan rake (Yıldırımçakar, 2016: 84). Di vê derbarê da Bedûzzeman jî dibêje “Îttihada/yekbûna netewî ye.”¹⁸ wate bi vê tespîta Bedûzeman ewe ku perwerde ji bo kurdan reya xweşî û xelasîyê ye.

2.2.4.3. Avakirina Komeleya Xoybûnê û bandora wê li ser ziman û perwerdeya kurdî

Komeleya Xoybûnê ji aliyê kesên zana û li ser zemîneke berfireh ya civakî hatîye ava kirin. Di nava avakarên wê da rewşenbîr, sîyasetmedar, serokeşîr û karmendên berê yên Dewleta Osmanî û hwd hene. Xoybûn, di sala 1927an da li Beyrûdê ava bûye. Avakirina vê komeleyê di geşedana netewperwerî û rewşenbîriya kurdîdaderîyekî nû vedike. Di vê derbarê da Wadie Jwaideh fikrên xwe wiha destnîşan dike: “Rêxistina kurdan Xoybûn ku di sala 1927an da li Sûrîyeyê ava bibû, wê hem pêşengîya sîyasetê, hem pêşengîya edebîyata kurdî kir. Nemaze rewşenbîrên wekî Sureya, Celadet û Kamiran Alî Bedir-Xanî, di vê tevgerê da wekî kesayetên sereke derketibûn pêş” (Jwaideh, 2007, r. 59).

Şaxê Komeleya Xoybûnê li bajarên mîna Şam, Halep, Hasekê û li dewletên Tirkîyeyê, Iraqê, Londra Parîsê, Datroidê hebûn¹⁹. “Xoybûn di demeke kin da bi çalakîyên firh radîbe, liqên xwe li Kurdistanê û li welatên derva vedike, ew giringîyeke mezin dide belavkirina propeganda û çanda kurdî, loma jî rojnameya Agirî belav dike” (Hebeş, 1996:40).

Avakirina Xoybûnê ji bo netewperwerîya kurdî bûye dastpêkeke nû. Lewra Xoybûnê wekî rêxistin hemû çalakger û pêşengên komeleyên berî xwe di nava xweda hewandine. Bi vî awayî yekgirtî, armancên pîrhêlî û berfirah dane pêşîya xwe. Di nava van armancên komeleyê da serildanên çekdarî jî hebûn ku bi pêşengîya Îhsan Nûrî Paşa li dardora çiyayê Araratê(Agirîyê) bi rêya ‘eşîrên kurd serîhildan çêkirin lê belê piştî demekî têk çûn. Dikare bête gotin ku bi têkçûna vê serîhildanê,

¹⁸Seîdê Kurdî, *Dersên Civakî*, Stenbol, Kurd Teawun We Tereqqî Gazetesî, H,2/29,Teşrîni Sanî,1324/12 Kanûna Ewel 1908, Zehra, r. 363.

¹⁹Abbas Walî (2005) jî raporên îstîhbarî yê dawletên Birîtanya û Fransa neql dike ku Xoybûnê li bajarên Mêrdîn, Dîyarbekir, Ferqîn û Sêrtê dast bi çalakîyan kirîye. li bajarên kurdan yên başûr jî yên mîna Kerkûk, Silêmanî, Zaxo û Rawandizê jî gelek çalakî xebat kirine.

fikra berxwedêr ya kurdîtîyê jî rastî şikesteyekê hat. Bi vê şikesteyê hemû rewşenbîrên kurdan her yek bi dereke cîhanê ve belav bûn an jî bi endîşeyên sîyasî ji nava civakê hatine veder kirin. Di vê derbarê da Husên Hebeş tespîtên wiha dike,

Şoreşgerên Kurdistanê yên di mabêyna şeş salan da rûxandina du raperînên mezin dîtî û ji ber gişkujîya tûraniyan reviyabûn Sûrîyeyê, li Şamê bîr dikirin ku li ser rêya rizgarkirina Kurdistanê berdewam bin. Lê vê carê dest davêjin qeleman, tovên raperîneke rojnamevanî bi derxistina Hawarê di zeviya çanda kurdî da diçînin (Hebeş, 1996: 29).

Yek ji armanceke din ya ku Xoybûnêdaye pêşîya xwe, perwerda ye. Hemû endam û rêvebirên komeleyê di wê bawerî û dixwazê da ne ku hemû kurd, nemaze jî 'eşîr li herêmên xwe yên niştecih bi zimanê xwe yê dayîkê perwerde bibin û bibin xwedî hişmend.

2.2.5. Bandora weşan û xebatên çapemenîyê li ser geşedana ziman û perwerdeya kurdî

Çapemenî li ser kesayet û komên civakê xwedî bandoreke berbiçav e. Bingeha çapemenîyê jî li ser çapxaneyê ye. Di salên 1900î da îcadkirina mekîneyên tîprêzkirinê, bikaranîn û xebitandina teknîka rotatîf, li gora welatan bi tempoyên cihê çapemenî bipêş xistîye. Vê pêşketinê rojnamgerîya hemdem ya îro anîye pê û çapemenîya cîhanê derketîye qonaxa xwe ya herî pêşketî. Ev pêşketinên di qada çapxaneyê da pêk hatî, rojbiroj karê çapemeyê jî hesan kirine. Bi hêsanbûna çapemenîyê ra ev kar û xebatên kovar, rojname û hwd. hêsantir bûne.

Nemaze bi Şerê Cîhanê yê yekem ra rojbiroj çapemenî di nava civatan da berbelav bûye û heta roja me jî ji bo gelek pêdivîyên civakê yên mîna zanîn, têgihîştin, xwegihandin û hwd bûye bersiv.

Geşedanên çapemenîyê ên li Ewropa pêk hatî, bi reformên Tanzîmatê ra li nava Dewleta Osmanî jî belav bûn. Neteweyên di nava Dewleta Osmanî da ev rêya çapemenîyê bi awayekî çalak bi kar anîne. Ji bo xwe gihandin û hişmedîya civaka xwe ev rêya çapemenîyê bikaranîne. Rewşenbîrên kurd jî di qadê da pêngavên giring avêtine.

Ji ber şertên kurdan, her çiqas li gor wan netewên din hinekî dereng be jî rewşenbîrên kurdan jî dest bi derxistina rojname û kovaran kirine. Çapemenîya

Kurdî, ne li welat vejîyaye, her bajar û welatên xerîbîyê hebûna xwe ya destpêkê dewam kirîye. Li sirgûnan vejîyaye û gelek caran welat guhertine, bajar guhertine, çapxane guhertine, berpirsîyar û nivîskar guhertine. Ji ber van sedeman dikare bête gotin ku ev weşan û xebatan kurdan emirkurt bûna an jî ji neçare sekna jîyane û navber ketine berdewamîya wan.



3. KOVARA HAWARÊ Û CIHÊ WÊ DI PERWERDEYA KURDÎ DA

3.1. Atmosfera Sîyasî û Civatî ya Wê Serdemê

Şoreşa Fransî ya di sala 1839an da wekî ku li seranserê cîhanê bandora xwe nîşan dayî, li nava Dewleta Osmanî jî bû xwedî bandor. Bi vê bandorê, di sedsala 19andanemaze li herêma Balkanan serîhildanên netewî çêbûn û gelek netewe ji Dewleta Osmanî veqetîyan. Van pêşhatayên netewî bêgûman bandor li kurdan jî kirîye ku bikevin nava liv û tevgerê. Piştî îlana meşrûtiyeta duyem êdî li nava Dewleta Osmanî atmosfereke azadîyê û derfeta çalakîyên civakî çêbû. Di nava vê atmosfera meşrûtiyetêdarewşenbîr û çalakvanên kurd yê li Stenbolê xwestin bi rêya komele, rojnema û kovaran vînekê çê bikin û rêberîya gel bikin. Herweha xwestin bi çalakî û xebatên hûnerî hişmendîya civaka kurd zindî bihêlin. Ev xwestek û çalakî negihaştin armanca û piştî Şerê Cîhanê yê yekem bi peymanên navnetewî welatê kurdan, di nava çar dewletên netewîdahate parçe kirin (Ergün, 2015: 400). Êdî ziman û çanda kurdî kete bin zext û bişafînên wan dewletên serdest. Ev her çar dewlet jî xwedî netew û polîtîkayên cihê bûn û kurdên di nava sînorên xwedali gor polîtîkayên xwe beralî kirin.

Li hemberî vê rewşa kurdan û ya welatê wan çend serîhildan çêbûn lê belê ev serîhildan jî negiştin armancên xwe û bê encam man. Nexasim jî ev serîhildan bûne sedema zext fişarên zêdetir li ser civaka kurd. Ji ber van zext û fişarên dewletên serdest, rewşenbîr û çalakvanên kurd jî her yek li bajarên Ewrûpa û bajarên Rojhilata Navîn belav bûn.

3.2. Di Derbarê Kovara Hawarê da

3.2.1. Çend sedemên derketina kovara Hawarê

Di salên dawî yê Dewleta Osmanîdadema ku cemîyeta netewperwer Îttîhat Terakkî bi kodetaya “Bab-1 Ali Baskını (Biserdegirtina Bab-i Alî)” bibû xwedî destlihat.

Cemîyet Îttihat Terakki (yekîti û pêşketin), ji aliyê koma Jön Türk (Tirkên Nû)an ve hatîye ava kirin û li ser esasê netewperîya tirkîtiyê bû. Vêca bidawîlêhatina Dewleta Osmanî re, vê îradeya Îttihat Terakkîyê bi fikrên netewperwerîyê dewlata nû ya Tirkîyeyê jî ava kir. Pêşengê vê avakirinê ku wekî Mistefa Kemal tê zanîn êdî di nava çarçoveya netewperwerîya tirkîtiyê da çemka bi navê “Kemalîzmê” derdixîne pêş. Bi avakirina dewleta Tirkîyeyê radi nava çarçoveya Kemalîzmê da firka netewperwerîya tirkîtiyê rijtîr bû. Bi bandora vê rijdbûna tirkîtiyê, kes û civatê ne di vê fikrê dabûn ji welêt hatine vederkirin an jî cezayên bidarvekirinê li ser wan hat birîn.

Ji ber sedemên sîyasî û cezayên bidarvekirinê axlebe rewşenbîr û çalakvanên kurd derbasî binxetê²⁰ bûn. Ji van rewşenbîran, du ji wan Celadet Bedîrxan û birayê wî Kamiran Bedîrxan bûn. Ev her du bira piştî ku ji aliyê desthilata kemalîst cezayê bidarvekirinê li ser wan hatê birîn bi dizî ji Tirkîyê derketin. Pêşî çûn Ewrûpa û dû re vegeerîyan Lubnan û Suriyeyê, li wir bicih bûn (Ergün, 2015: 401).

Li Suriye û Lubnanê, gelek rewşenbîrên kurd gihane hev. Van rewşenbîran, li vir bi pêşengîya endamên malbatên Bedîrxanî, Nehrî û Babanî Komeleya Xoybûnê avakirin. Di nava vê komeleyê da di gel gelek kar û bizavan jî rewşenbîrên kurd yê mîna Celadet Alî Bedîrxan hwd negihane armancên xwe. Piştî vê encamê êdî rewşenbîrên kurdan êdî rêbazên tekoşîna xwe guherandine û dest bi karên çandî, çapemenî û rewşenbîrîyê kirine.

Rewşenbîrên fransî yê wê demê li Suriyeyê jî bandor li rewşenbîrên kurdan kirine ku di warê çandî û perwerdeyî da çalaktir bibin. Di vê derbarê da Malmîsanij ji serpêhatîyên Nûrettîn Zaza wiha neqil kirîye:

Rewşenbîrên fransî yê mîna Roger Lescot, Piere Randot, Thomas Bois, Robert Moutaigne karîgerîyeke mezin hiştîye li ser rewşenbîrên kurd ên li Suriyeyê ku ew xebatên xwe yê çandî û perwerdeyî zêdetir bikin (Malmîsanij, 2009:72).

Van hemû sedeman rê li ber birayên Bedîrxanî û hevalên wî xweş kir ku êdî dest bi derxistina Kovara Hawarê bikin.

Herwisa Firat Cevherî jî di hevpeyvîneke xwe da di derbarê derketina kovara Hawarê da fikrên xwe wiha destnîşan dike: “Bi kurtî, Hawar di şert û

²⁰Nav tixûbên dewleta Sûrî ya îroyîn

mercekî welê de derket ku kurd ji aliyê siyasî û moral ve şikestibûn û di hundirê bêhêvîtiyeke mezin de vedigevizîn. Hawar bi armanca ku bibe hêviya bêhêviyan dest bi weşana xwe kir.”²¹

3.2.2. Bi awayekî giştî hawar û berpirsyarên wê

3.2.2.1. Celadet Alî Bedirxan (berpirsyarê Hawarê)

Celadet Alî Bedirxan (1893-1951), kurê Emîn Elî Bedirxan û nevîyê Mîr Bedirxanê begê Mîrektîya Cizîra Botan e ku ji binemala Ezîzan in. Wekî tê zanîn, bi pêşengîya Mîr Bedirxan di navbera salên 1843-1846an de, kurdan li hember desthilatdarîya Osmanîyan serî hildaye. Piştî têkçûna vê serîhildanê hemû endamên malbatê mişextî Stenbolê bûne ji wir jî ji aliyê siltanên Osmanî ve li seranserê Dewleta Osmanî hatine belav kirin.

Celadet Alî Bedirxan, li Zanîngeha Stenbolê beşa hiqûqê xwendîye. Herweha perwerdeya rojnamevanîyê jî wergirtîye û di rojnameyên mîna *Îctihad*, *Türkçe İstanbul*, *Serbestî da* nivîsên wî weşîyane.

Di dawîya salên Dewleta Osmanî da Celadet Alî Bedirxan mişextî Ewropa bûye. Di derbarê vê koçberîya da keça wî Sînemxan Bedirxan wiha destnîşan dike:

Di sala 1922an de ligel hinek rewşenbîr û siyasetmedarên wê demê, Mîr Celadet û birayên xwe revîne Almanyayê. Gava serhildana Şêx Seîd di sala 1925an de dest pêkir, çû tevli serhildanê bû. Piştî şikestina serhildanê ew careke din vegebiya Almanyayê û xwendina xwe, di beşê hiqûqê de bire serî. Wî dixwest hê li Almanyayê bimîne û nameya doktora binivîse. Lê bavê wî Mîr Emîn Alî Bedirxan li Misrê nexweş ketibû û ew ji ber vê yekê vegebiya Misrê, hate cem bavê xwe.²²

Ji vê anektoda Sînemxan Bedirxan jî dîyar dibe ku Celadet xwestîye di nava çalakîyên sîyasî û civakî bibe xwedî rol an jî bandorê li van çalakîyan bike.

Piştî têkçûyîna Dewleta Osmanî, di bin desthilatdarîya nû de, di derheq Emîn Alî Bedirxan û her sê lawên wî da fermana dardakirinê derket. Emîn Alî Bedirxan û kurê wî Sureya Bedirxan çûn li Misrê bi cîh bûn. Kamiran û Celadet jî çûn Almaniya, dest bi xwendina bilind kirin. Celadet li wir zanîngeh xilas kir û dîploma doktorîya

²¹<http://www.bued.boun.edu.tr/turik.asp?id=78>

²²Sînemxan Bedirxan, https://ku.wikipedia.org/wiki/Celadet_Al%C3%AE_Bedirxan, (Dîroka xwegihatinê: 19.11.2022)

hiqûqê wergirt. Piştî vêya di 25.8.1930an da vegeerîya hat Şamê. Wê gavê Şam di bin destê Fransîyan da bû. Li wir dest bi xebata sîyasî kir. Di nav xebata Xoybûnê da cîh girt. Di dema Serhildana Agirî de, di nav Xoybûnê da roleke aktîf girt. Serhildan têk çû ew carekê din vegeerîya Şamê. Li wir, Mîr Celadet Bedirxan dest bi xebata edebî û rojnamegêrîyê kir û heta dawîya jîyana xwe vê xebatê domand. Di 15.07.1951an da li gundê Hêcanê (nêzikî Şamê) çû ber rehma Xwedê.²³

Celadet Alî Bedirxan li ser mîrateya malbata xwe ya tekoşerî berdewam kir û temamê jîyana wî bi çalakî û tekoşînê çandî û sîyasî ra derbas bû. Herweha ji bo zimanê kurdî jî gelek rêçên giring vekrin û di vî warî da gelek xebat pêşkêşî civata kurd kirin.

Herweha Celadet Alî Bedirxan ji xeynî berpirsariya kovara Hawarê gelek berhem destnîşan kirine. Berhemên wî yên berdest wiha ne:

- 1- *Rêzimana Kurdî*
- 2- *Ferhenga Kurdî bi Hemû Lehçên Navxwe*
- 3- *Rêzana Elfabeya Kurdî Elifba Kurdî*
- 4- *Elifba Kurdî*
- 5- *Rûpelnine Elfabê*
- 6- *Dibaca Mewlûda "Biyîşa Pêxember"*
- 7- *Dibaca Nimêjên Êzîdîyan*
- 8- *Mektup ji Mistefa Kemal Paşe ra*
- 9- *Ji Mesela Kurdistanê*
- 10- *Edirne Sükûtumun İçyüzü (Ruyê Esas ye Rûxandina Edirne)*

Digel van berhemên Celadet Alî Bedirxan yê giring, bêguman berhema wî ya sereke û gencîne kovara Hawarê ye.

3.2.2.2. Kamiran Alî Bedirxan

Kamiran Alî Bedirxan, parêzger û rojnamenivîsekî naskirî ji endamên malbata Bedirxanîyan bû. Kamiran Alî Bedirxan birayê Celadet û Sureyya Bedirxan bû. Di 21ê Tebaxa 1895an da li Stenbolê hatîye dinyayê. Kamiran Bedirxan jî wek birayê xwe Mîr Celadet û yên din dema zoraktî û xortaniya xwe da bi alîkarîya mamostayên

²³Kovara Ronahî, Tîrmeh- 1985, h. 5, r. 6.

taybet, perwerdeyek gelek baş dît. Xêncî zimanê Erebî û Farisî, zimanê Almanî û Fransizî jî baş dizani bû (Bedirxan K, 1986:1).

Kamiran Alî Bedirxan, zanîngeha Stenbolê beşa hiqûqê qedandîye. Sala 1926an ji bo doktoraya hiqûqê çû Almanyayê. Li Almanyayê doktoraya xwe ya hiqûqê xilas kirîye. Paşê li Bêyrûtê bi cîh bû û li wir parêzerî kir. Ji bilî ku gelek nivîs û wergerên wî di kovara Hawarê da hatine weşandin, wî di sala 1943an da li Bêyrûtê rojnameyên Roja Nû û Stêr jî derxistin.²⁴

Kamiran Alî Bedirxan jî wekî wan endamên din yê malbata Bedirxanîyan, perwerdeyeke têr û tije wergirtîye. Nemaze bavê wî Emîn Alî Bedirxan zarokên xwe bi awayekî têgihîştî mezinkirine. Kamiran û Celadet jî bi vê têgihîştina bavê xwe mezin bûne û gelek kar û xebatên rewşenbîrî bicîh anîne. Bêgûman yek ji van karên her du birayan bihevre pêk anî jî kovara Hawarê ye. Di derxistina Hawarê da her çiqas Celadet Alî Bedirxan rola sereke lîstibe jî em dibînin Kamiran Alî Bedirxan jî bi nivîsên xwe yê dewlemend barê Hawarê hilgirtîye.

Digel nivîsên kovara Hawarê Kamiran Bedirxan gelek berhem jî nivîsîne. Berhemên Kamiran Bedirxan yê li ber dest wiha ne (Çetin, 2016: 56-57).

- *Elfabeya Kurdî Elfabeya Min*
- *Rêzana Zimanê Kurdî*
- *Ferhenga Kurdî*
- *Zimanê Mader (Dê)*
- *Destpêka Xwendinê*
- *Parçeyên Bijarte*
- *Xwendina Kurdî*
- *Tefsîra Qur'anê*
- *Dersên Şerîetê*
- *Çarînên Xeyam*
- *Proverbes Kurd* (Gotinên Pêşîyan, bi Lucy Paule Margerîta re), Parîs,
- *1937. Helbestên Kurdî*
- *Der Adler Von Kurdistan* (Eyloyê Kurdistanê, Bi Herbert Ortel re),
- *Berlin, 1937. Berfa Ronahîyê*

²⁴K. Alî Bedirxan, *Ronahî*, 1986, hej.6, r.1.

- *Helbestên Kurdî bi Fransîzî*
- *Gramera Kurdî bi îzahkirina Tirkî*, (Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer), 1959.
- *Langue Kurde*, Paris, 1953.
- *Rêzimana Zimanê Kurdî*, Paris, 1971.
- *Zimanê Kurdî / Kürt Dili*, Istanbul (bi Şivan, S.)
- *Kolay Kürtçe - Pirtûka ders, Weşanên Doz* (Ji Frensîzî, Yakup Kardemir)
- *Xwendina Kurdî*, Pirtûkxana Hawarê, Hejmar 10, Çapxana Tereqî, Şam, 1938.
- *Dersên Şerîetê*, Pirtûkxana Hawarê, Hejmar 12, Çapxana Tereqî Şam, 1938

3.2.2.3. Hawar û destpêkirina wê

15ê gulana 1932an bi pêşengîya Celadet Alî Bedîrxan kovara Hawarê dest bi weşana xwe kir. Ev destpêk dibe rêyeke nû ji bo tekoşîna Celadet Elî Bedîrxan û hevalên wî. Herwisa bi vê destpêkê, ziman û çanda kurdî ya ji avakirina Komara Tirkîyê (1923) pê ve bê serûşûn mayî êdî dibe xwedî semîyanekî û ji nûve vedije. Pêşengê vê vejînê jî bêguman Celadet Elî Bedîrxan bixwe ye.

Wekî ku Konê Reş di gotareke xwe da neqil kirî: Celadet Alî Bedîrxan, hêvîyên bav û bapîrê xwe li erdê nehiştin, bi xwe ra hilgirtin û hilanîn û di ber wan da xebitî ta roja dawîn ji temenê xwe. Wî jî, di roja 15.5.1932an da hejmara pêşî ji kovara xwe (Hawar)ê bi tîpên latînî, li Şamê çap kir û di nav Kurd û bîyanîyan da belav kir. Bi Hawara xwe, qêrîn û gazîya bav û bapîrê xwe gihand Kurdan û got²⁵:

Heçî em Kurd, me zimanekî delal heye û em pê diaxifin, piraniya me ji vî zimanî pê ve bi tu zimanî nizanin.. Bi tenê divêt em hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibin. Îro hînbûna xwendin û nivîsandina zimanê mader ji bo her miletekî, êdî ne bi tenê wezîfeke şexsî ye, lê wezîfeke milî ye jî. Heçî bi vê wezîfê ranebûne, wezîfa xwe ya milî pêk neanîne û bi kêrî miletê xwe ne hatine. Ji bona ko mirov bikare xwe ji miletekî bi hesibîne, divêt ko bi kêrî wî bê...

Kovara Hawarê ya ku di sala 1932andadest bi weşanê kirî, heta sala 1943an domandîye û bi tevahî 57 hejmarên kovarê derketine. Kovar bi awayekî peryodî 15 rojan carekî derdiket lê belê car caran ji ber gelek sedemên cihê navberên dirêj ketine nava hejmarên kovarê. Di zimanê kurdî da Hawar wateyên xwe yê "gazîkirin", "qîr

²⁵<https://www.welateme.net/kurdi/modules.php?name=News&file=article&sid=5746>

kirin” an jî “daxwaza alîkarîyê” hene. Di van wateyandajî hinekî felsefeya kovara Hawarê dîyar dibe ku mirov dikare bibêje CeladetAlî Bedîrxan bi rêya kovara Hawarê, ji bo xwedî lê derketina mîrasiya kurdî dixwazehawar û qêrîna xwe bigihîne civaka kurd an jî di vê biwarê da daxwaza alîkarîya rewşeke lezgîn dike. Bi vî awayî xuya dibe ku navê kovarê jî li gorî rewşa kurdan û zimanê wan tercîheke xwedî wate ye. Herweha Qedrîcan jî di hejmara yekem ya kovarê daamaje bi wateya navê kovarê dike û di nameyeke ji bo Osman Sebrî da dibêje: “Hawar hebe, gazî li dû ye”. Bi vî awayî xûya dibe ku nivîskarên Hawarê jî di hişmendîya wateya navê kovarê da ne û lê xwedî derdikevin.

Kovara Hawarê ji hejmara xwe ya yekem ve bi zimanê kurdî²⁶ û bi alfabeya latînî derkete pêşîya xwînerên xwe. Heta hejmara 23an jî nivîsên bi alfabeya aramî hatî nivîsîn jî hebû lê êdî ji hejmara 24an pêve xwerû alfabeya latînî hatîye bi kar anîn. Alfabeya latînî ji bo kurdan tişteke nû bû ku CeladetAlî Bedîrxan hemû xebat û amadehîyên xwe yê di derbarê vê alfabe yê da kirî, bi kovara Hawarê kirin pratîkê.

3.2.3. Armanc û giringîya Hawarê

Kovara Hawarê bingeha xwe li ser zanîn, ziman, çand û edebîyatê ava kirîye. Ji xeynî van mijaran gelek caran nivîsên rojanê(aktûel) û civakî jî cihê xwe têde girtine.

Digel hêmana kovarê ya aktuelî, di hejmara yekem ya Hawarê da armanc û awayê xebatê yê Hawarê wiha hatinê rêzkirin:

- 1- Belavkirina alfabeya kurdî di nav kurdan de hînkirina wê. Senifandina zimanazina kurdî û di hin komela de bela kirin û pêşdetir di şiklê kitêbê de derxistin.
- 2- Sehîtiya zarên kurdî û berhevanîna wan. Sehîti ser mirovatîya zimanê kurdî digel zimanên di ên arî. Sehîti ser bingehen zimanê kurdî, ser dîrok û awayê rabûn û pêşveqetîna wî.
- 3- Berhevkirina çîrok, çîrçîrok û her teqlîd laje û stranên kurdî û birêve belavkirina wan.
- 4- Senifandin û belavkirina dîwanên kurdî. Bi wan ve jînenîgarîya şair û mirovên bijarte jî dê bîna belav kirin.
- 5- Sehîti ser reqs û keydeyên stranên kurdî
- 6- Sehîti li ser texlît rêzîkên kurdî û kurdistanê yê zimanê borî û yê îro û senifandina wan

²⁶Di hejmarên destpêkê ên kovarê de qismek kême be jî nivîsên frensî (2-4 rûpel) û erebî jî hebûn. Lewra wê demê Sûrî di bin kontrola frensîyan da bû û vê desthilatîyê jî ev yek wekî merc dabû pêşîya weşangerîya Hawarê ku divê ji xeynî kurdî nivîsên frensî an jî erebî di kovarê da hebin da ku bertek li hemberî kovarê çênebin.

7- Dîrok û erdnîgarî: Sehîtî ser tevahî dîrok û erdnîgarîya welatê kurdistanê û ser dîroka eşîran, berî- paşî di wextê Mîr Şeref de.

Wate ji van armancên Hawarê jî dîyar dibe ku armanca sereke ya kovarê hînkirin û belavkirina zimanê kurdî ye ku di benda yekem da ev yek bi zelalî hatîye destnîşan kirin. Herweha ji bendên din yê armancên kovarê dîyar e ku dê li ser folklor, wêje, dîroka kurdan bête sekinîni û di vê derbarê da lêkolîn dê bîn destnîşan kirin.

3.2.4. Weşangerî û nivîskarên Hawarê

Di hejmarên Hawarê ên ewilî da axlebe nivîsên berpirsîyarê kovarê CeladetAlî Bedirxan û birayê wî Dr. Kamiran Bedirxan cih digrin. Ji hejmara 4an pêve gelek rewşenbîr û nivîskarên kurd yê ku îro jî bandora wan li ser nivîskarîya zimanê kurdî heye, bi nivîsên xwe cîhê xwe di kovarê da girtine.

Bi awayekî giştî nivîskarên ku nivîsên wan di kovarê da berbiçav in wiha ne: CeladetAlîBedirxan, Dr. Kamiran Bedirxan, Rewşen Bedirxan, Cegerxwîn, Qedrî Cemîl Paşa, Dr. Nûredîn Zaza, Osman Sebrî, Qedrîcan, MistefaAlîBotî, Ehmed Namî, Hesên Hîşyar, Lawê Fendî, Reşîdê Kurd, Cemilê Haco, Sibhîyê Dîyarbekirî, Tewfîq Wehbî, Evdîlxaliq Esîrî, Şakir Fetah, Fayiqê Bêkes, Goran, Lawikê Kurd, Pîrot û gelek nivîskarên din di kovara Hawarê da nivîsîne. Herweha di beşa frensî ya Hawarê da hinek kurdnasên mîna Pr. G. Michaelian û R. Lescot jî nivîs nivîsîne.

Herweha Celadet Alî Bedirxan di nava vê tradîsyonê da bi xebat û hewldanên xwe ziman, edebîyat û çanda kurdî avdanî kirîyê û ew ji çîlmisînê xelas kirine. Nivîskarekî din yê vê qonaxê Cegerxwîn jî bi helbestên xwe, bi taybetî di nava medreseyan da bû xwedî cihekî girîng ku piştî jî wekî “helbestvanê netewî” cîhê xwe di dîroka kurdan da girt. Qedrîcan û Nûreddîn Êsiv jî bi çîrokên xwe yê honakî derketin pêş. Osman Sebrî jî car caran bi nivîsên xwe yê dîrokî, gelek caran jî bi xebatên xwe yê folklorîk di nava nivîskaran da derkete pêş. Di nava van nivîskaran da Rewşen Bedirxan wekî jinekî xwedî cihekî girîng e ku nivîsa wê ya di hejmara 27an bi navê *Nanpêj û Mamoste* rengê berbiçav daye rûpelên Hawarê. Rewşen Bedirxan digel nivîskarîya xwe di mijara mafê jinê da jî xwedî hişmed û çalak bû. Rewşen Bedirxan, herweha li ser navê jinên kurd beşdarî gelek civîn û çalakîyên navnetewî bûye.

Di kovarê da nivîsên herî zêde yên CeladetAlî Bedîrxan in ku bi gelek nasnavên mîna; Herekol Ezîzan, Hawar, Nêrevan, Xeberguhêz, Xwedîyê Hawarê, Seydayê Gerok, Bişarê Segman, Bavê Cemşîd û hwd bi gelek nasnavên din jî CeladetAlî Bedîrxan nivîsên xwe di kovara Hawarê da weşandine.

Herweha di derbarê nivîskarên di Hawarê da Nûreddîn Zaza, anektodeke wiha destnîşan dike:

... bi piştgirîya Celadet Alî Bedîrxan gelek kesê mîna Dr. Kamiran Bedîrxan, Osman Sebrî, Qedrîcan û yd. Bi kurdîyeke tekuz rûpelên Hawarê bi helbest, çîrok û agahîyên dîrokî xemilandin. Di nava van nivîskaran de kesayetên mîna Cegerxwîn û Goran jî hebûn digel van kesayetên kesê wekî axayên gund, şivan, karker, cotkar û xwendekarên medreseyê jî hebûn.

Ji vê anektoda Nûreddîn Zaza jî dîyar dibe ku Hawarê xwe gihandîye hemû qismên civakê û xûya dibe ku gelek ji wan bûne nivîskarê Hawarê yên dildar.

Ji alîyê zaraveyî ve jî di Hawarê da axlebe nivîsên kurmancî cih digirin lê belê car caran nivîsên soranî û kirmançkî jî hatine weşandin. Nivîskarên ku nivîsên wan bi zaraveyê Soranî bûn wiha ne: Goran, Tevfîk Wehbi, Abdullah Esîrî, Şakir Fettah, Hevindê Sorî, Lawikê Kurd û hwd Ji bo ku zaraveyê soranî bêhtir di kovarê da cih bigire Celadet Elî Bedîrxan, di gelek nivîsên xwe da bang li ciwanê başûr kirîye ku nivîsan ji Hawarê ra bişînin.

Hawar heta hejmara 38an bi giştî 16 rûpel bûye. Formata kovarê jî 21x29 cm. bûye. Hejmarên din jî di navbera 8 û 16 rûpelan hatine weşandin. 23 hejmarên pêşîn li çapxaneyê Teraqî hatine çapkirin. Piştî, li ser hejmara 24an navekî din, navê Çapxaneyê Mihdik-El-Mibkî xûya dibe. Hejmarên 25an û 26an dîsa ji Teraqîyê derdiçin, lê piştî ji hejmara 27an heta hejmara 52an navê çapxaneyêke din dîyar dibe li ser berga Hawarê; Çapxaneyê Sebatê. Hejmarên mayî dîsa li çapxaneyê Teraqî çap dibin (Onen, 2018: 110).

Li ser berga yekem ya Hawarê li jor sernavê kovarê nivîsîne, li binê wê: Komela Kurdî, bi fransî Revue Kurde danîne, li alîyê çepê: Sal, 1, yekşemb, li alîyê rastê: Hejmar, 1, 15ê gulan 1932, li navendê: Têdexistîyên Komelê û beşa firensî hene. Li alîyê jêr: Çapxana Teraqî 1932 Şam. Wilo dîyar dibe ku peyva Komela Kurdî bi wateya kovara kurdî hatîye bikaranîn. Ji hejmara 4an pê ve êdî ew peyv nayê bikar anîn. Li şûna wê “Kovara Kurdî” tete nivîsandin.

3.2.5. Tradîsyona kovara Hawarê

Kovara Hawarê bi derketina xwe ra tradîsyonek ava kirîye û rojbiroj xurt bûye. Bi vê tradîsyonê ra di edebîyat û rewşenbîrîya kurdî deqonaxeke bi navê “Qonaxa Hawarê” ava bû. Ev nivîskarên di nava vê qonaxê da bi demê ra di nava civaka kurd da deng vedan. Ji van nivîskaran yê herî giring û berbiçav bêguman Celadet Alî Bedîrxan e ku wekî dahênerê alfabeya kurdî-latînî cihê xwe girtîye.

Çapbûna Kovara Hawarê rê li ber xebatên kurdî jî vekirîye ku wê demê çapkirina pirtûkên kurdî gelekî lawaz bû. Di vê derbarê da lêkolîner Husên Hebeş jî amaje bi “Kitabxaneyê Hawarê” kirîye û fikrên xwe wiha destnîşan kirîye:

Bê guman Kitabxaneyê Hawarê bayexdar e di dîroka çanda kurdî de, nemaze di wê demê de ku hejmara çapemenîya kurdî ewna kêmtir bû û ya kurmancîya jorîn hîn kêmtir bû. Mixabin ew berhemina niha pir bi dijwarî dest dikevin, yan jî her ne mane; pir kêmtir navnîşanên wan di jêderran de tên xwendin, û tu kitêp ji wan heya niha min nedîtine vejandina van erkeke niştimanî ye (Hebeş, 1996: 34).

Bi van tespîtên Husên Hebeş dîyar dibe ku kitêpxaneyê Hawarê xwedî cihêkî giring e û gelek ji van berhemên vê kitabxaneyê li ber desta tune ne ango winda ne.

Herwisa tradîsyona kovara Hawarê ji gelek alîyan ve wekî navendan jî qonax hatîye hesabandin. Dîlawer Zeraq jî di derbarê destpêkirin û qonaxa Hawarê da tespîtên wiha destnîşan dike:

Kovara Hawarê, ku piştî têkşikîna du şerên li ser maf û bidestxistina serbixwetîya neteweyî hatine kirin, derçûye. Û Hawar, bi derçûna xwe ve jî di biwarên çand, ziman û wêjeya kurdîya kurmancî ya modern û di warê hişberîya neteweyî ya di biwara wêjeyî da bûye qonaxeke dîyarker ku em ê ji niha û pê da wê dem û deraxê wekî qonaxa xwebûnîyê' bi lev û dîyar bikin.²⁷

3.3. Di Hawarê da nasnameya netewî

Digel gelek sembalên nasnameyî di Hawarê da, Ala Kurdan jî tê şayesandin û weşandin. Ala Kurdan ya ku ji aliyê Komeleya Xoybûnê ve hatibû çêkirin, li ser berga hejmara 11an ya Hawarê da hatîye weşandin. Ev al ku di nava xwe da şiklê rojê û rengê keşk, sor û zer di nava xwe da dihewîne; nîşane bi dîrok û çanda kurdî ya netewî dike. Şiklê rojê nîşane bi bawerîyên kurdan yê berê dike, 21 tîrêjên rojê jî

²⁷<https://www.kurdarastirmalari.com/yazi-detay-qonaxa-xweb-n-y-kovara-hawar-47> (Dîroka xwegihaştinê: 20.10.2022)

nîşane bi 21 Adarê yanî cejna newrozê dike. Celadet Alî Bedîrxan di Hawarê da hem danasîna Ala Kurdan kirîye hem jî helbestek bi navê “Alê Kurdan” nivîsîye. Herwisa Kamiran Alî Bedîrxan jî li ser Ala kurdan helbestek bi navê “Ala Kurdan” nivîsîye.

Mijara nasnameya kurdî ya dîrokî di Hawarê da pêşengtîya wê ji alîyê her du birayên Bedirxanî ve hatîye kirin. bi pêşengtîya her du birayên Bedîrxanî ev mijar ji alîyê gelek nivîskarê Hawarê ve hatîye nivîsîn. Li ser vê mijarê Ramazan Pertev jî wiha destnîşan kirîye; “Loma wan gelek hewil da ku berê rewşenbîrên kurd bidin vê sehayê. Emîn Zekî Beg, li ser Cejna Newrozê nivîsîye. Namî, di helbestên xwe da gelek caran simbolên wekî *Newroz*, *Zend Avesta*, *Zerdeşt*, *Kawe*, *Mem* bi kar anîne (Pertev, 2020: 65). Herweha helbesta Namî ya bi navê “*Neşîd û Gaziya Keçan*” piştî ji alîyê gelek rêxistinên kurdan ve wekî sirûd hatîye bikaranîn (Nami, 1986, r. 9-10). Seydayê Keleş jî di helbestên xwe da simbolên wekî “*Kawe*” û “*Newroz*”ê bi kar anîne (Keleş, 1986, r. 10-11). Seydayê Tîrêj, yek ji van nimûneyan e ku di helbestên xwe da gelek caran amaje bi “*Newroz*, *Zerdeşt*, *Rustemê Zal*, *Kawe*, *Aryan*” kirîye (Tîrêj, 2014, r. 82-83, 99, 105-107, 440 û hwd). Wate, nivîskarên hawarê bi rêya hêmanên ziman, dîrok, folklor û hwd. xwestine civaka kurd di rêya hişmendîya netewî da hişyar bikin.

Bi vê romantîzma neteweyî ra, di şûna gelek qehremanên Rojavayî da, qehremanên wekî Rustemê Zal, Memê Alan û Zembîlfiroş, qehremanên kurdî ji nû ve hatine vejandin (Pertev, 2020: 67). Bi vî awayî xûya dibe ku gelek nivîskarên Hawarê di nivîsên xwe da amaje bi leheng û motîfên dîrokî yê kirdan kirine. Ev motîf jî rasterast nîşane bi nasnameya kurdî ya netewî dikin ku van nivîskaran ev motîf wekî nasnameya hevpar dane pêş da ku kurd xwe nas bikin.

3.4. Di Hawarê da ziman û hînkirina zimên

Di hejmara yekem ya kovarê da ji alîyê berpirsyarê kovarê, Celadet Alî Bedîrxan ve di derbarê qada xebata kovarê da beyannameyek hatîye weşandin. Ligorî vê beyannameya Hawarê dê kovar ji xeynî sîyasetê²⁸, qadeke berfireh ya ku

²⁸Lewra wekî ku di beyannameya kovarê da jî hatîye dîyar kirin, “*Hawarê siyaset ji civatên welatî ra hiştîye*”.

“*kurdîtî pê bendewar*”²⁹ daye pêşîya xwe. Di nava vê qadê da wêje, dîrok, folklor, çand û hwd hene. Digel van mijarên bingehîn, di Hawarê da mijara ziman û perwerdeyê jî xwedî cihekî giring e. Di derbarê giringîpêdayîna zimên ya kadroyên Hawarê de Ronayî Onen(2018) wiha destnîşan kirîye:


Kadroyên rêvebir yê Hawarê bi taybetî jî Celadet Ali Bedirxan ziman tenê weke nîşaneyê netewebûnê nedidît, wan ziman hem wek temsîla Netewebûnê didît hem jî wek alaveke wisa ku netewe pê dikeve nava civata neteweyan. Wisa dîyar e ku redkirina tîpên erebî û bikaranîna guhertoyeke alfabeya latînî, anku danasîna pergaleke nû ya nivîsandinê bi tîpên latînî encama wan fikarên kadroyên Hawarê bû.

Ev mijara zimên di Hawarê da digel gelek hêmanên xwe yê hînkirin, rêziman, ferheng û hwd. giringî hatîye pêdayîn û di vê derbarê da gelek xebat û lekolîn hatine weşandin.

3.4.1. Paşxaneya dîrokî: Danasîna pirtûkên înkirina zimanê kurdî

Di derbarê karîgerîya perwerdeya kurdî û dîroka wê da gelek dane li ber destan tune bin jî, ji hinek berhem û xebata dîyare ku perwerdeya kurdî xwedî rabirdûyeke dûr û dirêj e. Hinek ji van berhemên destpêkê yê ku em bi kurtasî behs bikin wiha ne:

²⁹Hawar, h. 1, r. 1



Resim 1.1: Berga Pirtûka Serfa Kurmancî ya bi navê Tesrîfa Teremaxî (Çapa Weş. Nûbiharê)

Li gorî çavkanîyên berdest³⁰ berhema yekem ya perwerdeya kurdî *Serfa Kurmancî* ya Elîyê Teremaxî ye. Elîyê termaxî ev berhema xwe ji bo hînkirina erebî amade kirîye. Rêzimana erebî bi rêzimana bi kurmancî û farsî ra hatîye hevrûkirin. Bi vê hevrûkirinê hêmanên bingehîn yên rêzimana kurmancîyê hatine ravekirin. Loma ev berhem wekî yekem berhema hînkirin an jî perwerdekirina zimanê kurdî tête zanîn. Fîlozof û Akademîsyenê Holendî Michael Leezenberg di gotara xwe ya bi navê *Elîyê Teremaxî and the Vernacularization of Medrese Learning in Kurdistan. Kurdish Studies; Empire, ethnicity and identity* da amaje bi yekembûna vê pirtûkê ya perwerdeya kurdî kirîye. Herweha Leezenberg di vê gotara xwe da destnîşan kirîye ku zimanê kurdî pêşî li medreseyên kurdan di sedsala 17an da bi *Serfa Kurmancî* ya Elîyê Teremaxî bûye zimanê perwerdeyê. Bi vî awayî em jî xwe dispêrin vê gotara

³⁰M. Leezenberg, *Elîyê Teremaxî and the Vernacularization of Medrese Learning in Kurdistan. Kurdish Studies; Empire, ethnicity and identity*, 2005, (Edit: Djene Rhys Bajalan and Sara Zandi Karimi). New York: Routledge.

Leezenberg û berhema Elîyê Teremaxî wekî yekem berhema perwerdeya kurdî destnîşan dikin. Herwisa M. Leezenberg dîsa di gotareke xwe de derbarê serfa kurmancî de wiha destnîşan dike; Serfa Kurmancî ya Elîyê Teremaxî hêj jî qîmetê wê nehatîye fehm kirin. Lewra ev berhema kevintirîne ku behsa ravekirina kurmancîyê dike³¹.

Pirtûka *Serfa Kurmancî* çend caran hatîye çapkirin. Yek ji van çapa çapa Nûbiharê ye ku Weşanxaneyê Nûbiharê ev berhem di sala 2018an da bi navê *Tesrîfa Teremaxî* çap kirîye.



Resim 1.2: Rûpelên yekem yên destnivîsek *Nûbihara Biçûkan* li British Library, Or. 5932, folio 9 recto³²

Pirtukeke di ya perwerdeya kurdî *Nûbihara Biçûkan* e. Ev Pirtûk ji alîyê di sala 1683an da ji alîyê Ehmedê Xanî (1650-1707) ve ji bo dersdayîna medreseyan hatîye nivîsîn. *Nûbihara Biçûkan* ji alîyê naveroka xwe ve ferhenga erebî-kurdî ye, ji alîyê

³¹Michiel Leezenberg, *Elî Teremaxî and the Vernacularization of Medrese Learning in Kurdistan* Michiel Leezenberg, Iranian Studies, Vol. 47, No. 5, Special Issue: The Kurds and their History: New Perspectives, 2015, pp. 713-733

³²https://ku.wikipedia.org/wiki/N%C3%BBbihara_bi%C3%A7%C3%BBkan


şêwezariya xwe ve jî manzûm e. Li gor hinek nivîskaran navê vê berhemê yê rastî “Nobar” yan jî “Nûbar” e û wateya wê “fêkiya nû” ye (Yıldırım, 2008: 36). Nûbihara Biçûkan ji 13 beşan pêk tê. Tê da kêm zêde 220 beyt hene. Destpêk, beşa yekem û beşa dawîn li gorî şêwaza mesnewî yê; beşên din jî li gorî pergala xezalê hatine qafiyekirin.

Li gor beyanata Ehmedê Xanê ev ferheng “*ji bo biçûkêt Kurmancan*” hatîye nivîsîn. Xanê bi ferhengê xwestîye zimanê erebî bi zarokên kurdan bide fehm kirin. Lewra hemû ravekirinê ferhengê bi zimanê fehmbare, yanî bi kurdî hatine kirin. Ferheng herçiqas bi giranî erebî- kurdî be jî bi kurdî-erebî jî peyv hatine hevrû kirin. Loma ev berhem wekî yekem ferhenga zimanê kurdî tê hesêbê. Bi vî awayî ferhengkarîya kurdî bi ferhenga manzûm *Nûbihara Biçûkan* hatîye destpêkirin.

Ehmedê Xanê bi ferhenga xwe ya manzûm xwestîye xwendekar darsa xwe bi hêsanî û herikbar jiber bikin. Lewra ji bo xwendin û jiberkirinê şêwaza manzûm (helbestkî) çêtir herikbar û hêsan e. Herweha di *Nûbihara Biçûkan* da rêzkirin û bijartina peyvan jî ne rasteqînî ye; li gor dabeşkirina mijaran û fambarkirina mijaran ev yek hatîye kirin. Taybetmendiyên pedagojîk yên mîna “hêsanbûn ber bi zehmetbûnê ve”, “ji nêzik ber bi dûrbûnê ve” û “ji şênberbûn ber bi razberbûnê ve” cihê xwe di ferhengê da girtine. Bêgûman ev hemû taybetmendiyên pedagojîk ji kêrhatina nivîskarê ferhengê Ehmedê Xanê hatine pê. Loma dikare bête gotin ku Ehmedê xanê bi vê berhema xwe û bi van taybetmendiyên pedagojîk, di dîroka perwerdeya kurdî da xwedî cihekî giring e.

Digel van taybetmendiyên li jor dîyarkirî, *Nûbihara Biçûkan* ji bo perwerdeya zimanê dayîkê bûye avantajeke giring ji zarokên kurdan re. Lewra ev berhem bi salên dûrûdirêj di medreseyan kurdan da wekî pirtûka bingehîn ya dersdayîne hatîye xwendin û jiber kirin.


Digel gelek çap û nûskeyên *Nûbihara Biçûkan* ên heyî, halê hazir çapa li ber destê me ji aliyê weşanxaneyê Avestayê ve hatîye çapkirin. Ev çapa pirtûkê Ji aliyê Qadrî Yıldırım ve tîpguhêzî û wergera wê hatîye kirin.



Resim 1.3: Berga Orjînal ya Grammatica e Vocabolario Della Lingua Kurda


Pirtûkeke din ya perwerdeya kurdî *Grammatica e vocabolario della lingua Kurdaye*. Ev pirtûk di sala 1787an da ji hêla Mario Garzonîyê îtalyayî ve hatîye nivîsîn. Garzonî ji bo karûbarên mîsyonerîyê li herêmên kurdan, nexasim jî li herêma Behdînan demek dirêj maye. Di vê demê da zimanê kurdî baş hîn bûye û ev pirtûka xwe amade kirîye. Yek ji armanca sereke ya amadekirina vê pirtûkê hînkirina zimanê kurdî ji bo mîsyoner an jî kesên bîyanîye. Rêbaza pirtûkê ya hînkirinê, rasterast werger û hînkirina rêzimanê ye ku ev rêbaz di sedsala 18em da li seranserê cîhanê berbelav bû. Ev xebata garzonî, hem taybetmendîyê ferhengî hem jî taybetmendîyê rêzimanî di nava xwe da dihewîne. Lewra ji bo endîşeya hînkirina zimanê kurdî em dibînin ku gelek hêmanên rêzimana kurdî hatine rave kirin. Lê belê dive bête dîyarkirin ku ev pirtûk bêhtir wekî ferheng tê naskirin. Jixwe wateya sernavê pirtûkê yê resen jî bi wateya kurdî “*Ferhenga Zimanê Kurdî*” ye. Bi vê xebata xwe Mario Garzonî di qada kurdnasî (kurdolojî)yê da bûye xwedî cihekî giring.

Herwisa lekolîner Sacha Alsancakli (2016), Garzonî wekî pêşengê kurdnasîyê dide nasîn.



Resim 1.4: Berga Elîfbaya Kurdî ya Xelîl Xeyalî (Çapa Weş. Hîvda)

Yek ji pirtûka din ya hînkirina kurdî *Elfabeya Kurdî* ye. Ev pirtûk ji alîyê Xelîl Xeyalî ve ji bo hêskirina hînbûna kurdî hatîye amadekirin. Ev alfabe ji herfên aramî hatîye pê. wekî ku Kadri Yıldırım (2006) amaje pê kirî; di dibistana kurdî ya ku KTTC yê bi navê *Kürt Meşrutiyet Mektebiyê* da li ser vê alfabe ya Xelîl Xeyalî perwerde hatîye dayîn. Halê hazir ev alfabe wekî pirtûkçeyekî ji alîyê Hîvda îletîşimê ve hatîye çapkirin û li ber desta heye. Ev alfabe ji 34 dengên alfabe ya aramî hatîye pê.



Resim 1.5: Berga Orjinal ya *Hînkere* (Çapa Bgst'yê)

Yek ji pirtûka din ya perwerdeya bi kurdî *Hînkere* e. Ev pirtûk di sala 1921ê da ji aliyê komeleya Hêvî ve li Stenbolê hatîye amadekirin. Komeleya Hêvî bi zimanê Tirkî wekî “Kürt Talebe Hevi Cemiyeti” jî tete naskirin. *Hînkere* bi zimanê Kurdî-Tirkî û bi alfabeya aramî hatîye nivîsîn. *Hînkere* ji gelek aliyê xwe ve xwedî taybetmendiyên giring e. Yek ji van taybetmendîyan jî ewe ku xwestîye her du zaraveyên kurdî (Kurmancî û Soranî) bide hînkirin û nêzîkayîya her du zaraveyan nîşan bide. Ev yek jî tê wê wateyê ku amadekar an jî nivîskarên *Hînkere* hevgerîtin û hevparîya zaraveyên kurdî diparêzin. Taybetmendîya din ya vê pirtûkê ewe ku li ser bergê orjînal serenav wekî “Kurmancî-Babanî” derbas dibe. Ev yek jî tê wê wateyê ku zaravêye kurmancîya jêrîn (Soranî), wê demê wekî Babanî dihate naskirin. Wate, navlêkirina soranî vê dawîyê hatîye çêkirin.

Pirtûka *Hînkere* ji bo hînkirina ziman bi rê û rêbazên modern rabûye, endîşeya wê ya hînkirina rêzimanê çênebûye. Ji rêzimanê zêtedetir giranî daye peyv û

dîyalogên karîger û rojane. Herwisa *Hînkerê*, ji bo hînkirina zimên hevokên bingehîn dîyar kirine û perçeyên xwendinê dane.

Ji xeynê van berhemên sereke yê perwerdeya kurdî, di gelek çavkanîyan da behsa gelek berhemên din yê hînkirina kurdî tête kirin. Lê belê ev berhem ne li ber dest in. Du sedemên serek yê tunebûna van pirtûkan heye ku yan ev pirtûk nehatine çapkirin yan jî hatine çapkirin û duvre hatine tunekirin.

Yek ji van pirtûkên behs lê tê kirin xebata Xelîl Xeyalî ya bi navê Saf û Nahiv (Rêziman) kurmancî ye. Tê behskirin ku Xelîl Xeyalî ev xebatên rêzimanî tev Zîya Gokalp kirine. Lê belê çap an jî nushayên van xebatan li ber destan tune ne.

Xebateke din ya bi vî rengî xebata Evdîrehîm Rehmîyê Hekarî ye. Evdîrehîm Rehmîyê Hekarî digel gelek berhemên xwe yê dînî, civakî û şanoyî derbarê perwerdeyê da jî berhemên wî hene. Di vî derbarê da E. R. Hekarî, berhema xwe ya bi navê *Kilîla(miftiya) xwendinê; Elîfbaya Kurdî* bi endîşeya perwerdeyê ji bo zarokên kurdan nivîsîye. Rehmî hekarî di dawîya berhema xwe ya bi navê *Dersa Dîn da* behsa vî kitêba elîfbayê dike û di nava kitêbên xwe yê çapkirî da nîşan dide. Lê ev berhem heta niha negihîştîye ber destê me (Geverî 2017: 148-149).

3.4.2. Di Hawarê da teşwîqkirina hînbûna zimanê kurdî

Fikra netewî ya ku bi Şoreşa Fransî dest pê kirî û li seranserê cîhanê belavbûyî xwedî gelek taybetmendî û nîşaneyan e. Yek ji nîşaneyên herî giring ya netew ziman e. Ziman ew taybetmendî ye ku gelan ji hevûdin vediqetîne.

Unsûrên ku xelqekî dikin millet ev in: ziman, çand, huner, nêrît û edet, kevneşopî û hwd (Aydın, 2021: 106-107). Bi vî awayî di serdema netewdewletan da ziman xwedî cihekî giring tê hesabandin. Lewra ziman hêzeke manevî ye ku çand, bîr û bawerî, folklor û mûzîka neteweyan zînde dihêle ji bo nivşên nû vedugihêze.

Süleyman Çetin(2016) di teza xwe ya masterê de di derbarê giringîya zimên de tespîten lêkolînerê kurd Qanatê Kurdo jî di derbarê giringîya ziman da fikrên xwe wiha destnîşan kirine:

Ziman bingeh û binaxa yekîtiya endamên millet e. Amraza serbestî û serxwebûna wî ye. Li jîn û afirandina xwe da her millet, merivên her civakê hevbendîya xwe, pevgirêdana xwe bi hevra dikine yek. Bê hevbendî, bê pevgirêdan û bê hevfehmkirin qet miletek, qet endamên civakê nikarin bijîn û

biafirînin. Amraza hevbendî, pevgirêdana endamên civakê, amraza netewan bi hevra, amraza hevfehmkirina wan bi hevra ziman e. Ziman neynika diyanet, feraset, rewş, bîr û bawerîya millet e, neynika ruh, can û tarîxa millet e. Ziman wisa jî, amraza pêşkevtina merivên millet û civakê ye. Reng, rû û rewşa jiyîn û afirandina her milletî, her andamên civakê li ziman da tê ber çavan, ziman kanîya tarix û kultura millet e, sebeb vê ye ku her millet, endamên her civakê, zimanê xwe hîn dibin, dixwazin bizanibin qanûnên sazûmanî û çêkirina zimanê dayika xwe (Kurdo, 1981: 5).

Ji ber van giringîyan, di serdema netewedewletan da her dewlet li zimanê xwe xwedî derketîye û xwestîye zimanê xwe pêşve bibe. Di neteweyên mîna kurdan ên bêdewlet da jî rewşenbîr û çalakvanên civakê ev berpirsyarî li ser xwe hîs kirine û xwestine rê li ber hînkirina zimanê xwe xweş bikin. Celadet Alî Bedîrxan jî bi fikrê rabûye û bi rêya kovara Hawarê xwestîye vê berpirsyariya xwe ya rewşenbîrî bicih bîne û zimanê kurdî bi kurdan bide hînkirin û pêşve bibe. Di vê derbarê da Celadet Alî Bedîrxan di hejmara yekem ya Hawarê da armancê kovarê wiha destnîşan dike: “Hawara me berî her tiştî heyîna zimanê me dê bide nas kirin³³”. Bi vî rengî hawarê armanca xwe a bingeşin ya derbarê zimanê kurdî û naskirina wî bi me dide nîşandan.

Dîsa Celadet Alî Bedîrxan, di hejmara 27an ya kovarê da gotîye; “Kurdno Malxerabno ya kurdî bi axivin û bixwînin yan jî nebêjin em kurd in, eyb e û şerme.”

Ev gotina Celadet ya di kovarê da bi awayekî raste rast giringîya ziman û zanîna zimanê kurdî nîşanî me dide. Lewra li gor destnîşankirina vê gotinê xwenîşandana netewe bi zaman dest pê dike.

Celadet Alî Bedîrxan ziman wekî hêmaneke bingeşin dibîne ku di nivîseke xwe ya Hawarê da vê hêmanê wiha destnîşan dike: Lê yê ko zimanê xwe ji winda qiriye mifta zîndan wî êdî ne di destê wî, lê di destê dijminê wî de ye û dijmin derîyê zîndana girtîyê xwe tucar nenake.... Ew mifte îro hêj di destê me de ye.³⁴

³³Celadet Alî Bedîrxan “Armanca Awayê Xebatê û Nivîsandina Hawarê”, Hawar h. 1, r. 1-2

³⁴Hawar, “Heyîneke Yek Salî”, h. 20, r.1-3

Bi vî awayî dîyar dibe ku Celadet Alî Bedirxan di wê bawerîyê da ye ku divê zimanê xwe winda nekin, zindî bihêlin û lê xwedî derkevin. Rêya vê zindî hiştin û lêxwedîderketinê jî hînbûn û pêşvebirina zimanê kurdî ye.

3.4.3. Hawar û alfabeya kurdî

3.4.3.1. Paşxaneyê dîrokî: Dîrokçeya alfabeyên kurdî

Nivîs, yek ji dahênanên giring ên mirovahîyê ye ku encamên muhîm ên çandî û şaristanî digel xwe anîne. Alfabe jî yek ji hêmanên giring ya nivîs û zanîne ye. Lewra nivîs û pergala nivîsandinê ji yekeyên alfabeyê pêk tê. Berdewamîya nivîsê û pêşketina şaristanîyê jî bi rêya perwerdeyê pêk tê. Loma di vê beşê da em dixwazin çend hûrgilîyên dîroka alfabeyên kurdan bidin nasîn.

Dema em berê xwe didin dîrokê, li gor daneyên berdest xûya dibe ku kurdan ji dema dahênana nivîsa mîxî heta roja me, gelek alfabe bi kar anîne. Ev alfabeyên ku kurdan bikaranîne hinek ji wan, alfabeyên miletin din in, hinek ji wan jî alfabeyên netewî yê kurdan bixwe bûne.

Nivîsa mîxî, ji berî zayîne bi 3000an û heta piştî zayîne 600an ji aliyê gelek miletan ve hatîye bikaranîn. Nivîsa mîxî wekî ku axlebê miletên cîhanî bi karanîye ji aliyê kurdan ve jî hatîye bikaranîn. Ev nivîs ji aliyê pêşîyên kurdan ên wekî Gutî, Hurî û Medan ve hatîye bikaranîn û li gor zimanê xwe hinek dangan lê zêde dikin. Di derbarê bikaranîna vê nivîsê û bikaranîna wê ji aliyê kurdan da nivîskar Nazim Hacanî di berhema xwe ya bi navê *Sefehatun Mîn Tarîxî-l Kurd da Kurdistanê* da behsa pêşîyên kurdan dike. Herwisa amaje bi bikaranîna wan a nivîsa mîxî jî dike û dibêje ku nivîsên kurdî yê bi vê nivîsê hatî nivîsîn di muzexaneyê Londonê da ne.

Piştî nivîsa mîxî, ji sedala 4an pêve kurdan alfabeyên Yewnan Antîk û alfabeya aramî bi kar anîne (Yıldırım, 2013: 25). Cemal Reşîd Ehmed di derbarê berhemên vê alfabeyê da agahîyan dide. Li gor van agahîyên Cemal Reşîd; di sala 1909an da li şikefteke Hewremanê da kitêbên bi vê alfabeyê nivîsandî hatine dîtin û ev kitêb ji aliyê pisporê zimanan Cowley ve hatine deşîfrekirin. Ligor vê deşîfrasyonê ev kitêb berî zayîne di salên 22an da di serdema Aşkanîyan da hatine nivîsîn. Herwisa destnîşan ku ev kitêpdi derbarê firotina şerabê da ne.

Yekem alfabeya kurdan ya neteweyî alfabeya “Bîn û Şad û Masî Sûratî” ye. Kadri Yıldırım (Yıldırım, 2013: 20-23) ji Îbn Wehşîye neql dike û dibêje, ev alfabeyeke aîdê kurdan e û ji xeynî kurdan tu kesê din bi kar neanîye. Herwehadi derbarê vê alfabeyê da nivîskarê navdar Îbn Wahşîye di berhema xwe ya bi navê *Şewqu'l-Musteham fî Ma'rîfetî Rumûzî'l-Eqlam* da dibêje ku min 30 berhemên bi alfabeyê nivîsandî li Bexdayê dîtine, du heb ji wan berheman li Şamê li cem min bûne, yek ji wan berheman di derbarê rezê tirî û xurmeyan da, ya din jî di derbarê derxistina avê ya di bin erdê da bû (Sefîzade, çap 1: 20).

Alfabeya Avestayê jî yek ji alfabeyên kurdan ên neteweyî ye. Ev alfabe, ji aliyê pêşiyên kurdan, Medan ve hatîye dahênan û bikaranîn. Ev alfabe ji 45 herfan pêk tê. Herwisa ev alfabe ji aliyê gelek milletên îranî ve jî hatîye bikaranîn. Di derbarê zimanê Avestayî da Kadri Yıldırım ji Behrûz Şucaî (Şucaî, 2002: 31) neql dike û dibêje ku ji aliyê gelek lêkolîneran ve zimanê Avestayî wekî zimanê kurdî yê yê berê tê hesabandin. Lewra di zimanê Avestayî da her peyveke heyî teqabûlî peyveke zaravayên kurdî ên îroyîn dike. Ev peyvên zimanê avestayî û yên zaravayê kurdîya îroyîn yan rasterast wek hev in yan jî gelek dişibine hev.

Yek ji alfabeyên din ya aîdê kurdan jî alfabeya Pehlewî ye. Di derbarê vê alfabeyê da her çiqas zêde agahî tune bin jî Cemal Reşîd Ehmed di berhema xwe ya bi navê *Zuhûri'l Kurd Fî't -Tarîx* da amaje pê dike ku bi zaravayê kurdîya goranî çend berhemên mîna Zend Avesta, Dînkerd, Bonhişîn û hwd. bi vê alfabeyê hatine nivîsîn.

Piştî qebûlkirina misilmantîyê wekî hemû milletên misilman, kurdan jî dest bi bikaranîna alfabeya aramî kirîye. Di medreseyan kurdan da perwerde bi vê alfabeyê dihate dayîn. Bi perwerdeya medreseyan re, dikare bê gotin ku kurdan bi tevahî êdî ev alfabeya aramî bi kar anîye. Heta demekî bikaranîna vê alfabeyê di nav kurdan da dewam kir. Lêbelê, nemaze bi bandora Şoreşa Fransî pêve êdî di nav kurdan da jî hişyarîyên netewî û guherînên civakî pêk hatin. Di çarçoveya van hişyarîyên netewî de, li gor pêdivîyên vê serdemê êdî kurdan dest bi hewldanên alfabeya latînî kirin. Herweha di bin desthilatîya Soveyetê da kurdan qadeke rewşenbîrîyê ji xwe ra dîtî û di nava vê atmosferê da bikaranîna alfabeya kirîlî jî di nav kurdan da dest pê kir.

Alfabeya latînî jî di kovara Hawarê de, bi pêşengîya Celadet Alî Bedîrxan bi awayekî bihêz dest pê kir. Heta niha jî ev alfabe yek ji alfabeya herî girîng û berbelav e ku di nava kurdan da tête bikar anîn. Gelek nivîskar û rewşenbîrên mîna Cemal Nebez vê alfabeyê wekî alfabeya herî guncav ji bo dengên kurdî, didin şayesandin. Di serdema niha da jî bikaranîna alfabeya latînî, aramî û qismekî kêr be jî kirîlî dewam dike.

Wekî ji taswîra jorîn jî dîyar dibe kukurdan di dîroka xwe da alfabeyên cihê bi kar anîne. Hinek ji sedemên vê cihêbûnê ev in: Kurdan carnan xwe li gor serdemê nû kirine û alfabeyên bikêr bi kar anîne carnan jî mecbûr mane û marûzê alfabekê bûne û ew alfabe bi kar anîne. Di serdema niha da kurd ji ber gelek sedemên siyasî û civakî alfabeyên cuda bi kar tînin. Sedemeke din jî, wekî tête zanîn civaka kurd di nava çar dewletên cihê da parçebûyî ye. Ev parçebûn jî bi xwe ra parçebûnen nivîsî, alfabeyî heta parçebûna fikrî jî tîne. Bi vî awayî tê xuyakirin ku hevgerîneke alfabeyî di nava kurdan da hîn pêk nehatîye.

3.4.3.2. Hawar û alfabeya kurdî

Celadet Alî Bedîrxan ku ji sala 1919an ve biryara alfabeyeke latînî ji bo kurdî dabû êdî di sala 1932an da ev derfet bi kovara Hawarê bidest xist û dest emilandina vê alfabeyê kir. Celadet Alî Bedîrxan bi hejmara yekê ya Hawarê da alfabeya xwe ya latînî, bi zimanên farsî, tirkî, erebî û fransî da nasîn û rave kir. Kovara Hawarê li ser bingeha vê alfabeyê ava bû. Bi awayî Celadet Alî Bedîrxan gavbigav alfabeya xwe bi kurdan da nasîn. Ev alfabe heta niha jî yek ji alfabeya girîng ya jîyan û nivîskarîya kurdî ye.

Celadet Alî Bedîrxan û hevalên wî yê ku li dora Hawarê kom bûyî di wê hişmendîye da bûn ku ziman alava bingehîn ya heyîna desthilatîya kolonyal e. Lewma wan dixwest wek hêmaneke dij-kolonyalzmanê kurdî bi pêş ve bibin (Onen, 2018: 105). Ji bo vê yekê jî hinek reformên bingehîn pêwîstin ku di vê derbarê da reforma herî bingehîn jî alfabe bixwe ye. Wekî di beşên jorîn da jî hatibû destnîşankirin. Celadet Alî Bedîrxan ji sala 1919an ve li ser biryara dirûstkirina alfabeyeke latînî ji bo kurdî bû. Lewra li gor ku Celadet jî dîyar dike, dengên Alfabeya aramî têra dengên kurdî nedikirin û xwendin û hînkrina alfabeya aramî

aloz bû. Bi vî awayî giringîpêdayîn û sekna Celadet Alî Bedîrxan ya pedagojîk jî zelal dibe ku ji bo hînîkirin û perwerdeya zimanê kurdî li rêyên hêsan gerîya ye. Celadet di vê çarçoveya pedagojîk da giringî daye alfabeya kurdî-latînî û li ser xebitîye.

Li ser van esasên giringîya alfabeyê, Celadet Alî Bedîrxan ji hejmara yekem ya kovara Hawarê pêve alfabeya latînî ya ku wî bixwe ji bo kurdî dirûst kirîye û herwiha bi kar anîye.. Herwisa ev alfabe bi dîsîplînên dersdayînê ji xwîneranravegotîye û bi wan daye nasandin. Di derbarê giringîya alfabeya latînî da Celadet Alî Bedîrxan di Hawarê da fikrên xwe wiha dest nîşan kirine:

...me dest bi derxistina Hawarê kir û alfabeya xwe ji Kurd û biyanîyanradazanîn. Îro di meydanê da tiştêkî çêkirî (amadekirî) heye. Kovarek û alfabeyek. Tek dilê min ji bona îro ya çêtir û rastir ev e ku em hêla xwe bidin û vê alfabeyê heta hengî ku muhceta ‘edlandinê bikevêt pêşîyê û rê li me bigrit pêşve bibin.³⁵

Bi vî awayî Celadet Alî Bedîrxan behsa alfabeyê amadekirî, rêçêke vekirî dike ku divê civaka kurd li vê alfabeyê xwedî derkeve û wê pêş ve bibe.

Celadet Alî Bedîrxan alfabeya latînî tenê ne ji bo asanbûna dengên kurdî giring dibîne. Her wisa ji bo yekîtiya kurdan û zaraveyên kurdî jî alfabeyê yekgirtî wekî hêmaneke bingehîn dibîne. Celadet di vê derbarê da fikrên xwe di kovarê da wiha destnîşan dike:

Herwekî me çend çaran gotîye yekîtiya milletê kurd bi yekîtiya zimanê kurdî tête pê. Di yekîtiya zimanê da gava pêşîn yekîtiya herfan e. yanê ji bona nivîsandina zimanê milletekî divêt ji nav xwendewarên wî milletî bi tevayî ji bona zimanê xwe alfabeyek bibijêrin û heke di wî zimanê de çend zar hene, zar hemî bi wî alfabeyê bêne nivîsandin.³⁶

3.4.4. Di Hawarê da rêzimana kurdî

Ji bo ragihandineke birêkûpêk zimanekî birêkûpêk pêwîst e. Ji bo zimanekî birêkûpêk jî rêzimanekê tekûz xwedî cihekî giring e. Bi vê mebestê wekî axlebe zimanên cîhanê yê din, ji bo zimanê kurdî jî xebat û pirtûkên rêzimanê hatine amadekirin.

³⁵Celadet Alî Bedîrxan, “*Li ser Yekîtiya Ziman*”, Hawar, h. 10, r. 5.

³⁶Celadet Alî Bedîrxan, “*Li ser Yekîtiya Ziman*”, Hawar, h. 10, r. 5.

Di kovara Hawarê da Celadet Alî Bedîrxan bi giringîya zimên ve girêdayî, bi dirûşmeya “Kurdayetî bêyî kurdî nayê kirin” dest bi karê kovarê kiribû. Bi vê armancê ji bo zimanê kurdî, reformên bingehîn yê mîna alfabeya latînî, bingeha rêzimanê û hwd. pêk anîn. Celadet Alî Bedîrxan di Hawarê da cihekî giring ji rêzimanêrajî terxan kirîye. Ji hejmara kovarê ya 27an pêve Celadet Alî Bedîrxan, di Hawarê da bi dîsîplîna dersdayînê, beş bi beş li ser rêzimana kurdî sekinîye. Bi vî awayî xwestîye hêmanên bingehîn yên rêzimana kurdî ji xwînerên kovarê û herweha ji tevahî civata kurd ra rave bike. Lê temenê Hawarê têra hemû mijarên rêzimana kurdî nekirîye benda dawîn ya rêzimanê di hejmara 54an da hatîye weşandin.

Herçiqas ev mijarên rêzimanê di hejmarên Hawarê da bi dawî nebûbin jî piştî wefata Celadet Alî Bedîrxan, Roger Lescot ev mijarê temam kirine. Roger Lescot bi berhevkirina van hemû mijarên rêzimana kurdî, bi navê “Bingeha Rêzimana Kurdî” bi zimanê fransî wekî pirtûk çap kirîye.

3.4.5. Di Hawarê da standardkirina zimanê kurdî

Nivîskarên Hawarê bi rêya ziman, yekîti û hevgerîna civaka kurd ji xwe ra kirine armanca bingehîn. Di vê biwarê da jî xwestine zimanekî hevpar yê ku hemû endamên civakê têbigihjin bête bikaranîn. Celadet Alî Bedîrxan jî bingeha vê hevparîyê jî bi alfabeya latînî avêtîye ku ev dikare zimanekî hevpar ango standard çêbike. Bi latînîzekerîna xwestîye zimanekî hevpar ango standard çêbibe. wekî ku kurdolog Amîr Hassanpour jî amaje pê kirî, standardîzasyon carekê bi ser bikeve êdî dikare zêdetir berbelav bibe û di rewşên aloz yên jîyanê da werê bikaranîn (Hassanpour, 2005: 47).

Celadet Alî Bedîrxan û kesên li dora wî dest ji ‘şerê xencerê’ berdabûn û dest bi ‘şerê qelemê’ kiribûn. Ew di wê bawerîyê da bûn ku êdî şerê rewşenbîrîyê giringtir bû ji yê xencerê. Hassanpour di vê derbarê da tespîtên wiha kirine; “Xebatên standardkirina zimanê kurdî wekî parçeyek ji pevçûna di navbera netewetîya kurdî û dewletên serwer da dest pê kir û wisa jî dewam kir” (Hassanpour, hb., r. 106). Bi vî awayî xuya dibe ku nivîskarên hawarê standardkirina zimanê kurdî wekî hêmaneke giring dîtine û ev hêman jî wekî amûreke berxwedanê li hemberî kolonyalîzmê bikaranîne.

Herwisa li ser hewl û xebatên Hawarê yênderbarê standartkirina zimanê kurdî de Ronahî Onen jî wiha destnîşan dike: “Li gorî modela Haugen a ravekar mirov dikare bibêje ku Celadet Bedîrxan û rêhevalên xwe di temamkirin û hevsengkirina her du pêngavên ewil ên standartkirina zimanî, bi gotineke din hilbijartinû qodkirina normê bi ser ketine” (Onen, 2018:172).

3.4.6. Di Hawarê da ferheng

Ji bo zimanekî yek ji hîmên bingehîn jî ferheng e. Di kurdî de, Li gorî çavkanîyên berdest yekem ferhenga kurdî ferhenga Ehmedê Xanî “*Nûbihara Biçûkan*” e. Ehmedê Xanî ev ferheng ji bo zarokên kurdan û perwerdeya wan di medreseyan da amade kirîye. Herwisa ev ferheng bi endîşeyên pedagojîyê hatîye amadekirin ku bi saya vê ferhengê dersdayîna di medreseyan da ji bo zarokên kurdan hesantir û fambartir bûye.

Piştî ferhenga *Nûbihara Biçûkan*, ferhenga duyem ji bo zimanê kurdî hatî amadekirin “*El-Hediyetûl Hemîdiye Fî Lîsanul Kurdîye*” ya Yusuf Zîyaeddîn Paşa ye. Yusuf Zîyaeddîn Paşa di sala 1883an da dema qeymeqamê Motkîyê bû ev ferheng ji dîyarîya siltanê Osmanî, Abdulhamîdê II em amade kirîye. piştî vê ferhenga Yusuf Zîyaeddîn Paşa sêyem pirtûka ji bo kurdî hatê amade kirin “*Mîrsadul Etfal*” ya Muhammed Kerbelayî ye. Muhammed Kerbelayî jî yek ji endamê giring ya Medreseya Aqteya ya malbata Aqtepîya ku ev ferhenga xwe di sala 1912an da amade kirîye. Ev ferhengên amaje bi wan hatî kirin yan kurdî-erebî bûn yan jî kurdî-farsî bûn.

Celadet Alî Bedîrxan di wê hişmendîyê da bû ku zimanê bêyî ferheng nikare hebûna xwe bidomîne. Loma dixwest ferhengeke bi peyvên xwemalî û xwerû kurdî çêbike. Bi navê “*ferhengok*” ferhengeke xwerû kurdî-kurdî amade kirîye. Li ser vê xalê Celadet nêrînên xwe wîha destnîşan dike: “Îro di zimanê me de du texlît kêmanî hene: Wendabûna peyvên Kurdî û ketina peyvên biyanî nav zimên.³⁷”

³⁷Hawar, h. 1, r. 2.

Herweha di çendîn hejmarên Hawarê da bi navê “Ferhengok” beşek dihate veqetandin û di vê beşê da peyvê giring û yên kêmnas dihatin parvekirin.

Hejmarên Hawarê ku beşa ferhengokê di wan da hebû wiha ne: 1, 2, 3, 4, 5, 6, 7, 8, 19, 20, 27, 28, 30.

3.5. Di Hawarê da perwerde û giringîpêdayîna perwerdeyê

Parastin û geşedana zimanekî bêyî perwerde û statû zehmet e bihê kirin. Zimanekî ji pergala perwerdeyê hatî vederkirin nikare xwe nû bike û ji bo pêdivîyên civakê yên dahatûyê nikare bibe bersiv. Celadet Alî Bedirxan û hevalên wî jî di vê çarçoveyê da meseleya zimên wekî meseleya man û nemanê dîtine û giringî dane pêşxistina zimanê kurdî. Ji bo vê pêşxistinê jî hinek hêmanên bingehîn yên mîna alfabe, standardîzasyon û perwerde lazim bûn. Nivîskarên Hawarê jî bi hemû derfetên xwe li ser van mijaran sekinîne û xwestina civaka kurd di rêya xwepêşxistinê de bibin xwedî hişmend.

Kovara Hawarê hem bi rêya beşa xwe ya “ferhengok” hem jî bi rêya ravekirina rêzikên rêzimana kurdî giranî daye fêrkirina ziman û xwestîye zimanê kurdî digel peyvên xwe yê qedîmî bête çalak kirin.

3.5.1. Di Hawarê da teşwîqkirina xwendin û nivîsînê

Weke ku di beyannameya Hawarê de jî hatî destnîşankirin “*Hawar dengê zanîne ye, zanîn xwnasîn e...*”. Bi vî rengî kovara Hawarê armanca xwe ya sereke kirîye zanîn û xwendin. Di naveroka nivîsên Hawar de jî ev hêmana xwendin motîvekirina xwîneran di rêya xwendin û zanîne de hatîyê nîşandan. Di vê derbarê de di hejmarê 16em a kovarê de wiha hatîyê destnîşan kirin:

....Belê bi vî awayî Hawar bû dibistana nûgihîştîyan û tê de çend xortên me kêr û zêde hînî nivîsandinê bûn û îro dibin jî. Ji xwe, madam nivîsevanên me ên îro ev in û nivîsevan ji nav xwendevanan têne helbijartin, diviyabû birekî Hawarê bikeve destê wan. Mîna ko ketiye jî. Me jî destûr da. Em ê pêleke xweş li ser vî awayî bisekinin jî. Pê çend xortên me hînî nivîsandinê dibin û Hawar dikeve nav xelkê û rast bi rast dibe kovara wan.³⁸

Herwisa diderbarê bandora kovara Hawarê li ser xwendina civaka kurd da nivîskar Konê Reş di gotareke xwe da wiha destnîşan dîke: “...Tevî ku

³⁸Hawar, *Dersxane*, h. 16, r. 13. (Tîpgûhêzîya ji alfabeya aramî, Çapa Nûdem a Hawarê)

gelekan ji wan xwendin û nivîsandina bi zimanê Kurdî nekiribûn. Hinek jî hebûn qet neçûbûn dibistanan, ew di rêka kovara Hawarê de hînî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî latînî bibûn û dibûn³⁹”.

Ji vê nêrîna nivîskar û rewşenbîrên kurd Konê Reş jî dîyar dibe ku Hawar peywîra dibistanekî li ser xwe girtîye û şopînarên xwe hînî xwendin û nivîsandinê kirine. Ev yek jî rola Hawarê ya di perwerdekirina civaka kurd da nîşanî me dide.

3.5.2. Di Hawarê de perwerdekirina zarokan

Wekî di beşên jorîn da jî hatîye dîyarkirin yek ji armanca sereke ya kovara Hawarê komkirin û parastina her cûre keresteyên folklorê kurdî ye. Di vê biwarê da nemaze Celadet Alî Bedîrxan û birayê wî Kamuran Bedîrxan giringî dane keresteyên folklorê kurdî û gelek cûreyên folklorîk di kovarê da weşandine. Di nava van cûreyan da çîrok, çîrçîrok, metelok, destan, klam û hwd hene. Di nava van cûreyan da çîrok û çîrçîrokên kurdî yê folklorîk nemaze ji aliyê Kamiran Alî Bedîrxan ve bi endîşeya perwerdeya zarokan hatine weşandin. Ev çîrok jî rasterast xîtabê zimanê zarokan dikin û bi saya vê xîtabê zarok di derbarê ziman û çanda kurdî dibin xwedî hişmend.

Herwisa di Hawarê de di derbarê pedagojî û serpêhatîya zarokên kurd li dibistanê da jî nivîs hatine weşandin. Ji van nivîsan ya bi navê “Dibistan” de wiha hatîye destnîşan kirin:

Dîhî piştî nîvro, gerîndeyê me bi kurikekî biçûk re kete sinifa me.

Cilên kurik paqij, rûyê wî esmer û çeleng, porên wî reş bûn. Çavên wî ên kesk diçirîsîn û mêranîya Kurdên jorîn li rûyê wî dixistin.

Gerînde, bi mamosteyê me Mîrza Ferîdûn re bi dengê nizm axaft; derket û çû.

Kurikî niha hatî li me bitirs dinêrî. Mamoste rabû, bi destê wî girt û gote me: “zaroyên min! Divê hon îro pir kêfxweş bin! Niho ji we re jî kurdên jorîn hevalek tê. Ew li Muşê hatîye dinê li ciyekî dûr; ji kenarê bakurê Kurdistanê. Qedrê wî bigrin ji ber ko ew kurê ciyekî Kurdistanê ye ko ji millet re mirovên bi nav û deng, xebatkarên baş û leşkerên hêja bixwedî kirine û îro jî dike. Heji wî bikin kurên min ! da ku ew xerîbîya xwe neyinê bîra xwe. Da ko bizane

³⁹<https://www.welateme.net/kurdi/modules.php?name=News&file=article&sid=5746> (Dîroka xwegihaştinê: 15.10.2022)

zarokê kurd li her dibistana kurd, û li derê Kurdistanê ji xwe re zû hevalan û bran pêde dike...⁴⁰

Wate ji vê anaktodê, civandin û bihevrebûna zarokên kurd yên ji herêm û bajarên kurda yên cûda ye. Bi vî rengî di vê nivîsê de tê xuyakirin ku divê hemû zarokên kurd di rêya xwendinê de bi alîkarî pêşwazîya hev bikin.

Dîsa di nivîseke din ya Hawarê de bi helbest û melodîyan destpêkirana dibistanê hatîye weşandin ku despêka vê helbestê wha ye:

“Destpêk bi navê Yezdan
Divê êdî bixwînin
Da her tiştî bizanin
Berî vêya gelê min
Daketîbûn hêla jêr
Lê ji îro hi şûn da
Hercî kurde wê biwîne
Welatê xwe bistîne...”⁴¹

3.5.3. Di Hawarê de perwerdekirina civakê bi giştî

Kovara Hawarê berhema hişmendîyeke kemilandî û birêkûpêk bû. Herwisa ezmûneke giring ya Celadet Alî Bedîrxan û hevalên wî yên li dora Hawarê kombûyî bû. Di encama vê ezmûnde da Celadet Alî Bedîrxan û hevalên wî dixwazin serkeftî û serfiraz derkevin. Lewma bi rêya Hawarê xwestine gelek tiştan pêk bînin. Yek ji van tiştan jî perwerdekirin û pêşvebirina hişmendîya netewî ya gelê kurd bû. Nivîskar Firat Aydınkaya jî amaje bi vê yekê dike, “Kovara Hawarê yekemîn hewildana modernbûnê ya çandî û sîyasî bû ku bi rêya kovarekê amaje bi guherîna pedagojîk ya gelî dikir. Ev kovar ezmûneka giring bû ku, wê dixwest gelek tiştan di heman demê da bike ku ketibûn nava hev” (Aydinkaya, 2010: 211).

Di naveroka Hawarê da mijarên mîna latînîzekirina alfabeyê, standardkirina zimên, agahdarkirina civaka kurdî pêşhatyên cîhanî hêmanên modernbûne ne. Nivîskarên kovarê ev hêmanên modernbûnê ji civaka kurd ra vegotine. Armanca vê vegotinê jî dirustkirin an jî afirandina civakeke xwemalî kurd û modern e. Di vê

⁴⁰Hawar, *Dibistan*, h. 3, r. 6

⁴¹Hawar, *Dibistan*, h. 49, r. 7

derbarê da Ramazan Perteve (2020) ji F. Aydınkaya wiha neqil kirîye; “Hawar didîrokî kurdan da cara yekem, azmûneka modernkirina xelqekî ye li gel amûrên modern. Xwendengeheka modern, mekaneka fabrîkasyonê ye ku “kurdê nû” tê avakirin li gel metodên pedagojîk yên modern, kurdê kevin jî tê modernkirin” (Aydinkaya, hb: 212). Di nava vê tespîtê da hêmana ‘metodên pedagojîk’ xwedî cihekî giring ku tê wateya perwerdekirin ango pêşxistina civaka kurd. Ev perwerdekirin jî li ser esas û bingehên modernbûnê hatîye kirin.

Derbarê perwerdekirin û pêşvebirina hişmendîya netewî da Celadet Alî Bedîrxan di nivîseke xwe ya Hawarê da wiha destnîşan dîke: “Îro xwendin û nivîsandina zimanê mader ji bo her milletî êdî ne bi tenê wezîfeyeke şexsî wezîfeyeke millî ye jî.”⁴²

Bi vê anektodê wate, Celadet Alî Bedîrxan di Hawarê xwestîye di nava gel da hişmendîyekê ava bike û bi rêya zimên nasnameya kurdî ya netewî zindî bihêle.

3.6. Rola Kovara Hawarê di Perwerdeya Kurdî de

Rewşenbîrên kurd yên serdema dawîya dewleta Osmanî yên wekî Xelîl Xeyalî, Bediuzzeman Seîdê Kurdî, Abdullah Cewdet û hwd li ser giringîya perwerdekirin û pêşvebirina zimanê kurdî sekinîbûn û di vê biwarê da xebat kiribûn. Rewşenbîrên Hawarê jî ku ji gelek alîyên xwe ve wekî berdewamîya van rewşenbîrên berîya xwe bûn, ev mîras ji wa wergirtin veguhestin ji nivîşê serdema xwe. Di derbarê vê mijarê da lêkolîner Ramazan Perteve jî fikrên xwe wiha destnîşan dîke:

Rewşenbîrên Hawarê ev mîrasa hişmendîya perwerdekirinê ji rewşenbîrên berî xwe wergirtine û bi formeke dewlemendtir veguhestine ji bo nîfşên li pey xwe. Bi vî awayî vî nîfşê Hawarê “hommus kurdicus”ek afirand li ser binemaya nasnameyê kurdî ya netewî ku ji tradîsyana kurdewarîyê dermale dibû û herweha berê wan her li şaristanîya Rojava bû (Perteve, 2018: 287).

Kovara Hawarê jîdi derbarê ziman û perwerdeyê de, ev mîrasa berî xwe bi awayekî wergirtîye ango kêr zêde di binbandora vê mîrasê da maye û di vî derbarê da xebatên giring hatine kirin. Di beyannameya destpêkê ya Hawarê da jî bi awayekî zelal amaje bi xwendin û perwerdeyê hatîye kirin. Beyannameya destpêkê ya ku di hejmarê yekem ya Hawarê da hatîye weşandin da wiha ye:

⁴²Herekol Ezîzan (Celadet Alî Bedîrxan), *Zilamek û Zimanek*, Hawar, h.40, r.4.

Hawar dengê zanînê ye. Zanîn xwe nasîn e, xwenasîn ji merarêya felat û xweşiyê vedike... Hawara me, berî her tiştî heyîna zimanê me dê bide nas kirin. Lewma ko ziman şerta heyînê a pêşîn e... Hawar ji îro û pêve bi her tiştê ko kurdanî û kurdîti pê bendeware, dê mijûl bibe. Tenê siyaset jê dûre, xwe naêxe siyasetê. Hawarê siyaset ji civatên welatîrahiştiye. Bi siyasetê bila ew mijûl bibin. Em jî di warê zanîn, huner û sin'etêdadê bixebitin...

Hevoka yekem ya beyannameya kovarê da, amaje bi “*zanîn*”ê hatiye kirin ku zanîn jî bi rêya perwerde û xwendinê peyda dibe. Ev yek jî giringîpêdayîna kovarê ya di derbarê perwerdeyê da nîşanî me dide. Dîsa di vê beyannameyê da hevoka duyem ya ku dibêje “*Zanîn xwenasîn e, xwenasîn jî rêya felahê ji me ra vedike...*” ev hevok jî giringîya xwendin û zanînê ji civaka kurd ra vedibêje ku heke em bixwazin xwe nas bikin û rêya felah (xelasbûnê) peyda bikin divê em perwerde bibin û bixwînin. Celadet Alî Bedirxan ji bo xelasbûnê, rêya “qelem (perwerde û xwendin)ê” dide pêşîya kurdan ku Celadet bixwe jî bi rêya Hawarê pêşengîya qelemê dike. Bi vî rengî kovara Hawarê dibe navendeke rewşenbîrî û perwerdeya ziman û çanda kurdî.

Di nava hejmarên Hawarê da bi sernavê “*Elfabeya Kurdî*” nivîsên li ser hînkirina alfabeya kurdî ya latînî hatine nivîsîn. Di van nivîsên peryodîk de alfabeya kurdî hatiye danasîn û li ser hînkirina wê mînak ji zimên hatine dayîn. Li ser hînkirina alfabeya kurdî ya latînî de Hawarê bi hişmendîya spatekdayînê nivîs weşandine ku ji xwînerên kovarê hatiye xwestin ku ev alfabeya hatî dîyar kirin baş hîn bibin. Di vê derbarê de nivîsa di Hawarê de bi sernavê “*Hêvî ji Xwendevanan*” hatî weşandin wiha ye:

Em ji nû ve, elfabêya kurdî rûpel bi rûpeldi komele de belav dikin. Pêşdetir di şiklê kitêbê de bêt derxistin.

Ji vê belavkirinê qesta ewe ku herçî xwenda û zanayên kurdan hene rûpelên elfabê yek bi yek, xêz bi xêz, pirs bi pirs, bixwînin, kenc bala xwe bidinê û her çî kêmasîyan bibînin ji me re binivîsînin, da ko em wan kêmasîyan rast bikin.

Jû pêve ez ji wan tiştêkî din jî hêvî dikim. Ji min re ji bona her rûpelê pirsnên nû peyda bikin û rêkin.

Li rûpela pêşîn me sê herf danîne(a d r) û bi wan çend pirs çêkirin. Dibe ko bi van herfan pirsnên din jî bîn çêkirin. Di rûpela duwim de herfên me bûne pênc(a d r e m) me bi van jî çend pirs dîtin. Heye ko hinekê din jî peyda bibin.

Bi vî awayî xwendevanên me dikarin bi me re bixebitin û elfabeya me bîdîlînin û qencîr bikin.⁴³

Wate ji vê nivîsa ku di Hawarê de cih girtî; Hawar spartek ango peywîrê dide xwînerên xwe jî da ku ev alfabeya dîyarkirî ji aliyê wan ve baş bête fehm kirin, li ser vê alfabe-yê bixebitin û ji bo pêşxistina vê alfabe-yê xwe bidin bin bar.

⁴³Hawar, *Hêvî ji xwendevanan*, hej. 1, r. 6-7.

Herwisa ev daxwaz û hêvîya di Hawarê de tê wateya îstîşarekirinê jî ku Hawarê ne ku vê alfabeyê û hînkirina vê alfabeyê li ser welatîyan ferz dike, dixwaze li gor fikreke hevpar an jî lihevkirî vê alfabeyê pêş bixe. Lewma dikare bê gotin ku Hawarê vê alfabeyê hem bi xwînerên xwe dide hînkirin hem jî her yek ji van xwîneran dibin hîndekar/mamosteyê vê alfabeyê.

Celadet Alî Bedîrxan jî Hawarê wekî dibistaneke civakî dibîne ku herkesê di vê dibistanê da cih girtine rola mamostefiyê jî lîstine. Di vê derbarê da Celadet Alî Bedîrxan dinivîsa xwe da tespîtên wiha destnîşan kirine:

....Di wan salan de kurdên ku bîrewerê heyîna xwe ne û di dilê wan de rûmeta milet û welat heye, bi hînbûna xwendin û nivîsandina zimanê xwe xebitîn û zanîna xwe pêş ve birin. Ew ne bi tenê xebitîn û elimîn, lê xebitandin û elimandin jî. Belê ew ji vî miletê bêdibistan re bûne dibistan dersa welatîyên xwe gotin û ew gihandin; ji wan mirovne nezan mirovne xwenda anîne pê.⁴⁴

Bi vî awayî dîyar dibe ku kovara Hawarê ji civaka kurd ra bûye xwendengehek. Her kesê ku xwe li vê xwendengehê girtî hatîye perwerdekirin û ew kesên li dora xwe jî perwerde kirine.

Ji bo perwerdekirin û pêşvebirina zimanekî alfabe xwedî cihekî giring e. Rewşenbîrên kurd jî ji ber vê giringî û têgihîştinê ji bo alfabeyeke kurdî ya bikêr, xebat û lêkolîn kirine. Berî kovara Hawarê, di gelek kovarên mîna *Rojî kurd*, *Hetawî Kurd* û hwd da ji aliyê gelek rewşenbîran ve amaje bi pêdivîya dirûstkirina alfabeyeke latînî ji bo kurdî hatibû kirin. Heta ji aliyê Xelîl Xeyalî ve hinek xebatên dirûstkirina alfabeyeke latînî ji bo kurdî hatibû kirin. Li ser vê mijarê Celîlê Celîl destnîşan dike ku Xelîl Xeyalî di salên 1919-1920an da bi bandora Y. Orbelî alfabeyeke bi herfên latînî ji bo kurdî dirûst kirîye (Celîl, 2002: 144). Lê axlebê van xebatan negihane armanca xwe û di pratîkê da cihê xwe nedîtine.

Celadet Alî Bedîrxan jî ji giringîya alfabeyê bi salên dûr û dirêj xebitîye. Xwestîye ev alfabe bikêr û nûjen be. Celadet Alî Bedîrxan di nivîseke xwe ya di Hawarê da behsa serpêhatî û gera xwe digel Charles Noel ra li Kurdistanê dike ku wî biryara latînîzekirina alfabeyeke kurdî di wê serdemê da daye. Di vê derbarêdaem jî rojnivîska W. Charles Noel hîn dibin ku Celadet û birayê wî yê biçûk Kamiran, di gerên Noel ên bo Kurdistanê yên di sala 1919andarêhevaltîya wî kirine. Noel

⁴⁴Xwedîyê Hawarê (Celadet Alî Bedîrxan), "*Sê Tarîxên Hawarê*", Hawar, h. 27, r. 8.

karmendekî îstîxbarata Brîtanî bû ku ji bû gereke li nava civaka kurd hatibû peywîrdar kirin. Ew her sê bihev derketine gereke li bajarê Mêrdîn, Dîyarbekir û Meletî da ku bihîstîyarîyên kurdên herêmê yên di derbarê hişmendîya serxwebûnêda geş bikin. Serdar Neol xwe wekî yekî dij-Kemalîst û alîgirên kurdan pênase dike. Ew armanca xwe ya vê gerê wiha tîne ziman; “Tekoşîna li hember propagandaya pan-îslamîst a tirkan û helwestên tirkan yên bînpêkirina kurdan li dijî me. Ji bo vê armancê tirk gotina ku ‘Îngîlîz hewl didin li herêmê desthilatîyeke ermenîyan ava bikin’ bi kar tînin (Noel, 1999:105). Li gor gotina wî ew ji Emîn Alî dixwaze ku rêhevaltîya wî bike ji lewre kurdan gelek qedrê wî digirt û wî dikarî kurdan îqna bike da ku ji bo avakirina Kurdistanê piştgirîya îngîlîzan bikin. Lê belê, Emîn Alî ev yek qebûl nekirîye û li şûna xwe her du kurên xwe şandine (Onen, 2018: 97).

Bi anektoda Serdar Noel jî tê peyîtandin ku Celadet Alî Bedîrxan di sala 1919andabiryara dirûstkirina alfabeyêke latînî bo kurdî daye. wekî ku di yare Celadet nêzîkî 12 salan li ser vê biryara xwe maye û di encamêdadi sala 1932an da bi kovara Hawarê ev xebata xwe ya alfabeyê kirîye pratîkê. Bi vê rengê alfabeya latînî ji bo pêşketin û perwerdekirina zimanê kurdî bûye hîmeke bîngêhîn. Digel ku halêhaziralfabeyên mîna aramî û kirîlî têtin bikaranîn jî alfabeya latînî jî di nava kurdan da yek ji alfabeya herî zêde tete bikaranîn û berbelav e.

Digel van hêmanên girîng yên ku di Hawarê da cih girtine, bi kurt û kurmancî dikare bê gotin ku Hawar bi gelek qadên “*kurdîti bendewar*⁴⁵” re eleqedar e û bi vê hişmendîyê jî bûye navendek ango dibistaneke kurdî. Di vê derbarê da Firat Cewerî jî wiha diyar dike:

Yek jê, berî Hawarê, alfabe û giramereke tekûz tunebû, Hawar bû kovareke zimanî. Berî Hawarê nimûneyên edebiyata kurdî ya modern pir bi sînor bûn, Hawar bû kovareke edebî. Werger tunebû, Hawar bû kovareke wergerî. Gotar tunebûn, Hawar bû kovareke gotarî. Ez dikarim listeyê dirêj bikim û gelek tiştên din lê zêde bikim. Lê heke ez bi kurtî bibêjim, Hawar dibistaneke milî bû.⁴⁶

Wate bi van tespîten Firat Cewerî, Hawarê gelek qadan da gavên yekem avêtine ku ev gav jî ji bo kurdayetîyê bûne hîmê bîngêhîn. Bi vî awayî Hawar bûye dibistaneke netewî ya kurdî.

⁴⁵Hawar, *Armanca, Awayê Xebatê û Nivîsandina Hawarê*, h. 1, r.1

⁴⁶<http://www.bued.boun.edu.tr/turik.asp?id=78>

Herwisa di derbarê rola perwerdeyê ya Hawarê da keça Celadet Alî Bedirxan, Sînemxan Bedirxan jî agahîyên wiha destnîşan dike:

Bavê min Hawar derxist. Çi wext? Dema ku dît şer û pevçûn pere nake, dest avêt rewşenbîriyê. Kurdên me hingê ji %90 ne xwendewar bûn. Armanca Celadet ew bû ku kurd xwe rewşenbîr bikin, hînî xwendin û nivîsandinê bibin. Dengê Hawarê li her deverî veda. Kurdên me jê gelek fêde dîtin.⁴⁷

Ji vê anektoda Sînemxan Bedirxan armancên bavê wê Celadet Alî Bedirxan yê derxistana kovara Hawarê dîyar dibin ku ev armanc pêşxistina xwendin û nivîsîna civaka kurd e. Ev armanc jî raste rast nîşane bi perwerdeya civak dide. Bi vî awayî armanc û rola Hawarê derdikeve holê.

⁴⁷M. Beğik, *Kovara Hawarê Çima û Çi Şertan de Derket?*, 2012, Kovara Bîr, hej. 45.

ENCAM

Me, di vê xebata xwe da geştûguzareke dîroka perwerdeya kurdî pêk anî. Me ev gešta xwe ji serdema mîrektîya da dest pê kirin û heta serdam kovara Hawarê anî.

Di beşa dîrokçeya perwerdeya kurdî ya serdema mîrektîyan da hate dîtin ku zimanê kurdî di medreseyên mîrektîyan da xwedî pergaleke perwerdeyê û nivîskarîyê bûye. Lewra di vê serdemê da gelek medreseyên kurdan yên mîna Medreseya Sor û yd. tên ava kirin û di warê zanist, ziman û edebîyata kurdî da berhemên giranbiha yên di asta nivîskarîya cîhanî da têne dayîn.

Piştî jinavbirina mîrektîyan, medreseyên kurdan bi organîzekirina terîqetan ji nûve hatine saz kirin. Xelîfeyên terîqetan li gund û bajarokên kurdan medrese vekirine. Ji van medreseyan Medreseya Nehrê, Medreseya Basretê û Medresya Aqtepê hinek ji van medreseyên giring û navendî ne ku di wan da zimanê kurdî heta astekê xwedî cihekê giring yê perwerdeyê bû.

Di serdema salên dawî yên dewleta Osmanî da rewşenbîr û çalakvanên kurd jî bi bandora netewperwerîya modern ketine nava liv û tevgerê. Bi vê mebestê komele û cemîyet ava kirine, rojname û kovar derxistine. Di van kovar û rojnameyan da nexasim li ser giringîya perwerdekirina welatîyan û pêşdebirina zimanê kurdî sekinîne. Her wisa xwestine dibistana jî ava bikin û zarokên kurdan bibin xwedî mafê perwerdeya zimanê dayîkê. Ev xebat û çalakîyên vê serdemê her çiqas negihîştibin armnaca xwe jî ji bo dîroka çapemenî û tradîsyona nivîskarîya modern ya kurdî bûne mîras.

Bi avakirina Komara Tirkîyeyê û dewletên din yên li ser axa kurdan ava bûyîraêdî ziman û çanda kurdî jî dikeve ber qedexe û xetereya jinavbirinê ya van dewletên desthilat. Di vê serdemê da gelek rewşenbîr û çalakvanên kurd vê xetereya li ser ziman û çanda kurdî li ser xwe wekî berpirsyarî hîs dikin û bi sekna netewperwerî Komeleya Xoybûnê ava dikin û dikevin nava tevgerên cûbicûr. Di dawîyê da ev xebat û çalakîyên rewşenbîrên kurd bê encam dimînin û nagihin armanca xwe.

Piştî kar û xebatên aktîf di nava komeleya Xoybûnê da CeladetAlî Bedîrxan û birayê wî Kamîram Bedîrxan êdî dixwazin şêwaza tekoşîna xwe biguherînin. Bi vê mebestê kovara Hawarê di sala 1932an da derdixin. Dixawazin bi reya vê kovarê civaka kurd di warê ziman, zanîn, dîrok, perwerde, edebîyat û hwd. da pêş bixin. Kovara Hawarê di hevoka yekem ya beyannameya xwe da destnîşan kirîye ku *“Hawar dengê zanîne ye....”*. Bi rengî Hawarê armanca xwe wekî “zanîn” dîyar kirîye. Zanîn jî bi rêya perwedeyê peyda dibe an jî pêş dikeve. Di vê çarçoveyê da di xebata me da jî hat dîtîn ku Hawarê hem ji alîyê ziman ve, hem ji alîyê alfabeyê ve hem jî ji alîyê çand û edebîyatê ve mohra xwe li dîroka perwedeya kurdî daye. Hawarê, bi vê mohra xwe mîraseke berbiçav ya meteryalên perwerdeyê ji nivşên piştî xwerahiştîye.

ÇAVKANÎ

- Adak, A. (2015). *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk*, Weş. Nûbihar, Çapa 3, Stenbol.
- Adak, A. (2016). “Şewqiyê Xanî li Pey Şopa Ehmedê Xanî: Berawirdkirinek li Ser Mulemme‘ên Wan ên Çarzmanî, Nûbihar Akademî, Hej. 3, r. 36-65.
- Adak, A. (2017). “Serdema Xalidîtiyê di Tarîxa Edebiyata Kurdî ya Klasîkde”, Kürt Tarihi, Hej. 30, rr. 59-64.
- Akin, S. (2013). *Lêkolînên Zimannasiya Kurdî*, Weşanên Avesta, Stenbol.
- Akyüz, Y. (2012). *Türk Eğitim Tarihi, M.Ö. 100 –M.S. 202*. Ankara: Pegem Akademi Yayınları.
- Akyüz, Y. (2015), *Türk Eğitim Tarihi*, Pegem Yayınları, 28. Baskı, Ankara.
- Alakom, R. (1987). *Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi*, Weşanên Deng, Stenbol.
- Alakom, R. (1991). *Unutulmuşluğun Bir Öyküsü: Saidi Kürdi*, Fırat Yayınları, Stenbol.
- Alakom, R. (2020), *Xoybûn Örgütü Ve Ağrı Ayaklanması*, Weşanên Avesta, Çap 2.
- Albayrak M., K. Şeker(2014). *Arşiv Belgelerine Göre Osmanlı Eğitiminde Modernleşme*. T.C. Başbakanlık Devlet Arşivleri Genel Müdürlüğü İstanbul.
- Alkayış A. (2021). *Felsefe ve Eğitim İlişkisi: J. J. Rousseau'nun Eğitim Anlayışı*. Eurasian Conferanse Language Sosyal Sciences,
- Anter, M. (2011). *Hatıralarım*, Aram Yayınları, Stenbol.
- Anter, M. *İleri Yurt*, 31.08.1959
- Arslan, Y. (2007), *Mümeyyiz Dergisi'ndeki Dinî Motiflerin Din Eğitimi Açısından İncelenmesi*, (Teza masterê ya çapnebûyî), Marmara Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, İstanbul.
- Aydın, İ. (2002). *Alternatif Okullar*. Ankara: Pegem A. Yayınları.
- Aydinkaya, F. (2010). *Golgotha Tepesinden İnmenin Arifesinde Vicahiye Çevrilmiş 'Kürt Modernleşmesi Eleştirisi*, Weşanên Dipnot, Stenbol.
- Aydoğan, İbrahim Seydo, “*Celadet Bedirxan, Çavkanîyên Hawarê û Kurdayetîya Nû*”, Kovara Zend, Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol: Havîn, Hej. 12.

- Ayhan, H. (1986). *Eđitime Giriř ve İslamiyetin Eđitime Getirdiđi Deđerler*, İstanbul, Weř. Damla.
- Aykaç Y., řerif Güzel, Sinan Çakar.(2019)"*Bibliyografyaya Tezên Masterê yên Beřên Ziman û Edebiyata Kurdî û Ziman û Çanda Kurdî (2011-2018)*". Şarkiyat 11 / 21007-1043 .<https://doi.org/10.26791/sarkiat.581438>
- Aytaç, K. (2009). *Avrupa Eđitim Tarih I*. Ankara: Dođu Batı Yayınları.
- Azîzan, H. (1932). "*Alê Kurdan*". Hawar, 5, 4.
- Balayî, F. (2010). "*112 Salîya Rojnamegerîya Kurdî*", Kovara Înstîtûta Kurdî ji bo Lêkolîn û Zanist, Sal. 2010, Hej. 14.
- Baltacı, A. (2019). "*Nitel Arařtırma Süreci: Nitel Bir Arařtırma Nasıl Yapılır?*". Ahi Evran Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi (AEÜSBED), 5 (2), 368-388.
- Bayrak, M. (2004). *Kürdoloji Belgeleri-II*. Ankara: Öz-Ge Yayınları.
- Bayrak, M. (2013-2014). "*Şark Islahat Planı*", Kürt Tarihi, İstanbul.
- Bayur, Y. H. (1947). *Hindistan Tarihi*, C. 1. Ankara: Türk Tarih Kurumu Yayınlan.
- Bedirxan, C. A. (2010), *Bir Kürt Aydınından Mustafa Kemale Mektup*, Weřanên Doz, Stenbol.
- Bedir-Xan, K. A. (1932). "*Ala Kurdan*", Hawar, 8, 7.
- Bedirxan, K. A. (1986). *Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer*, c.t., Özgürlük Yolu Yayınları.
- Bedirxan, K. A. (1986). *Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer*, Cihê Çapê Ne Dîyare, Weřanên Özgürlük Yolu.
- Beg, M. E. Z. (2011). *Kürtler Ve Kürdistan Tarihi: Tarihin Eski Devirlerinden Günümüze*. (Çapa 3yem). Wer. Vahdettin İnce, Mehmet Dađ, Reřat Adak, Şükrü Aslan. İstanbul: Nûbihar
- Beltekin, N. (2012). *Özneleşme Sürecinde Okul ve Bilgiyle İliřki: Kürt Politik Aktörlerin Eđitimsel Deneyimleri Üzerine Bir Arařtırma*. (Teza doktorayê ya çapnebûyî) Ankara: Ankara Üniversitesi, Eđitim Bilimleri Entitüsü, Eđitim Yönetimi ve Politikası Anabilim Dalı.
- Beltekin, N. (2020). "*Ji Aliyê Felsefeya Perwerdeyê ve Perwerdeya Kurdî*". Akademîya İsmail Beřîkçi Payîz.
- Bozaslan, H. (2007). "*Kürd Milliyetçiliđi ve Kürd Hareketi (1898-2000)*". Milliyetçilik. İstanbul: İletişim Yayınları.

- Bruinessen, M. V. (1993). *Kürdistan Üzerine Yazılar*, Wer. Nevzat Kıraç û yd. İletişim, Çap 3, Stenbol.
- Bruinessen, M. V. (2015). *Ağa Şeyh Devlet*. Wer. Babu Yelkut. Çapa 9.İletişim. İstanbul.
- Cegerxwîn (2003). *Hayat Hikâyem*. Wer. Gazi Fincan Wer. Evrensel. İstanbul
- Çelebi, Ahmet (1987). *İslamda Eğitim Öğretim Tarihi*, Wer. Ali Yardım, Stenbol, r. 106-107.
- Çelebi, E. (2012). "*Said Nursi Eğitim Felsefesi Medresetüz Zehra/Med Zehra çiye?*", Said Nursi Eğitim Felsefesi Medresetüz Zehra, Merak Yayınları, Stenbol.
- Celil, C. (2013). *Kürt Aydınlanması*.İstanbul: Avesta Yayınları.
- Cemilpaşa, K. (2014). *Doza Kurdistan, Kürdistan Davası, Kürt Milletinin 60 Seneden Beri Esaretten Kurtuluş Savaşı Hatıratı*. Çapa Yekem. İstanbul: Avesta.
- Çetin, S. (2016). *Kovara Hawarê û Bandora Wê ya li Ser Zimanê Kurdî*, (Teza masterê ya çapnebûyî), Yüzüncü Yıl Üniversitesi.
- Çilingir L; Küçükali R. (2004).*Immanuel Kant'ın Eğitim Anlayışı*. Kazım Karabekir Eğitim Fakültesi Dergisi. Sayı 10.
- Davidson, T. (2008). *Greklere Eğitim Düşüncesi*. (Wer. A. Aydoğan). İstanbul: Say Yayınları.
- Demir, B. (2010). "*Devlet Destekli Kürtçe Eğitim: Kürt Meşrutiyet Mektebi*". Toplumsal Tarih.
- Derince, M. Ş. (2012). *Perwerdehiya Dînamîk a Pirzimanî û Pirzaravayî li ser Bîngê Zimanê Dayîkê: Modelên Perwerdehiyê bo Xwendekarên Kurd*. DİSA, Diyarbakır.
- Dersimi, N. (1992). *Dersim'e ve Kürt Milli Mücadelesine Dair Hatıratım*. Çapa yekem. WeşanênÖz-Ge, Ankara
- Dilgeş, F (2012). "*Celadet Elî Bedîrxan ve Hawar Ekolü*". İnatçı Bir Bahar, Weşanên Ayrıntı, Stenbol.
- Edward William Charles Neol(1999), *Kürdistan 1919 Binbaşısı Noel'in Günlüğü*, İstanbul: Avesta,
- Eğitim Sen (2011), *Eğitimde Anadilinin Kullanımı ve Çiftdilli Eğitim*. Halkın
- Epözdemir, Ş. (2015). *Medreseyên Kurdistanê: Di Dewra Mîran û Neqşebendiyan de*, Stenbol: Nûbihar.

- Epözdemir, Şakir (2009) *Medreseyên Mîran*. <http://www.rizgari.com/modules.php?name=Rizgari&Niviskar&cmd=read&id=1846> 29/01/2009
- Epözdemir, Şakir (2010) *Medreseyên NeqşebendiyanI*. <http://www.rizgari.com/modules.php?name=Rizgari&Niviskar&cmd=read&id=1855> 29/01/2009
- Erbay, V. (2012). *İnatçı Bir Bahar*, Ayrıntı Yayınları. İstanbul.
- Erbulmuş, M. (2019). *Bir Kadın ve Çocuk Dergisi Olarak Ayine (1875-1876): Osmanlı Eğitim Tarihi Açısından Değerlendirilmesi*. (Teza masterê ya çapnebûyî). Fatih Sultan Mehmet Vakıf Üniversitesi: Lisansüstü Eğitim Enstitüsü.
- Ergün, Z. (2015). “*Gotara Dijkolonyal û Wêneyê Serdestiya Tirkan di Kovara Hawarê de*”. Monograf. (3) 400-437.
- Ertekin, M. Z., Şerif Güzel. (2019). “*Xebatên Kurdolojiyê li Zanîngeha Bîngolê (2014-2018)*”. Mukaddime, 10 (1), 161-193. DOI: 10.19059/mukaddime.508828
- Fırat, B. Ş. (2010). *Burda Benden Bir şey Yok Mu Öğretmenim? Eğitim Sürecinde Kimlik, Çatışma ve Barışa Dair Algı ve Deneyimler*. İstanbul: Tarih Vakfı Yayınları.
- Freire, P. (2003). *Ezilenlerin Pedagojisi*. Wer. Hattatoğlu, D., & Özbek, E. İstanbul: Yapı Kredi.
- Genç, H. N. (2015b). “*Emile'i anadil edinim ve yabancı dil öğrenim kuramları açısından okumak*.” *Dil ve Edebiyat Eğitimi Dergisi*, (14), 168-192.
- Göldaş, İ. (1991). *Endamtiya Cemiyetan*, Doz Yayınları, Stenbol.
- Gorgas, J. T. (2006). *The constructions of the kurdish identity under the influence of orientalism, 1920-1945*. Kongrey Cîhanî le barey xwêndinî kurdî, Herêmi Kurdistan, Wezareti Xwêndinî Bala û Tiwêjînewey Zanistî, Zankoya Selaheddîn, 6-9 Eylül 2006, Kurdistan-Hewlêr. (World Congress on Kurdish Studies, 6-9 sept. 2006, Erbil-Kurdistan).
- Hassanpour, A. (2005). *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil: 1918-1985*. Wer. İ. Bingöl, C. Gündoğan. İstanbul: Avesta.
- Hawar (1932). “*Armanç, awayê xebat û nivîsandina Hawarê*”. *Hawar*, 1, 1-2.
- Hawar (2012). *Weşanên Belkî*, Stenbol.
- Hebeş, H. (1996). *Raperîna Çanda Kurdî di Kovara Hawarê de*. Bonn: Belavgeha Hogir.

Hewa, S. K. (2019). İkinci Dil Olarak Kürtçe Öğretimi. (Teza doktorayê ya çapnebûyî). Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı. Diyarbakır.

Hızlı, Mefail (1987). Kuruluşundan Osmanlılara Kadar Medreseler, Zaningeha Uludag Zankoya İlahiyatê, hej. 2, Sal 2.

<http://www.bued.boun.edu.tr/turik.asp?id=78>

<https://www.kurdarastirmalari.com/yazi-detay-qonaxa-xweb-n-y-kovara-hawar-47>

https://ku.wikipedia.org/wiki/N%C3%BBbihara_bi%C3%A7%C3%BBkan

İnci, V. (2012). *Said Nursi Eğitim Felsefesi Medresetüz Zehra*, Merak Yayınları, Stenbol.

İsmail, G. (1991). *Kürdistan Teâli Cemiyeti*, Weşanên Doz, İstanbul.

Izady, M. R. (2011). *Kürtler*, Weş. Doz, Stenbol.

Jwaideh W. (2007). *Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi: Kökenleri ve Gelişimi*. Çapa 4. Werg. İ. Çekem, A. Duran. İstanbul: İletişim.

Kılıç, E. (2019). *Platon'un Devlet Diyalogu Bağlamında Eğitim Anlayışı*. Felsefe Arkivi, 67-84.

Korkmaz, M., Öktem, G. (2014). "Rousseau'nun eğitim anlayışı". *Eğitim ve Öğretim Araştırmaları Dergisi*, 3 (1), 174-186.

Kramer, N. S. (1998). *Tarih Sümler'de Başlar* (Çev: M. Çığ). Ankara: Türk Tarih Kurumu Yayınları.

Kurdo, Q. (1981). *Zimane Kurdî (Rêziman)*, Frankfurt, Weşanên Komkar.

Kürt Talebe Hêvi Cemiyeti. (2008). *Hinkerê Zimanê Kurdî*. İstanbul.

Kurt, Ş. (2015). *Nirxandina Pirtûka Hînkirina Kurdî: Hînker*. (Teza masterê ya çapnebûyî). MAÜ, TYDE, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı. Mardin.

Lazarev, M. S(1999), Pirsas Kurdan(1891-1917), weşanên roja nû

Lazarev, M. S., Pirsas Kurdan(1891-1917), r. 226.

Leezenbeng, M. (2015). "Elîyê Teremaxî and the Vernacularization of Medrese Learning in Kurdistan". *Kurdish Studies; Empire, Ethnicity and Identity*. (Edit: Djene Rhys Bajalan and Sara Zandi Karimi). New York: Routledge.

Leif J, G. Rustin (1974). *Genel Pedagoji*. Wer. Necat Yüzbaşıoğlu. Ankara, MEB Yayınları.

- Lescot, R. (2010). *Memê Alan*. Çapa 2. İstanbul: Avesta.
- Malmisanij (1991). *Xelîl Xeyalî*, Doz, Stenbol.
- Malmîsanij (2002). *Kürt Talebe- Hêvî Cemiyeti İlk Legal Kürt Öğrenci Derneği*, İstanbul: Weşanên Avesta
- Malmîsanij (2009). *Cızira Botanlı Bedirhaniler Ve Bedirhani Ailesi Derneğinin Tutanakları*. Çapa 3. İstanbul: Avesta
- Malmîsanij û Lewendî, M. (1989). *Li Kurdistana Bakur û Tirkiyê Rojnamegeriya Kurdî (1908-1981)*. Uppsala: Jîna Nû
- Malmîsanij. (2011). *İlk Kürt Gazetesi Kurdistan'ı Yayımlayan Abdurrahman Bedirhan (1868-1936)*. Çapa 2. İstanbul: Vate
- Mardin, Ş. (2008). *Jön Türklerin Siyasi Fikirleri 1895-1908*. İstanbul: İletişim
- Mela Eliyê Teremaxî, (2018). *Tesrîfa Teremaxî*, Metn û Analîz: Merdan Newayî, Nûbihar.
- Michiel Leezenberg(2014),*Elî Teremaxî and the Vernacularization of Medrese Learning in Kurdistan Michiel Leezenberg*, Iranian Studies, Vol. 47, No. 5, Special Issue: The Kurds and their History: New Perspectives (SEPTEMBER), pp. 713-733 (21 pages)
- Modanî, Xelîl (Xelîl Xeyalî), “Ziman”, *Rojî Kurd*, J. 3.
- Mutluay, N. (2004). *İlkçağda Ve Önasya Uygarlık Merkezlerinde Egitim*. Ankara: Ütopya Yayınları.
- Önen, R. (2012). *The Role of Language in the Discursive Construction of the Kurdish Nation: A Case Study on the Kurdish Periodical Hawar*. (Teza masterê ya çapnebûyî. İstanbul Bilgi Üniversitesi.
- Palabıyık, A. (2017). “Eğitimde Çokdillilik Tartışmalarına Sosyolojik Bir Bakış: Muş Alparslan Üniversitesi Kürt Dili ve Edebiyatı Bölümü Öğrencileri Örneği”. *Journal of Social and Humanities Sciences Research*, 4 (13), rr. 1427-1445.
- Pertev, R. (2018). *Folklor û nasnameya kurdî ya neteweyî (1898-1946)*, İstanbul: Avesta.
- Pertev, R. (2020).” *Giringîya Xebatên Folklorê Li Cem Rewşenbîrên Nîfşê Hawarê*”,Folklor û Ziman. Cild: 1 Hejmar: 1 Nîsan 2020.
- Qedrî, M. (2011). “*Eliyê Teremaxî û Dîtinên Wî yên li ser Rêçikên Rêzimana Kurdî*”, Kovara Bîr, Hej. 1, Stenbol.

- Qijia, G. (2009). *Ahistory Of Chinese Educational Thought*. Beijing, China: Foreign L. Press.
- Rojî Kurd. (2013). İstanbul: Enstituya Kurdî ya Stenbolê.
- Rzepka, M. (2014). “*Metin, Din, Toplum. Kürdistan’da Sosyo-politik Değişimler Bağlamında Modern Kutsal Kitap Çevirileri*”. Ed: K. Omarkhali. Kürdistan’da Dini Azınlıklar, Werg. İ. Bingöl, İstanbul: Avesta.
- Sağ, V. (2003). “*Toplumsal Değişim ve Eğitim Üzerine*”. Cumhuriyet Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, 27 (1), rr. 11-25.
- Sefîzade, S. B. *Mêjûy Edebî Kurdî*, Çapa yekem. Hewlêr.
- Şişman, M. (2011). *Eğitim Tarihi*. Anadolu Üniversitesi Yayınları.
- Şûcaî, B. (2002). “*Ferhenga Avestayî-Kurdî*”. Rojnameya Taybetî ya Enstîtûya Kurdî ya Parîsê, sal: 2002, hej: 31.
- Tan, A (2009). *Kürt Sorunu*, Timaş Yayınları, İstanbul.
- Tan, A. (2011). *Değişen Ortadoğu da Kürtler*, Çıra, Stenbol.
- Topping, K. (2003). “*Postmodern Toplumda Yeni Bir Öğrenme Yöntemi: Özel Ders Yerine (Tutoring)*”. Wer. M. Gündüz. A.Ü. Eğitim Bilimleri Fak. Dergisi, 36 (1-2). rr. 175-188.
- Tuğrul, A. (2010). *Batı’da Kürdoloji Çalışmaları ve Kurumları*. (Teza masterê ya çapnebûyî). İÜ. Sosyal Bilimler Enstitüsü. İstanbul.
- Tutum ve Görüşleri, Eğitim-Sen Türkiye Taraması, Eğitim Sen Yayınları, Ankara
- Uras, M. (2002). “*Eğitimin Toplumsal Temelleri*”. Eğitim Üzerine. Ed. E. Toprakçı. Ankara: Ütopya Yayınları.
- Veroj, S. (2018). *Du Birayên Bedirxanî: Celadet Ê Kamiran Bedirxan 1913-1923*, Diyarbakır: Dara
- William E., Charles Neol (2014). *Kürdistan 1919/Binbaşı Noel’in Günlüğü*, İstanbul: Avesta.
- Xeyali, X. (2007): *Elif Ba*, Hivda İletişim, Stenbol.
- Xwediyê Hawarê (Celadet Alî Bedir-Xan), (1941). “*Sê Tarîxên Hawarê: 15 Gulan 1932, 15 Tebax 1935, 15 Nîsan 1941*”. Hawar, 27, r. 4-5.
- Yıldırım, K. (2018). *Kürt Medresleri ve Alimleri*, İstanbul: Avesta
- Yıldırım, K. (2006): “*Seîdê Nûrsî û Ramanên Wî yên Derbarê Ziman û Perwerdehiya Kurdî de*”, Zend, Payîz.

Yıldırım, K., Pertev, R. & Aslan, M. (2013), *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları.

Yıldırım, Kadri (2013) “*Kürtlerin İslam öncesi Alfabe Serüveni*”, Kürt Tarihi, Hej. 5, r.24-29

YÖK. “Eğitim Fakültelerinde Uygulanacak Yeni Programlar Hakkında Açıklama”, http://www.yok.gov.tr/documents/10279/49665/aciklama_programlar/aa7bd091-9328-4df7-aafa-2b99edb6872f (Dîroka xwegihaştinê: 10.10.2016).

Zaza, N. (2017). *Wekî Kurdekî Jiyana Min*. Çapa Yekem. Wer. Adil Qazî. Diyarbakır: J&J

Zinar, Z. (1993). *Xwendina Medresê*. Stockholm: Pencînar.

PÊVEK

1. HINEK NIVÎSÊN PERWERDEYÊ YÊN DI KOVARA HAWARÊ DA

1.1. Elfabêya Kurdî⁴⁸

Bi Navê Yezdanê Pak ê Diloan û Mihrivan

Elfabeya Kurdî ji sih û yek herfan hevedudanî ye:

a b c d e ç d i g h x ê j î k q u l m n o p r s ş t û f v w y z

Herf di dengdayîyê de du texlîd in: dengdêr û dengdar.

Dengdêr ew herf e ko dixwendeng e, û dengê wê biserêxwe derdikeve û dengê dengdaran derdixîne.

Dengdar ew herf e ko dixwendeng e, lêbelê dengê wê biserêxwe û bêalîkarîya dengdêrê dernakeve.

Di zimanê kurdî de heşt dengdêr hene:

a e i ê î u o û

Lewre ko di dengaîyakurdî de dengdêrekgeh kin û gehdrêjnabedengdêrênkurdîdirêjahîyadengênxwe de sersekinî ne: kin û dirêj in.

Dengdêrên kin:

e i u

e- der دەر, şer شەر, ser سەر

i-kin کن, din دین, bin بـین

u- kurd کورد, kur کور, kul کول

Dengdêrên Dirêj:

a- av., sar., bar,

ê- dêr., şêr., mêr.

⁴⁸Hawar, Elfabeya Kurdî, h. 1, r. 3.

Î- tî, zîv, şîv, sâr

o- dor, sor, kor

û- kûr, şûr, dûr

DizimanêKurdî de bîst û sêdengdarhene:

b- bar, bav, ban

c- car, can, cûn

ç- çar, çûn, çem

d- dar, dan, dîn

g- gav, giş, garan

h- hîm, hêja, halan

x- xanî, xwarin, xêr

j- jin, jor, jazî

k- kîr, kenc, kêlî

q- qa, qer, kom

l- lo, law, lez

m- mar, mêj, maq

n- nan, nerm, nas

p- par, por, pehn

r- rê, rû, reş

s- sar, sebat, sofî

ş- şor, şev, şa

t- têr, taket, tûj

f- fanos, filan, find

v- vajî, vala, virnî

w- war, werîs, weq

y- yar... یاری, yek... یەک, yarî... یاری

z- zor. زور, zabit... ضابط, nafiz. نافذ

Jivanpêveduherfênbîyanîhenekobirek kurdan ji kurdan wandibêjin.
Lewrekoewherfên ha dieslênxwe de ne kurdî ne me ew ne êxistinên avelfabeyaxwe.

Ewjî (...ح) û (...خ) ne. me ewduherfîdanîna du deqan ser <h> û <x>nîşan kirine.

h- ...حال ...hal

x- ...غار Xar

Ko ev deq ketin ev herfên ha vedigerin ser herfênkurdî û dibin <h> û <x>.

Jixwepiraniya kurdan şûna (...غ..), (...خ...) dibijtn: xeyidîn ... غییدین,
xeyidîn... خییدین

Hawardengê zanîne ye. Zanînji me re rêyafelat û xweşîyêvedik. Her kesêko

مه ژ زانین یه زانیی دنکیهاوارکوکسی هر فڊکه خوشی یی و فلات ری یاره

xwe nas dike dikarexwe bide nas kirin. Hawara me berî her tiştîheyînazmanê

کرن ناس بده خوه د کاره دکه ناس خواهیینا تشتی هر بری مه هاوار

me dê bide nas kirin. Lewmakozmanşertaheyîne a pêşîn e. Hawarjûpêvebi her

ب بیفهرژوهاوارپشین آ هیینیشرتا زمان کولوما کرن ناس بده دی مههر

Tiştêkokurdanî û kurdîtîpêbendewar e dê mijûlbibe.

بهمژل دیندوار بکر دینی و کردانکو تشتی

Bi xêzên jorîn ve me rêberî û rêzanîya alfabeya kurdî kuta kir. Ji niho pêde bi
hûrhûnandina hevedûdanî wî dê mijûl bibin

Dumahîk heye....

1.2. Dîbistan⁴⁹

Dîbistan ew der e ko em têde dixwînin. Wek dîbistana Gundê me.

Di dîbistanê de mamhoste û zarowên gundî hene.

Ji zarowên dîbistanê re şagirt dibêjin. Ez jî şagirtekim. Lewra ko diçim dîbistanê û dixwînim.

Her roj sibehî şagirtan kitêb, defter û kelemên xwe didin hev û diçin dîbistanê.

Mamhoste dîbistanê şagirtan dibêjît, şagirt guhdar dibin, qenc bala xwe didin ko rind têbigihên û hîn bibin.

Mamhoste di cihekî bilind de rûniştîye, jê re dîyaroq dibêjin.

Şagirt li rex hev li ser rûniştgehan rûniştî ne. Li ber şagirtan bekêşk hene.

Li ber min jî berkêşkek heye. Gava ders kuta dibe, berkêşka xwe ber bi xwe ve dikişînim, kitêb defter û kelemên xwe têde vedişêrim, diçim hewşa dîbistanê digel heval û hogirên xwe dileyîzim.

Di kuncêke derxanê de depreş heye. Depreş liser sepîkî siwarkirî ye.

Mamhoste, carinan, ji dîyaroqa xwe datê û bi tebeşîrê li ser depreşê dinivîsîne. Hercî ko devkî kenc nayin seh kirin, bi nivîsandinê ji me re dide zanîn. Hin caran ji şagirtan radike, dersên wan ji wan re dide nivîsandin û xeletên wan derdixîne û rast dike. Pêr mamhoste li ser depreşê tiştêkî xweşkok nivîsandi bî hêj di bîra min da ye:

Çiyayên bilind bê mij nabin

Newalên kûr bê av nabin

1.3. Şagirtên Sinifekê Wek Zaroyê Malekê Ne⁵⁰

Ji bo Biçûkên Kurdan

Dîhî piştî nivro, gerîndeyê me bi kurîkekî biçûk re kete sinifa me.

Cilên kurîk paqij, rûyê wî esmer û çeleng, porên wî reş bûn. Çavên wî ên kesk diçirîsîn û mêranîya Kurdên jorîn li rûyê wî dixistin.

⁴⁹Hawar, *Dîbistan*, h. 3, r. 6

⁵⁰Hawar, *Şagirtên Sinifekê Wek Zaroyê Malekê ne*, h. 30, r. 15.

Gerînende, bi mamosteyê me Mîrza Ferîdûn re bi dengekî nizm axaft; derket û çû.

Kurikî niha hatî li me bitirs dinêrî. Mamoste rabû, bi destê wî girt û gote me: “zaroyên min! Divê hon îro pir kêfxweş bin! Niho ji we re ji kurdên jorîn hevalek tê. Ew li Muşê hatiye dinê li ciyekê dûr; ji kenarê bakurê Kurdistanê. Qedrê wî bigrin ji ber ko ew kurê ciyekê Kurdistanê ye ko ji millet re mirovên bi nav û deng, xebatkarên baş û leşkerên hêja bixwedî kirine û îro jî dike. Heji wî bikin kurên min ! da ku ew xerîbîya xwe neyinê bîra xwe. Da ko bizane zarokekê kurd li her dibistana kurd, û li derê Kurdistanê ji xwe re zû hevalan û bran pêde dike.”

Paşê mamoste li diwarî, li ser xerîteya Kurdistanê Muş şanî me kir, rûnişt û bi dengê xwe ê ahengdar banî Gurgînê reşo kir.

Gurgîn ji ciyê xwe derket, çû li ber mamoste rawesta. Mîrza Ferîdûn gotê: “Gurgîn di sinifa xwe de tu ê pêşîn î; divê tu navê sinifê û bi navê biçûkên kurd ên cizîrê silava xêrhatinê li hevalê xwe ê nih bikî!”

Gurgîn zivirî gote Mûşî “tu bixêr hatî birayê delal! Xwe bihin fireh bike! Evder jî welatê te ye! Em gi bra û yar in” em himbêz kir û her du binarikên wî maç kirin.

Ji kêfan me li cepikan xist mamoste şa bû, Mûşîyê biçûk jî dikenî. Mîrza Ferîdûn ciyek şanî Mûşî da ew rûnand.

Mûşî hîn nih rûniştibû ko ji her derê sinifê jê re qelem, defter û kaxiz hatin. Kurikekî ji Silêmanîyê jê re resmê seraya Silmanîyê şand; min bala xwe da ala rengîn li ser re pêl dida û diçirisî.

1.4. Dîbistan⁵¹

Destpêk bi navê Yezdan

Divê êdî bixwînin

Da her tiştî bizanin

Berî vêya gelê min

Daketîbûn hêla jêr

⁵¹Hawar, *Dîbistan*, h. 49, r. 7

Lê ji îro hi şûn da
Hercî kurde wê biwîne
Welatê xwe bistîne
Em in xweyî war û şûn
Ji bo ine ye hêta jor
Serxwe nabe Kurdistan
Ew e diçim dibistan
Bo rastîyê bibînim
Heya ko pê bixunim
Nezan ma hûn mêr û jin
Reben pepûk û bêkêr
Di nav bajar û gunda
Da ko bibe xweyî şîn
Neyaran jê derîne
Doza me ye serxwebûn
Hildin ala kesk û sor
Bê xwendin û dibistan

1.5. Bingehên Rêzimana Kurdmancî⁵²

Bi navê Yezdanê Pak ê Dilovan û Mîhrîvan

1-Gramêr: Gramêr tevayiya qeydeyên rastaxaftin û rastnivîsandina zmên e.

2- Zmanê Kurdmancî: Zmanê kurdmand! zmané mileté kurdmanc e. Kurdmanc pê daxevin, dinvîsînin û bi gotinên din hîs a fikrên xwe pê eşkere dikin.

⁵² Hawar, *Bingehên rêzimana Kurdmancî*, h. 27, r. 11.

3- Hêmanên zmên: Di zmanê devkî de hemanê bingehîn deng e. Deng bi tîpan têne sekinandin û bi wan; zmane niviskî dest pê dike. Bi tîpan kî tî bi kîtan bêje bi hev dikevin. Pirîcar bêje an kesekî an tişteki dinimîne û gava çend bêje bi awakî manadar digehin hev ji wan komek çêdibe. Komek fikreke tam dide zanîn.

Bi peyhevketina komekan qiset tete pê. Qiset bi mijarekê mijûl dibe û ew zman bi xwe ye. Ji gotinên jorîn dixuye ko hêmanên zmên çar in:

Tip: a g ê u y h o p m j

Kit: ta, den, ser, co, rût, a, poz, ê.

Bêje: hesp, peyar, xani, spehî, gotin, were.

Komek: Par ez çû bûm Rewanê. Îro dinya sare. Gundê me di navbera du avan de ye.

4- Tîp: Her dengê ko di dev û qirika me de peyda dibe, li ser kaxezê bi îşaretekê tete sekinandin. Ji wan îşaretan re tîp dibêjin.

5- Tîpen zimanê kurdmançî: Di her zmanê de herçend deng hene ewçend jî tîp peyda dibe. Ji ber ko di zmanê kurdmançî de sih û yek dengên bingehîn hene ji lewre tîpên zmanê kurdmançî sih û yek in.

Hûrek: a b c çedêfghiljklm nopqrsştu û vw x y z

Girdek : A B C Ç DE EFGHILJKLMNOPQRS STU V W X Y Z

6-Bi adetîû gelemperî em bi hûrekan dinivîsîn. Girdek kêman caran tîpên îstîmal kirin. Komê bi girdekekê dest pê dike. Tîpa seravekî a pêşîn her gav girdekek e.

7-Dengdayiya tîpan: Tîp ji awirê dengdayiyê ve bi du biran lewa dibin: dengdêr û dengdar.

8- Dengder: Dengder ew tîp in ko bi serê xwe ji devê me dertên û dengekî mûsîqayî tînin pê. Dengdêrên zmanê kurdmançî heşt in: a e ê î o u û

9-Dengdar: Dengdar ew tîp in ko beî arîkariya dengdêrekê nikarin ji devê me derkevin û dengekî mûsîqayî bînin pê. Ew di devê me de dikevin hin cihan, wek lêv, dran û ezmandev ji wan pejneke ker peyda dibe. Dengdarên zmanê kurdmançî bist û sisê ne : b c ç d f g h j k l m n p qrssty w x y z grsşt y z

Şanek-Di pratikê de dengdêr ji dengdaran bi awayê jêrin têne derêxistin. Dengdêr bi serê xwe jî dikarin kîtekê bînin pê. Lê dengdar bêî dengdêrekê rekê tu kîté nayînin pê. Herwekî di kîta “par” de heke me dengdarên (p) û (r) xistin û (a) bi tenê hist ew (a) bi serê xwe jî kîtek e. Lê (p) û (r) bêî (a) yê, an dengdêreke din, nikarin kîtekê bînin pê.

9- Doma dengdêran: Dengdêr ji awirê domê ve bi du biran par dibin, kurt û drêj :

Dengderên kurt: e i u

Dengdêrên drej: a ê o û

Dengdêrên kurt bi derbekê ji devê me dertên, devê me bi nîvî vedibe, doma wan hindik e, û ew tu caran drêj nabin.

Dengdêrên drêj gava ji devê me dertên dom dikin, devê me bi tamamîvedibe û ew tucaran kurt nabin.

Herçend dengdêrên kurt (e i u) û dengdêrên drêj (ê i û) ji aliyê şikilî ve nîzingî hev bibin jî, ji aliyê dengî ve ji hev dûr û gelekî biferq in. Ji ber ko cihderka her-yekê cida ye.

10-Xweseriya hin dengdêran: Dengdêrin hene ko nikarin bikevin pêşî an paşîya hin dengdaran. Hinên din jî di pêşî an di paşîya bêjeyan de peyda nabin.

I - Ev dengdêra ha bi gelemperi nakeve pêşî an paşîya bêjeyan. Yanî bêjeyên kurdmançî ne bi (i) yê dest pê dikin ne ji pê tamam dibin; ji hin daçek û pronavan pê ve: mîna: li, di, ji, bi, çî

Ji milê din bêjeyên ko di eslê xwe de ne kurdmançî ne, û ji zmanê biyaniyan ketine zmanê me bi «i» yê dest pê dikin.

(dûmahîk heyê)

1.6. Dersxane⁵³

Me hemî dil dikir û dixwest ko kovareke me hebit. Dîsan herkesî lê yek bûbû, elfabeya kurdî a nû divêt bête belav kirin û herçî xortên kurd hînî wê bibin.

Bi sed renc û dişwariyê û paş xebateke şeşmehîn, me destûra kovarekê bi navê Hawarê sitand. Hawar di nav me de daket. Bû hawar û gazî. Herçend heye ew çend li welatê kurdan û biyaniyan hate belav kirin. Şabaş û pîrozî, li we û lê, deng û pêjn, hertişt... hemîqenc, hemî rind, tev spehî û delal...

Lê tiştê hebû. Diviyabû ko Hawara kurdan bijît û bi ser kevit. Hawar dihate Hawarê. Lê gerek bû ko bihatina hawara Hawarê jî. Jê re pergîvan û gazîvan diviya bûn. Herkovar û rojname, nemaze kovareke weke ya me bi du tiştan dikarit bijît. Sermiyan û xwendevan. Em ê îro tenê qala xwendevanan bikin. Lê bi vê hincetê me dil heye bere pêşîn hinekî qala nivîsevanan bikin û jê bikevin qesta xwe a bingehî. Ji xwe nivîsevan ji xwendevanan têne hilibjartin û berekê wan in. Wekî hejmara Hawarê a pêşîn derket, me di dilê xwe de digot ko paş çend û hejmaran nivîsar li me welê bibarin ko em ê di bijartinê de ecêbmayî bimînin û pişkê bavêjin ser. Lê welê nebû. Hêviya me neçû serî. Ji çend şî'r û bendikan pê ve tiştêkî xurt û bi goşt negihaye destê me. Digel vê hindê me bihna xwe fire dikir û digot, xwendayên me hêj kar nebûne, roja barkirinê ji nişka ve bi ser wan ve girt, hîn xwe pêk ditînin, qelemên xwe - wek şûrê ji kalanî - ji diwêtên xwe sibe dêbikişînein.

Ji xwe hejmarên pêşîn ji bona hînkirina elfabêya nû û awayê nivîsandinê, bi çend Belê bendên ko bi herdu herfan dihatin nivîsandin, derdiketin. Heta îro jî ew awa dom dicit û carinan jî hin bend bi herdu herfan têne çapkirin.

Lê di wî çendî de hin nivîsarên nûgihîştîyan dihatin û digihane me. Bivênevê heqê nûgihîştîyan jî di Hawarê de hebû. Ji xwe Hawar ji me bêtir ya wan bû. Ji ber ko em yên îro û ew yên dawiyê ne. Ê ji me re diviyabû ko em wan bigihînin û bi xwedî bikin da ko bikêrî millet û welatê xwe bèn. Ji lewra dilê me hebû, em ji wan re, ji nûgihîştîyan re sitûneke cihê vekin. Herwekî me vekiribû.

Lê bi zemanî ve me dît ko di Sûriyê de ji van pê ve tu xwendayên welê nînin ko pê da di sitûnên Hawarê de tiştinin bi kêr û bi awakî qenc û rast, bi

⁵³ Hawar, *Dersxane*, h. 16, r. 13. (Tîpgûhêziya ji alfabea aramî, Çapa Nûdem a Hawarê)

kurdanciyeke xweru, bikarin binivîsîn. Wekî em kurdanciya xwerû dibêjin jî qesta me ne ew e ko tê de pirsên erebî nînbîn. Bila hebin, lê divêt awa kurdî û pirs kurdandî bin. Belê me got bila tê de pirsên erebî hebin. Lê ne ew çend û welê bêfesal ko şûna "Ber vê yekê" "Bînaen 'ela zalîke" bête gotin.

Diyar e ko kurdên welatê jêrîn ji me derketine û bend û şîrên hêja nivîsandine û dinivîsîn. Ji xwe welê jî diviyabû. Çiku kurdên Îraqê di welatê xwe de ne, nêzîngî milyonekê ne, nemaze ji berê ve di bajarê Suelymaniyê de bi kurdî dinivîsîn. Ji û pê ve ev deh sal in di dibistanên xwe de bi kurdî dixwînin. Lê em di Sûriyê de ji aliyekê kê in, ji aliyê din di nav me de - xelkê cih û derketî - xwenda hindik in. Hebin jî hêj rind hînî nivîsandina kurdanciyeke nebûne. Belê divêt hîn bibin, ji ber ko bi zimanekê nivîsandin ne tenê bi zanîna wî zimanî tête pê, lêbelê divêt mirov bi wî zimanî hînî ni- vîsandinê bibit.

Belê di encamê de me dît ko nivîsevanên me ên îro ev in û ne hinekê din in. Ber vî deravî de me tavil qerara xwe da û rûpelên Hawarê ji her texlît nivîsaran re vekir. Welê jî gerek bû. Ji aliyekê xelk hînî xwendin û nivîsandinê dibû, ji milê din çend nivîsevan dihatin gehandin. Ji û pê ve Hawar zeviya zimanê kurdî ye. Divêt bi vê zeviyê her texlît tov bêne werkirin. Hin hebûn ber destê me de bi xwedî û hînî nivîsandinê dibûn. Bivênevê ev ji ên din derketin. Lê ênmayîn jî hêdî hêdî, bi xwendina Hawarê û bi teshîhên ko me di nivîsarên wan de dikirin awayê nivîsandina xwe bi gelekê edilandine.

Seh kirine ko li şûna "Min ji ber xwe got" "Ji ber xwe min got" nayê gotin, di zimanê axaftinê da bihata gotin jî di zimanê nivîsandinê de ne rast e. Dîsan rind kete serê wan ko mirov nikare "Mehîn min" binivîsîne lê gerek e wekî tête bi lêv kirin "Mehîna min" binivîsîne û heke mehîn ji yekê bêhtir in, di hin şîwan de, "Mehîne min" bête gotin jî, di zimanê nivîsandinê de divêt "Mehînên min" bête nivîsandin. Ji ber ko a pêşîn yekejimar "mufred" a paşîn pirejmar "cem" e. Belê bi vî awayî Hawar bû dibistana nûgihîştîyan û tê de çend xortên me kê in û zêde hînî nivîsandinê bûn û îro dibin jî. Ji xwe, madam nivîsevanên me ên îro ev in û nivîsevan ji nav xwendevanan têne helbijartin, diviyabû birekê Hawarê bikeve destê wan. Mîna ko ketiye jî. Me jî destûr da. Em ê pêleke xweş li ser vî awayî bisekinin jî. Pê çend

xortên me hînê nivîsandinê dibin û Hawar dikeve nav xelkê û rast bi rast dibe kovara wan.

Ji xwe ev şî'r û bendikên nûgihîştîyan ne bêkêr in jî. Ev nivîsarên ha ji bona me, ji bona herkesê ko çavên zanîn û zanahiyê lê hene û xasima ji bona nifşa tê gelekî hêja û bi fêde ne. Di wan de awayên gotinê welê hene ko ji gund li gund diguhêrin û bi lêge- rîne nakevin dest.

Ji xwe biserketin û tekûzbûna zimanekî weke zimanê me bi çend awayê xebatê tete pê. Bi nivîsarên zanayan, bi nivîsarên wan mirovên ko hima xwendin û nivîsandinêdizanin û herwekî bi xwe dibêjin û diaxivin û ji devê xelkê dinivîsin, bê ko tu tiştê wê biguherînin diguhêzînin rûpelan.

Ji û pê ve tiştêkî din jî heye ko hîm û bingehê hemiyana e. Ew jî daba (edebiyata) xelkê ye, stran, çîrok h. p. Di vê babetê de xwendevanên Hawarê qet nexebitîne. He- çendî me ji wan re çend caran got û nivî- sand jî. Heye li xwe dananîne mirovekî ne- zan, dengbêjekî an mitribekî bibin pêşberî xwe û gotinên wî danivîsînin. Belê çêtir dî- tine ko ji ber xwe binivîsînin. Lê ne welê ye. Ev texlît nivîsar ji hertexlîtê bêtir bi kêrî me tên û hêja ne. Ji ber ko tê de ji aliyekî awayê gotinên îro û ji milê din awayê gotin û pir- sên çend sed salin hene ko îro di zimanê axaftinê de nînin û yekcar wînda bûne. Belê destê me de çendyek hebûn. Me ew belav kirine. Lê ew ne bes in. Ev kanî hinde kûr e ko binya wê zû bi zû naye dîtin. Kurdistan ji perçeyên holê têjiye. Bi salan ve bête nivî- sandin kuta nabin.

Me li ser meseleya nivîsaran û di dora wê de - ko pê re girêdayî ne - hin tişt gotin. Em niho vegerin li ser dersxaneyên xwe, li ser qesta xwe a bingehî.

Hejmarên Hawarê bûne hifdeh. Bivêne- vê çend xwendevanên me hene û çendek xwe bi xwe hînê xwendinê dibin, Lê ev ne bes in. Ji kê bête pirsîn - nemaze ji mirovên xwenda - hûn çî ra van kurdan hînê xwen- dinê nakin. Cuhaba wan cuhaba nekêrhatîyan e. Hema ji we re dibêjin: Ma em çî bikin kanî dibistana kurdan, ev çend dewlet - mendên me hene bila yek ji wan rabe û ji me re dibistanekê ava bike h. p.... belê xe- bera wan e. Îro dibistanên me nînin û dewlemendên me jî guh nadin.

"Madam heta îro ji nav me ew dewlemendên camêr derneketine ko bi derbekê hezar zêran bidin û ji bona milletê xwe dibistanan û binyanên xêrê çêkin" (ji pêşgo-

tinka nîzamuna ma civata xêrê). Em jî bi derbekê nikarin dibistanan çêkin. Gelo em heta çêbûna dibistanan di hêviyê de bimînin? Heke welê, hingê millet hêj gelek nexwendî û nezan dê bimînit. Gelo jê re tevdir heye? Belê heye û gelek hêsanî ye. Ew jî vekirina dersaxana ne. Li Beyrûtê qedere dused mal kurdên Omerî û dora Mêrdînê hene. Ji xwe re hemaliyê dikin. Diktor Bedir-Xan herçî xortên wan - tê de hin sih û sih û pênc salî jî hene - gehandine hev û dane xwendinê. Paş ko şagirt gihane hejmara bîst û pêncan Diktor Bedir-Xanî ji hukûmetê ruxseta dersxanekê xwest û girt. Îro li Bey- rûtê bi awakî resmî û ji aliyê hukûmetê nas- kirî, dersxaneke kurdî heye, tê de ji sihê bê- tir kurd dixwînin û mamhosteyê wan Mus- tefa Ehmed Botî ye.

Îro ew li ser xwendayên kurdan wezîfe ye, ferze. Û ferzeke 'eyn, lê ne kifaye: Vekirina dersxanan... ji 'Endyûrê heta Cerablusê bi- vênêvê çend xwendayên me hene, bila ji xwe re dersxanan, wek dersxana Beyrutê ve- kin û vî milletê bextreş û belengaz ko ji ne- zaniyê bûye xulamê biyaniyan bixwînin û bigihînin. Heke divêt ji hukûmetê jî ruxseta wan bistînin. Bêşik e ko heger qenc hate xe- bitîn hin ji wan dersxanan sibe dibin dibis- tan. Ji ber ko ew ne li Beyrûtê, di erdeke welê de bêne vekirin ko xelkê wê kurdmanc in.

Herwekî Hawar tovê elfabêya nû bi erdê werkir, dersxane jî dibin hîm tovê dibistanan.

1.7. Şêr û Rovî Piling⁵⁴

Şêr û piling tev de çûn

Leqay seriyek penêr bûn

Vê jî xwar û wê jî xwar

Herdu li hev dane dar

Yekî ji ê dî re got

Herdu rabûn bûne cot

Go em herin cem rovî

⁵⁴Hawar, *Şêr û Piling û Rovî*, h. 14, r. 10. (Tîpgûhêzîya ji alfabeya aramî, Çapa Nûdem a Hawarê)

Li seydayê weş û kovî

Ewê me li hev du bîn

Çavê şeytênî derîn

Rovî go: de rabin zû

Ji mi re bînin terazû

Wan terazû anî ber

Rovî penîr danî ser

Alîk pir û yek hindik

Yek bû giran yek sivik

Parîk ji a giran bir

Ew ji a dî bû siviktir

Geh ew xwar û geh ew xwar

Heta ko ma ben û dar